**Keywords:** Local perspective, The reign of Bitlis, Poets from Bitlis, Era, migration, Local, Literary products.

\* Ev gotar, di "Yekemîn Sempozyuma Navneteweyî ya Bedlîsê" de (28.06.2014, Bedlîs) bi sernavê "Nêrîneke Giştî li ser Helbestvanên Kurdî û Bedlîsê" hatiye pêşkêşkirin û di formata gotareke akademîk de hatiye pêşxistin.

\* Doç. Dr., Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî li Zanîngeha Mardin Artukluşê.  
abdurrahmanadak@gmail.com

## DESTPÊK

Ji bo ku potansiyela edebiyata kurdî ya klasîk bi awayekî tekûz derkeve holê û tarîxeke birêkûpêk a wê edebiyatê bê nivîsîn, berî her tiştî divê bi qasî derfetê, hemû nivîskar û helbestvanên klasîk bîn tesbîtkirin û li gor rêbazekê bîn nasandin. Eger di nivîsîna tarîxa edebiyata klasîk de diyardeya zeman, seyra tarîxî, yan jî perspektîfa kronolojîk rêbaza bingehîn be, diyardeya mekan, navendên edebî yan jî perspektîfa herêmî temamkerên wê rêbazê ne û bi qasî wê girîng in. Gelek caran mekan, navend û herêm bi serê xwe di pêşketina edebiyatê de diyarker in û di avabûna tradîsyonên edebî de xwedî bandor in. Digel vê jî heta niha di xebatên li ser tarîxa edebiyata kurdî de zêdetir diyardeya zeman derketiye pêş û diyardeya mekan lawaz maye.

Xebatên li ser mekan bi piranî di çarçoveya navend û herêmên edebî de tên kirin. Di demekê de kombûna helbestvanan li dora desthilatdariyeke maddî (wek qesrên mîran), yan jî manewî (wek tekyayên terîqetan) navendên edebî derdixe holê. Di navendeke edebî de hebûna helbestvanan bi wê desthilatdariyê ve girêdayî ye. Dema desthilatdarî bi hêz dibe hejmara helbestvanan jî zêde dibe, dema desthilatdarî lawaz dibe, helbestvan jî kêmtir dibin.<sup>1</sup> Bi qasî ku tê dîtin di edebiyata kurdî de ji bilî xebatên Ayhan Tek<sup>2</sup>, Selim Temo Ergül<sup>3</sup>, Abdurrahman Adak<sup>4</sup> û Zülküf Ergün<sup>5</sup> di vî warî de kêmtir xebat hatine kirin.

Heçî herêmên edebî ne, sînorên wan ên coxrafi û îdarî hene. Di dirêjahiya tarîxê de hemû helbestvanên ku di nav wan sînoran de jiyana xwe bihurandine jî xebatên vê qadê re dibin mijar. Ji ber ku ev helbestvan di serdemên cuda de û li deverên cûrbicûr ên wê herêmê jiyane, di herêmekê de hebûna kategorî û bizavên edebî yê ciyawaz asayî ye. Herçiqas di serdemên klasîk ên edebiyatên rojhilatê de derheqê helbestvanên herêman de hin berhem hatine nivîsîn jî<sup>6</sup>, bi qasî ku tê zanîn di serdema klasîk a tarîxa edebiyata kurdî de berhemên bi vî rengî nehatine nivîsîn.<sup>7</sup> Lêbelê dema em tînin serdema modern em dibînin ku di vê mijarê de bi taybetî bi

34

<sup>1</sup> Ji bo vê mijarê bnr. Haluk İpekten, *Divan Edebiyatında Edebî Muhitler*, MEB Yay., İst. 1996; Halil İnalçık, *Şair ve Patron*, Doğu Batı Yayınları, Çapa Sêyem, Ankara, 2010.

<sup>2</sup> Ayhan Tek, "Li Dor Behsa Patronajê *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî", *Mukaddime*, Mardin 2010, j. 3, r. 41-60.

<sup>3</sup> Selim Temo Ergül, "Profîla Helbesta Klasîk li Bakur: Nebûna Navendê û Encamên Wê", *Komele Witarî Yekemîn Kory Nêwneteweyî Edebî Kurdî*, Zanistgay Kurdistan, Sine 2011, C. II, r. 673-682.

<sup>4</sup> Abdurrahman Adak, "Li Cizîrê Muhîteke Edebî: Dergahê Şêx Seyda û Rola wî di Edebîyata Kurdî de", *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre*, (Ed. M. Nesim Doru), Mardin Artuklu Üniv. Yay. İst. 2012, r. 465-487.

<sup>5</sup> Zülküf Ergün, *Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan*, Nûbihar, Stenbol 2014.

<sup>6</sup> Berhema Ali Emiri a bi navê *Tezkire-i Şuara-yı Amid* ji bo helbestvanên Diyarbekirî yê tirkînis hatiye terxankirin ji bo vê yekê wek nimûne dikare bê dayîn. (Ji bo berhemê bnr. Abdurrahman Adak, Ali Emiri Gözüyle Diyarbakırlı Şairler, Kent Yay, İst. 2011.)

<sup>7</sup> Eger em risaleya Mela Mehmûdê Bazîdî ya bi navê *Şair û Musennifên Di Kurdistanê* nehesibînin, di serdema klasîk a edebiyata kurdî de derheqê helbestvanan de berhemên biyograrîk ên giştî jî nehatine nivîsîn. Di edebiyatên rojhilatê di vî warî de gelek berhem hatine nivîsîn ku ev berhem wek "tebeqat" û "tezkîretu'ş-şu'era" tînin binavkirin. (Di vê mijarê jî bo agahiyên berfireh bnr. H. İpekten, M. İsen, F. Kılıç, İ. H. Aksoyak, A. Eyduran, Şair Tezkîreleri, Grafiker Yay., Ankara 2002; İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, L&M, İst. 2003, r. 469-471.)

kurdiya soranî çend xebat hatine kirin ku hin ji wan ev in: Kerîm Şareza, *Koye û Şairên Wê*; Sadiq Bahaeddîn Amêdî, *Şa'irên Navça Amêdiyê*; Îbrahîm Efxemî, *Tarîx û Edebî Mukriyan*; Mistefa Nerîman, *Edîb û Nûseranî Kifri û Dewrupîştî*; Usman Deştî, *Şi'ri Nawçeyî Mukriyan*; Ebdurehman Bamernî, *Şa'irên Bamernê*.<sup>8</sup> Eger em çend lêkolînên me yê derheqê helbestvanên Sêrt, Şirnex, Silva û Liceyê de ku van salên dawî hatine weşandin<sup>9</sup> nehesibînin, di kurdiya kurmancî de jî xebatên di vî warî de kêman in. Ji ber berterefkirina kêmasiya xebatên ji perspektîfa herêmi, em dixwazin di vê gotarê de jî li ser helbestvanên herêmeke din rawestin ku ew jî herêma Bedlîsê ye.

Bedlîs çawa ku di tarîxa kurdan de cihekî xwe yê girîng heye, di edebiyata kurdî de jî wisa ye. Bedlîs hem bi saya desthilatdariya Şerefxaniyan, hem jî bi saya medrese û tekyayên xwe, ji edebiyata kurdî ya klasîk re bûye navend û herêmeke girîng. Loma jî ev herêm ji bo xebatê balê dikişîne ser xwe. Di vê xebatê de du armancên me yê sereke hene: 1. Bi qasî derfetê, dever bi dever tesbîtkirin û naskirina tevahiya helbestvanên herêma Bedlîsê. Bi vî awayî dê derfeta naskirina helbestvanên herêmi yê ku nehatine bihistin jî derkeve holê. 2. Derxistina profîla van helbestvanan. Bi vî awayî dê cihê Bedlîsê di tarîxa edebiyata kurdî ya klasîk de û di çarçoveya herêma Bedlîsê de potansiyela edebiyata kurdî ya klasîk bê fêmkirin. Çawa tê dîtin armanca yekem di mesabeya tezkîreyeke klasîk, ya duyem jî di mesabeya nirxandineke akademîk de ye.

Di serdemên tarîxî de edebiyata kurdî ya klasîk, îstîsna ne têde, bi şeweya nezm û helbestê pêş ketiye û edebiyata kurdî ya klasîk a herêma Bedlîsê jî di vê çarçoveyê de ye. Loma jî -kêman jî bin- kesên ku berhemên pexşan dane derveyî sînorenê ve gotarê mane. Pêwîst e bê gotin ku li Bedlîsê gelek kurdên ku bi zimanên tirkî, erebî û farisî jî helbest nivîsîne hene. Lêbelê ji ber ku ev nivîsa me bi kesên ku helbestên xwe bi kurdî nivîsîne hatiye sînorkirin, kurdên ku bi zimanên din nivîsîne derveyî sînorenê gotara me ne. Helbestvanên Bedlîsî ên ku di çarçoveya edebiyata kurdî ya modern de helbest nivîsîne jî derveyî sînorenê ve lêkolînê ne. Çawa ku ji sernavê gotarê jî tê famkirin gotar ne bi navenda Bedlîsê tenê sînorkirî ye. Sînorenê gotarê, herêma Bedlîsê tevî di xwe de dihewîne. Bêguman li vir tesbîtkirina sînorenê herêma Bedlîsê wek xaleke girîng derdikeve pêş. Bi qeneeta me ji ber sedemên pratîk ji bo herêma Bedlîsê sînorenê îroyîn yê wîlayeta Bedlîsê esas bê girtin baştir e. Lewra aşkera ye ku di sînorenê tarîxî yê

<sup>8</sup> Derheqê van berhemên de ji bo agahiyên berfireh bnr. Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar (Çap 3), Stenbol 2013. 87-89.

<sup>9</sup> Ji bo van lêkolînan bnr. Abdurrahman Adak, "Klasîk Edebîyatta Siirtli Şairler", *Uluslararası Siirt Sempozyumu Bildirileri*, Birleşik Matbaa, İzmir 2007.; "Siirt'te Şiir ve Şair Üzerine Bazı Analiz ve Değerlendirmeler", *İbrahim Hakkı ve Siirt Uleması Sempozyumu*, Beyan. İst. 2008.; "Şırnak ve Çevresinde Yetişmiş Kürtçe Yazan Şairlere Genel Bir Bakış", (Uluslararası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu, 14-16 Mayıs 2010 Şırnak-Cizre), Şırnak Üniv. Şırnak 2010.; "Silvanlı Şairlere Genel Bir Bakış", *Uluslararası Silvan Tarihi Sempozyumu*, (Silvan, 25-27 Nisan 2008) Kent Işıkları, İst. 2012.; "Liceli Şairlere Genel Bir Bakış", *Dünden Bugüne Lice Sempozyumu* (05-06 Eylül 2008, Lice), Mardin Artuklu Üniv., Mardin 2012.

Bedlîsê de, di demên cuda de guherînên curbicur çê bûne. Bo nimûne Hîzan -ku îro qezaya Bedlîsê ye- berê mîrektiyeke serbixwe bû û Sêrt -ku îro wîlayeteke serbixwe ye- demekê qezaya Bedlîsê bû. Eger em sînorên berê li ber çavan bigirin divê em Hîzanê derveyî mijarê bihêlin û Sêrtê jî bixin nav mijarê ku ev yek bi serê xwe arîşeyeke mezin derdixe holê. Ji bo berterefkirina vê arîşeyê di vê xebatê de me sînorên wîlayeta Bedlîsê ya îroyîn wek sînorên herêma Bedlîsê qebûl kiriye.

Di gotarê de pêşî li pey şopa kevneşopiya berhemên biyografîk ên klasîk (Tezkîretu'ş-Şu'era) helbestvanên klasîk ên herêma Bedlîsê dê bi awayekî alfabetîk bên dayîn, piştê jî ji aliyê serdem, koç, dever û mehsûlên edebî ve dê profîla van helbestvanan bê derxistin. Piştê bi encamekê dê dawî li gotarê bê dayîn.

## I. HELBESTVANÊN HERÊMA BEDLÎSÊ

Di vê xebatê de 17 helbestvanên herêma Bedlîsê hatine tesbîtkirin. Bêguman helbestvanên herêma Bedlîsê ne ev tenê ne û tesbîtkirina helbestvanên nû her dem pêkan e. Li jêrê ev helbestvan dê bi awayekî alfabetîk bên rêzkirin û nasandin. Di rêzkirina alfabetîk de nisbe/aîdiyeta helbestvanan û di nasandina helbestvanan de jî jînenîgariya wan û berhemdariya wan a di warê kurdî de dê esas bê girtin.

**1. Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî:** Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî helbestvanekî êwra dawî ya Osmaniyan e. Agahiyên derheqê wî de kêman in. Navê wî Ebdulezîz, navê bavê wî Ebdulkerîm e. Li cem Şêx Fethullahê Werqanîsî (w.1899) xwendîye û îcazeta ilmî ji wî stendiye. Bi ihtîmaleke mezin, ew di riya tesewifê de jî li pey seydayê xwe çûye û ji wî xelîfetiya Neqşebendîtiyê wergirtiye. Loma jî wek “şêx” hatiye binavkirin. Şêx Ebdulezîz li navenda Bedlîsê wefat kiriye û li wir hatiye veşartin. Herçiqas tarîxa wefata wî nayê zanîn jî, ji sala wefata Şêx Fethullahê Werqanîsî (w.1899) tê fêmkirin ku ew helbestvanê dawîya sedsala XIXem û destpêka sedsala XXem e.

Şêx Ebdulezîz helbestvanekî xwedî dîwan e û di dîwana wî de bi hemû herfên elîfbêya erebî helbest hene. Loma jî di nav helbestvanên Bedlîsî yê dawîya Osmaniyan de ji helbestvanên herî girîng tê hesibandin. Di dîwana wî de helbestên wî yê erebî, farîsî, tirkî û kurdî hene. Ev jî hêza wî ya bilind a edebî nîşan dide. Piraniya helbestên wî medhiyeyên tesewifî ne.<sup>10</sup> Mixabin ji ber ku destxeta dîwana wî ji aliyê me ve nehate bidestxistin, derfeta me ji bo agahiyên berfirehtir tune.

**2. Şikriyê Bedlîsî:** Şikriyê Bedlîsî, ji navenda Bedlîsê ye. Piraniya temenê xwe di sedsala XVem de û dawîya temenê xwe jî di sedsalan XVIem de bihurandiye

<sup>10</sup> Bnr. M. Asim Oxînî, *Birketu'l-Kelîmat*, Nusxeya fotokopî ya destnivîsê, Pirtûkxaneya A. Adak a taybet, 143-144; Hemdî Ebdulmecîd Seleffî, Tehsîn İbrahim Doskî, *Mu'cemu'ş-Şu'era'l-Kurd*, Spirêz, Erbil 2008, r. 265.

û di sala 1523yan de wefat kiriye. Şikriyê Bedlîsî, pêşî li Tebrîzê di qesra Akkoyuniyan de maye. Piştê hatiye Bedlîsê û li cem bapîrê Şerefexanê Bedlîsê Mîr Şerefê kurê Şemsedîn maye û bi wî re beşdarî hinek şeran bûye. Herweha bi begên Zulqadirîyan Ali Bey û Qoçî Bey; bi mîrêmîrê Diyarbekirê yê yekem Bıyıklı Mehmed Paşa, bi Sedrazam Îbrahîm Paşa re têkiliyên wî çêbûne. Bi arîkariya Sedrazam Îbrahîm Paşa *Selîmnameya* xwe pêşkêşî Siltan Selîm kiriye.<sup>11</sup>

Ji ber ku bi zimanê tirkî jî berhem û helbestên wî hene di hemû tezkîreyên helbestvanên Tirkan ên sedsala XVIem de û di berhemên pisporê edebiyata tirkî Fuat Köprülü de behsa wî hatiye kirin. Berhema wî ya herî girîng *Selîmname* (1521) ye. Di vir de jiyana Siltan Selîmê Osmanî aniye zimên.

Şikriyê Bedlîsî, yekem helbestvanê Bedlîsî ye ku di sedsala XV û XVIem de bi kurdî helbest nivîsîne. Ew helbestvanê herî kevin ê Bedlîsî tê hesibandin. Ji ber ku tifaqa kurd û Osmaniyan di sala 1517an de çê bûye, Şikrî wek helbestvanên berî vê tifaqê jî dikare bê hesibandin. Şikrî ne di çarçoveya helbestvanên Bedlîsî tenê de, di çarçoveya helbestvanên kurmancan bi giştî de jî, yek ji helbestvanên herî kevin tê hesibandin.

Digel ku nivîsîna wî ya helbestên kurdî teqez e jî -lewra ev yek ji aliyê wî bi xwe ve hatiye îfadekirin- heta niha ev helbestên wî derneketine holê. Çawa ku wî bixwe diyar kiriye, kurdî jî tê de bi şeş zimanan helbest nivîsîne. Ev şeş ziman jî ev in: Tirkî, farisî, erebî, kurdî, ermenkî û hindî. Wî di fexriyeyeke xwe de ku bi zimanê tirkî pêşkêşî Siltan Selîm kiriye, ev taybetmendiya xwe aniye zimên.<sup>12</sup>

**3. Gıyasettin Emre:** Gıyasettin Emre, di sala 1919an de li navenda Bedlîsê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Şêx Me'rûf e. Gıyasettin Emre ji malbata Şêx Fethulahê Werqanîsî ye. Şêx Fethulah li Bedlîsê dersdarî dikir, lêbelê li Oxîna Mutkiyê jî medrese û dergahê malbatê hebû. Gıyasettin Emre, pêşî li cem bavê xwe dest bi perwerdeyê kir, lêbelê perwerdeya xwe li cem apê xwe yê mezin Şêx Elaedîn xilas kir. Di sala 1954an de bû wekîlê Mûşê yê serbixwe. Di sala 1957an de ji partiya Demokratê bû wekîl. Piştî darbeya 1960an bi qasî 3 sal û nîvê ceza xwar. Di sala 2008an de li Konyayê wefat kir. Li ser Şêx Elaedîn û Şêx Xalidê Oxînî mersiyyên wî hene. Helbestên wî bi navê *Rênasî*, ji aliyê Zeyneladîbîn Zinar ve hatine amadekirin û di sala 1999an de li Stockholmê di weşanxaneya Pencînarê de hatine çapkirin.

**4. Mela Mudrikê Godişkî:** Mela Mudrikê Godişkî, di sala 1943yan de li gundekî Tetwanê bi navê Şikranîsê hatiye dinayayê. Bavê wî Mela Nûrullahê Godişkî jî helbestvanekî gelekî girîng e. Mela Mudrik li gundên Tetwanê yê wek Kizwak û Reşadiye li cem bavê xwe xwendiyê. Piştî leşkeriyê çar salan

<sup>11</sup> Ji bo Şikriyê Bedlîsî bnr. Abdurrahman Adak, "Şükri-i Bitlîsî", *Uluslararası Tatvan ve Çevresi Sempozyumu*, weş. Beyan., İst. 2008, r. 673-690.

<sup>12</sup> Mustafa İsen, *Kühü'l-Ahbar'ın Tezkire Kısmı*, weş. AKM, Ankara 1994, r. 233.



îmametiya fexrî kiriye. Piştire wwendengeha îmam xetîbê ji derve xilas kiriye. Piştire li Tetwanê li nexweşxaneyê sîgortayê wek memûr xebitiye. Di sala 2005an de malnişîn bûye. Mela Mudrik niha li Tetwanê jiyana xwe didomîne.

Mela Mudrik, bi qasî 25-30 heb helbest nivîsîne. Helbestên wî ji aliyê kêş, qafiyê û redîfê ve, her weha ji aliyê uslûb û bikaranîna mezmûnên klasîk ve gelekî serkeftî ne. Helbestên wî ji aliyê mijaran ve jî gelekî dewlemend in. Mela Mudrik, di mijarên evîndarî, tesewîfî, neteweyî, dînî û hwd. de helbest nivîsîne. Di nav helbestên wî de munacatên derheqê lavahiya ji Xwedê, ne'tên li ser Cenabê Pêxember, şikayeta ji felekê (bêfaydebûna dinyayê ji emrê însanî re), mersiyyên li ser Şêx Asim, Şêx Xalid û Şêx Mezherê Oxînî, herweha mersiyyên li ser Mela Mihyedîn û li ser bavê wî Mela Nûrulah û helbestek li ser erdheja Wanê jî cih digirin.<sup>13</sup>

**5. Mela Nûrulahê Godîşkî:** Malbata Mela Nûrulah bi eslê xwe ji wîlayeta Sêrtê navçeya Misircê gundê Têlanê ye. Malbata wî li wê herêmê wek “Mala Şêx Biço” hatiye naskirin. Malbatê piştire koçî herêma Mûşê kiriye. Mela Nûrulah jî di sala 1918an de li gundê Xarsê yê Têliya Mûşê hatiye dinyayê. Mela Nûrulah herî dawî li herêma Bedlîsê bi cih bûye û li wir wek Godîşkî hatiye naskirin. Hê sê mehî bûye, bavê wî Mela Ehmed wefat kiriye. Apê wî Feqî Mistefa ew xwedî kiriye. Li gundê Nokê li cem kurapê xwe Mela Sidîq dest bi xwendine kiriye. Piştire çûye Medreseya Oxînê li wir li cem Şêx Elaedînê kurê Şêx Fethullahê Werqanîsî xwendiyê û li cem Şêx Xalid îcazet standiyê. Piştire li ser daxwaza Şêx Elaedîn li gundê Qerabû dest bi melatîyê kiriye. Bi tevahî 45 salan li gundên curbicur ên Bedlîsê û derdora wê (Qerabu, Güzeldere, Kîzwak, Xizorkîn û Kuştîyan) melatî kiriye. Di sala 2003yan de li Tetwanê wefat kiriye, lêbelê li Oxînê hatiye veşartin.<sup>14</sup>

Mela Nûrulah nivîskar û helbestvanekî girîng e û xwediyê gelek berhemên edebî ye. Berhemên wî li jêrê hatine nişandan:

**El-Hemail fi'ş-Şemail:** Ev berhem derheqê taybetiyên bedenî yên cenabê Pêxember, rabûn û rûniştina wî û mijarên bi jiyana wî ya rojane ve têkildar de ye. Mela Nûrulah di nivîsîna vê berhema xwe de rîsaleyeke pexşan a Şêx Fethullahê Werqanîsî esas girtiye û ev rîsale adapteyî forma nezmê kiriye. Ev berhema Mela Nûrulah ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve hatiye amadekirin û di sala 2007an de ji aliyê weşanxaneyê Dozê ve hatiye çapkirin. Lêbelê digel ku berhem ya Mela Nûrulah e jî, di vê çapê de nivîskarê berhemê wek Şêx Fethullahê Werqanîsî hatiye nivîsîn.

**El-Cewahiru'r-Reşadiye:** Ev berhem bi kurdî ye û siyera cenabê pêxember e.

<sup>13</sup> Jêder: Mela Mudrikê Godîşkî, 05.07.2014, Tetwan.

<sup>14</sup> Mela Wefayê kurê Mela Nûrullahê Godîşkî, 07.07.2014, Tetwan; Feqî Huseyn Sağınç, *Tarîxa Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2002, 609-612.



**Dîwan:** Ev berhem bi kurdî ye û ji helbestên nivîskar pêk tê.

**Es-Sebaik fi'l-Menasik:** Ev berhem bi kurdî ye û derheqê erkanên umre û hecê de ye.

**Çenta Yetîman:** Ev berhem bi kurdî ye û derheqê eqîdeya Îslamê de ye.

**Kufri'l-Kebair:** Ev berhem bi kurdî ye û derheqê gunehên mezin de ye.

**Sehlu'l-Mewrid:** Ev berhem, bi erebî ye û şerha mewlûda Melayê Bateyî ye.

**Cami'u'l-Me'anî:** Ev berhem, bi erebî ye û şerha eqîdeya Îmanê ya Ehmedê Xanî ye.

**Şerha Qesîdeya Dilo Rabe:** Ev berhem, bi erebî ye û şerha helbesta “Dilo Rabe” ya Feqiyê Teyran e.

**El-Himyan fi Hidayeti's-Sibyan:** Ev berhem, bi erebî ye û derheqê tecwîda Qur'anê de ye.<sup>15</sup>

Di nav hemû helbestvanên Bedlîsî de yê herî zêde xwedî berhem Mela Nûrullah e. Berhemên wî hem ji aliyê qewareyê ve mezin in, hem jî ji aliyê cureyên xwe ve orjînal in. Lêbelê heta niha ji bilî *el-Hemail fi's-Şemailê* berhemên wî nehatine çapkirin.

**6. Selîmiyê Hîzanî:** Çawa ku ji navê wî jî tê fêmkirin, Selîmî xelkê Hîzanê ye. Lêbelê ji bilî vê agahiyê, derheqê wî de tu agahiyên din di dest de nînin. Ji ber ku kesên wek Rûdenko û Qenatê Kurdo, ew wek Selîmê Silêman dane nasandin, zêdetir bi vî awayî hatiye naskirin. Li gorî vê navê bavê wî Silêman e.

Jidayîkbûn û wefata Selîmî, bi awayekî zelal nayên zanîn. Lêbelê ji vê beyta jêrîn a ku di *Yûsiv û Zelîxaya* wî de derbas dibe, sala nivîsîna berhemê derdikevê meyndanê ku ev jî ji bo kifşkirina serdema wî nîşaneyekê girîng e:

Lewra bi hikayetê şeniyye  
Tarîx(i) ji ismê **Heq xenî** ye

Îfadeya “Heq xenî” ya vê beytê li gorî hesabê Ebcedê beramberî tarîxa 1168/1754an tê. Ev jî serdema ku helbestvan tê de jiyaye (sedsala XVIII) ji me re destnîşan dike.<sup>16</sup>

Herçiqas Qenatê Kurdo di berhema xwe ya bi navê *Tarîxa Edebiyata Kurdî* de li pey rêça Rudenko û A. Jaba dibêje ku Selîmê Silêman hemdemê Şerefxanê Bedlîsî (sedsal: XVI-XVII) ye û helbestvanê mîrê Hîzanê Mîr Şeref e jî, ev nêrîn heta niha nehatiye piştrastkirin.<sup>17</sup>

Selîmî, bi berhema xwe ya bi navê *Yûsif û Zelîxayê*, di tarîxa edebiyata kurdî de cihekî xwe yê taybet heye. Ev berhema wî, derheqê bûyera Yûsif Pêxember û

<sup>15</sup> Mela Wefayê kurê Mela Nûrullahê Godîşkî, 07.07.2014, Tetwan.

<sup>16</sup> Ji bo tarîxên di yên ku di vê mijarê de hatine derxistin bnr. Tehsîn Î. Doskî, *Yûsif û Zuleyxa Vehandina Selîmê Hîzanî*, Spîrêz, Dihok 2004, r. 12-15; Ayhan Geverî, *Yûsif û Zuleyxa-Selîmiyê Hîzanî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013, r. 45-46.

<sup>17</sup> Ji bo nêrîna Kurdo bnr. Qenatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Öz-ge Ankara 1992, r. 103. Ji bo reddyeyê vê nêrînê bnr. Doskî, *Yûsif û Zuleyxa*, r. 11-15; Geverî, *bn.* r. 43-46.

xanima ezîzê Misirê Zelîxayê de ye. Berî wî di edebiyatên farisî û tirkî de ev mijar hatiye nivîsîn, lê di edebiyata kurdî de cara pêşî ev mijar ji aliyê Selîmê Silêman ve derbasî nezmê bûye.

*Yûsif û Zelîxaya* Selîmê Silêman, li Kurdistana Bakur cara pêşî di sala 1998an de ji aliyê Feqî Huseyn Sağniç ve (Enst. Kurdî ya Stenbolê) û li Kurdistana Başûr jî di sala 2004an de ji aliyê Tehsîn Î. Doskî ve (Spîrêz) hat çapkirin. Herî dawî ji aliyê Ayhan Tek ve digel lêkolîna li ser berhemê metnekî tekûz ê berhemê hat amadekirin (Nûbihar 2013).

Berhem ji aliyê hecma xwe ve mezin e û li gorî metnê Geverî ji 2325 beytan pêk hatiye. Kêşa wê, wek kêşa “Mem û Zîn”ê “Me’ûlu mefa’ilun fe’ûlun” e. Mexlesa wî “Selîmî” ye ku ev mexles di berhema xwe de, yek di beşa tewhîdê de, yek jî di beşa Xatîmeyê de, bi giştî çar caran bi kar aniye. Selîmî, di vê berhema xwe de ji aliyê edebî û hizra neteweyî ve di bin bandora Ehmedê Xanî de maye ku di beşa sebebê telîfê ya berhema xwe de ev yek aniye ziman. Selîmî, ji helbestvanên piştî xwe, bandor li helbestvanekî din ê Bedlîsî kiriye ku ew jî Sewadî (Harisê Bedlîsî) ye. Li jêrê li ser wî jî dê bê rawestan.

**7. Mela Xelîlê Sêrtî:** Herçiqas nisbeta Mela Xelîlê Sêrtî bi bal Sêrtê ve tê kirin jî, ew di eslê xwe de xelkê devera Hîzanê ye. Mela Xelîl di sala 1750î de li gundekî Hîzanê bi navê Gulpîkê hatiye dinê. Bavê wî Mela Huseyn, bapîrê wî jî Mela Xalid e. Malbata Mela Xelîl ji eşîra Elîcanan e. Elîcanî li herêma Hîzanê li gundên wek Gulpîk, Kîlvîyan, Şên û Kûlatê dijîn. Bapîrê wî jî ji Kûlatê hatiye Gulpîkê. Eqrebayên malbata Mela Xelîl ku wek Mala Se’dla tên naskirin, heta niha jî li Gulpîkê dijîn.

Mela Xelîl bi rêzê li cihên wek Bedlîs, Helenze (gundekî Sêrtê), Westan, Muks, Hîzan, Xoşab, Cizîr û Îmadiyahê di medreseyan kurdan de xwendiyê û icazeya xwe ya ilmî li Îmadiyahê li cem Mela Mehmûdê Behdînî standiyê. Mela Xelîl piştî icazeya xwe ji Îmadiyahê çûye gundekî Mûsilê bi navê Reşîdiyê û li wir intisabî Şêx Ehmed Reşîdî yê Qadirî kiriye.

Mela Xelîl piştî vegeriya welatê xwe Hîzanê û li wir ji 5 salan zêdetir di medreseya Meyadanê de ders daye. Piştî li navenda Sêrtê bi cih bûye. Du sedemên çûna wî ya Sêrtê hene. Yê yekem daxwaza bavê wî ye, yê duyem jî bicihkirina rêbaza zanistên medreseyan li navenda Sêrtê ye. Mela Xelîl li Sêrtê bi dayîna dersan, perwerdekirina feqîyan û telîfkirina berhemên ilmî û edebî temenê xwe tije kiriye û di sala 1843an 96 salî li Sêrtê wefat kiriye. Gora wî li goristana Bileyliyê ye.<sup>18</sup>

<sup>18</sup> Ji bo jiyana Mela Xelîlê Sêrtî bnr. Mela Fudayl, *Tercemetu Hali Ceddina 'l-A'îlâ Mela Halil es-Si'rdî*, Nusxeya fotokopî ya destnivîsê, Pirtûkxaneya A. Adak a taybet. wr., 88-94; Bursalî Mehmet Tahir, Osmanlı Müellifleri, Matbaa-i Amire, İstanbul 1334, b. II, r. 38; Ömer Pakiç, “Molla Halil Siirdi”, DIA, İstanbul 2005, b. X, r. 403-405; ‘E. N. S. Doskî, el-Molla Xelîl es-Sêrtî we Menhecuhu fî İsbati’l-‘Eqaidi’l-İslamiyye, weş. Spîrêz, Erbil 2007, r. 23-73.

Mela Xelîlê Sêrtî derbarê ilmên wek serf, nehew, belaxet, mentiq, munazere, cedel, wed', eqaîd-kelam, hedîs, fiqh, tefsîr, tecwîd, tesewwuf, mewlûd û şemalê de ji 25an zêdetir berhem li dûv xwe hiştine.<sup>19</sup> Mela Xelîl berhemên xwe bi piranî di warê zanistên medreseyê de û bi zimanê erebî nivîsîne. Lêbelê wî du berhem jî bi zimanê kurdî dane: *Nehcu'l-Enam* û *Menzûmeya Tecwîdê*.

Nehcul'Enam berhemeke girîng ya edebiyata dînî ye. Ev berhema didaktik a dînî û exlaqî di medreseyên kurdan de ji bo perwerdeya xwendekarên medreseyan hatiye bikaranîn. Berhem ji aliyê naverokê ve du beş in. Beşa yekem derheqê Eqîdeyê de ye, beşa duyem jî derheqê exlaq de ye. *Menzûmeya Tecwîdê* derheqê rêzikên rastxwendin û xweşxwendina Qur'ana Pîroz de ye. *Menzûmeya Tecwîdê* di edebiyata dînî ya kurdiya Kurmancî de berhemeke gelek girîng e. Lewra di tarîxa edebiyata kurdî de di warê xwe de berhema yekem e.<sup>20</sup> Ji bilî van her du menzûmeyan Mela Xelîlê Sêrtî bi kurdî hinek helbest jî nivîsîne.<sup>21</sup>

Mela Xelîlê Sêrtî di pêşketina medreseyên kurdan de roleke mezin lîstîye. Kesên ku wî û zarokên wî perwerde kirine li tevahiya Kurdistana Bakur belav bûne û van kesan pirtûkên wî dane xwendin. Bi taybetî pirtûka wî ya Kurmancî *Nehcu'l-Enam* ketiye nav mufredata medreseyan de.

**8. Mela Îmadedîn Reşpojan:** Mela Îmadedîn Reşpojan, ji gundekî Hîzanê bi navê Hêrwis e. Di sala 1944an de hatiye dinyayê. Malbata wî malbateke xwenda bûn û hem bavê wî, hem apê wî mela bûn. Loma di zarokatiya xwe de dest bi xwendina medreseyê kiriye û di nava 5 salan de perwerdeya medreseyê xilas kiriye. Di sala 1968an de li cem Mela Mihyedînê Hawelî îcazet stendiye. Piştî îcazeyê 20 salan muderistî kiriye. Piştî li cihên wek Masertê, Bazîd, Kozluk, Bedlîs, Elbak û Denizliyê miftîti kiriye.

Mela Îmadedîn, di dema melatî û miftîtiya xwe de bi hereketên siyasî yên kurdî re têkilî daniye. Bi kesên wek Seîd Elçî û Cegerxwîn re hevaltiya wî çêbûye. Ji ber hîzrên xwe yên neteweyî hatiye nefkîrin.

Mela Îmadedîn nivîskar û helbestvanekî gelekî jêhatî ye. Xebatên wî yên peşan û yên menzûm jî hene. Li gor agahiyên ku nivîskar dane me, diwana wî ya helbestan ji pênc bergan pêk tê; du berg ji van li Diyarbekirê çap bûne<sup>22</sup>, sê berg jî hêj nehatine çapkirin. Ji bilî van gelek helbestên wî jî wînda bûne. Digel helbestên kurdî, di helbestên erebî de jî gelekî serkeftî ye. Mela Îmadedîn

<sup>19</sup> Ji bo berhemên Mela Xelîlê Sêrtî bnr. h.c.

<sup>20</sup> Ji bo edebiyata kurdî ya serdema mîrektîyan bnr. Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar (Çap 2), Stenbol 2013, r. 183-359.

<sup>21</sup> Bnr. Abdurrahman Adak, Mela Xelîlê Sêrtî: Helbestvanê bi Mexlesa "Şewqî" û Helbestên wî yên Kurmancî, Mardîn Artuklu Üniv. Mukaddime Dergisi, j. I, s. 2010.

<sup>22</sup> Mixabin me nekarî em derfeta dîtina van berhemên çapkirî bi dest bixin.

derbareyê Bedîuzzeman Se'îdê Nûrsî de jî hem bi kurdî hem jî bi erebî helbest nivîsîne.<sup>23</sup> Mela Îmadedîn di helbestên xwe de mexlesa Reşpojan bi kar anîye.

Mela Îmadedîn ji bilî berhemên menzûm, berhemên pexşan jî nivîsîne. Ji van *Serfa Kurdi* çap bûye. Herweha derheqê Ehmedê Xanî û tarîxa kurdan de jî du berhemên wî hene, lê heta niha nehatine çapkirin.<sup>24</sup>

**9. Ebdulahê Qursincî:** Ebdulahê Qursincî li gundekî Hîzanê bi navê Qursincê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Feqe Mihemed, navê bapîrê wî Mela Mistefa ye. Texmînî di sala 2000î de wefat kiriye. Qursincî, di zanistên medreseyê de zêde peş neketiye, lêbelê di warên telîfa menzûmeyan û vegotina bûyeran de xwediyê şîyan û hunermendiyeke mezin bûye. Bi Qursincî re hafîzeyê gelekî bihêz hebûye. Çi bûyera ku bi serê wî de hatiye, digel hemû hûnguliyên di heman gavê de derbasî nezmê kiriye. Bi qasî 20-30 menzûmeyên wî hene ku di her yekê jî wan de bûyereke neqil kiriye. Ji vî aliyê ve Qursincî wek waqanûsekî ku bûyerên herêmî nivîsîne dikare bê hesibandin. Divê ev jî bê gotin ku mîzah, hicîw û nukte rengên sereke yê menzûmeyên Qursincî ne. Ev reng di hemû menzûmeyên wî de derdikeve pêş.

Aliyekî din ê hunermendiya Qursincî ew e ku di pêşkêşkirina bûyeran û nimandina dengên zarok, mezin, jin, mêr û her cure tiştî de hêzeke wî ya mezin hebûye. Loma ew wekî şanogerekî girîng ê serdema xwe tê hesibandin. Dikare bê gotin ku di vî warê de ew kesekî nadir bûye.<sup>25</sup>

**10. Xelîfe Selîm:** Xelîfe Selîmê ku wek Mela Selîmê Hîzanî jî tê naskirin, di sala 1856an de li gundê Ezîzan ku li ser Kanîreşa Çewlikê ye hatiye dinyayê. Wekî malbat ji Darahênê (Genç) ne, lêbelê bavê wî li Kanîreşê bi cih bûye. Mela Selîm, li gundê Mengelê (Qelencûx/Kalencik) yê Kanîreşê li cem bavê xwe perwerdeya medreseyê dîtîye. Piştî çûye Misrê û Şamê û li wan deran jî perwerde dîtîye. Piştî vegeerê li gundê Qelencûxê dersdarî kiriye. Mela Selîm, çûye Stenbolê û Îranê jî. Li Îranê jî çar salan dersdarî kiriye. Mela Selîm, kesekî alim bûye. Di nav xwendekarên wî de kesên wek Şêx Şehabedîn û Seyîd Elî ku jî malbata şêxên wî ne û hevrêyên wî yên serhildanê ne, Mela Mistefa Barzanî û Seîdê Nûrsî jî hene.

Mela Selîm, ji bo rêça tesewîfê berê xwe daye herêma Hîzanê û li cem kurê Seyîd Sibxetullahê Arwasî (Xews) Şêx Nûr Mihemed îcazeta terîqeta Neqşebendîtiyê stendiye. Piştî çûna wî ya Hîzanê ew wek Xelîfe Selîm, yan jî Mela Selîmê Hîzanî hatiye naskirin. Cegerxwîn jî di helbesteke xwe de ew wek Mewlana Selîmê Hîzanî bi nav kiriye.<sup>26</sup>

<sup>23</sup> Zeynelâbidîn Âmidî, *Medhiyye û Mersiyye Der Heqê Seydâyê Bedî'uzzemân*, Diyarbakır Söz Yay., Diyarbakır 2004., r. 109-111.

<sup>24</sup> Jêder: Mela Îmadedîn Reşpojan, 10.07.2014, hevdişîna bi rîya telefonê.

<sup>25</sup> Jêder: Mela Seyîdxan Özdemir, 12.07.2014, Tetwan.

<sup>26</sup> Cegerxwîn, "Hozan û Şa'irên Kurd", *Sewra Azadî*, Avesta, Stenbol 2002, r. 151-153.

Xelîfe Selîm, ji bilî karên medrese û terîqetê, bi karên civakî û siyasî re jî têkildar bû û di vê çarçoveyê de di damezirandina cemiyeta “Kürd Teavûn ve Terakki” û Rêxistina “Îrşadê” de jî cih girtiye. Di sala 1914an de li dijî hikûmeta Îttîhad û Tereqqiyê digel Şêx Şehabedîn û Seyîd Elî, serhildaneke leşkerî pêk aniye. Simko Axayê Şîkakî jî piştgirî daye serhildanê, lêbelê serhildan negihîştîye armanca xwe. Di dawiyê de Osmanîyan Şêx Şehabedîn û Seyîd Elî bi dar ve kirine, Xelîfe Selîm jî xwe spartîye balyozxaneyê Rûsan a Bedlîsê. Lê piştê di wextê şerê Tirk û Rûsan de, Tirk ketine balyozxaneyê û Xelîfe Selîm bi dar ve kirine (1914).<sup>27</sup>

Xelîfe Selîm, digel van aliyên xwe bi helbestê re jî eleqedar bûye. Wî bi kurdî gelek helbest nivîsîne, lêbelê helbestên wî nehatine berhevkerin. Di helbestên Xelîfe Selîm de temayên dînî, civakî û neteweyî tînin.<sup>28</sup> Cegerxwîn jî di helbesta xwe ya bi navê *Hozan û Şa'irên Kurd* de ku ji bo danasîna helbestvanên kurd terxan kiriye, cih daye helbestvanê me jî û sîtayîş pesnê wî daye:

Yek Mewlana Selîmê Hîzan e  
Kurdperwer û mezin û rêzan e  
  
Wî di ber Kurda de xwe da kuştin  
Çend xoşxwan bi şûn xwe ve hiştin

**11. Sewadî:** Helbestvanekî din ku bi bal Bedlîsê ve hatiye nisbetkirin Sewadî ye. Sewadî mexlesa wî ya helbestê ye. Di çavkaniyan de navê wî wek Haris û herêma wî jî wek Bedlîs hatiye nîşandan û ji Sewadî zêdetir wek “Harisê Bedlîsî” behsa wî hatiye kirin.<sup>29</sup> Li gorî Perviz Jahany di nisbetkirina Sewadî bi bal Bedlîsê ve teqezîyek tune ye û dibe ku ew ji gundekî bi navê Sewadî be ku li ser qezaya Basa (Güçlükonak) ya wîlayeta Şîrnexê ye.<sup>30</sup>

Ji van beytên jêrîn ku di destpêka *Leyla û Mecnûnê* de nivîsîne, derdikeve meydanê ku Sewadî di sedsala hijdehem de jiyaye:

Nehroz (i) tamam (i) paşê newroz  
Menqûş (i) mi kir nigîne pîroz  
  
Mexzê dev û lêv se'yê sinne  
Tarîx ji wî lew ji mexzê sinne

<sup>27</sup> Nevzat Bingöl, Bitlis İsyani ve Şeyh Selim, Weş. Do, İstanbul 2013; Sağnıç, b.n., r. 460-64; Temo, b.n., II, 1475.

<sup>28</sup> Ji bo ku hin ji helbestên wî dan me, ji Nevzat Bingöl re spasîyên xwe pêşkêş dikim.

<sup>29</sup> Rudenko, M. B., *Opisanie Kurdish Rukopisy Leningradskii Sobranie*, Izdatelbstvo Vdstdçndy Literaturi, Moskova 1961, r. 61-62; Kurdo, b.n., r. 122.; Abdulrehman Mizuri, “Leyla û Mecnûna Harisê Bitlîsî”, wer. Alîxan Aras, <http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-30477610.html>. (15.08.2014); Marûf Xeznedar, *Mêjuwî Edebi Kurdî*, weş. Aras, Hewlêr 2010, II, 507; Doskî, Tehsîn Î., *Harisê Bedlîsî Leyla û Mecnûn*, weş. Spîrêz, Hewlêr 2004, r. 3, 14, 36; Sağnıç, b.n., r. 417; Selim Temo, *Kürt Şiiri Antolojisi*, weş. Agora, İstanbul, 2007, II, 1374.

<sup>30</sup> Perviz Jahany, *Leyla û Mecnûna Sewadî (Metin, Lêkolîn, Şîrove)*, Teza Lisansa Bilind a Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn 2016, r. 27.

Ji beyta pêşî aşîkar dibe ku nivîskar berhema xwe piştî Newrozê bi deh rojan nivîsiye. Ev jî beramberî 31ê adarê tê. Ji beyta duyem jî ji îfadeya “mexzê sinne” bi hesabê Ebcêdê tê fêmkirin ku sala nivîsînê 1162 (bi mîladî 1748) e. Bi vî awayî tarîxa nivîsîna vê berhema dibe 1161/31ê Adara 1161ê hicrî ku beramberî sala 1748ê tê. Lê ji ber ku di hinek nusxeyan de peyva “sinne”yê wek “sîne”yê jî hatiye nivîsîn, eger em hesabê ebcêdê li gorî vê çê bikin, wê demê tarîx bi zêdebûna 10 salan dê bibe 1172 (bi mîladî 1758).<sup>31</sup>

Eger Sewadî, di sala 1748, yan jî 1758an de berhema xwe nivîsibe, wê gavê ew berî vê tarîxê hatiye dinyayê û di vê tarîxê de bi hindikayî serdema zoroktiyê û perwerdeyê xilas kiriye. Ji xwe di hinek çavkaniyan de hatiye neqlkirin ku sala bûyîna wî 1700 yan jî 1738 e.<sup>32</sup>

Li gorî ku ji berhema wî *Leyla û Mecnûnê* tê fêmkirin Harisê Bedlîsî gihiştiye serdema du mîrên Bedlîsê: Emînê Yûsif û piştî wefata wî kurê wî Ebdulah Xan. Bedlîsî di berhema xwe de weha behsa van her du mîran kiriye:<sup>33</sup>

Mîrê ku felek li wî muessif

Zil'îzz û 'ula **emînê Yûsif**

Roja feleka kemalê 'îrfan

Begzadeê 'alî **Ebdulah Xan**

44

Harisê Bedlîsî bi navê *Leyla û Mecnûnê* berhemeke gelekî girîng nivîsiye û di vê berhema de mexlesa “Sewadî” bi kar aniyê. Sewadî ev mijara meşhûr a ku di edebiyata erebî, farisî û tirkî de heyî, îcar di kurdî de aniyê zimên. Çawa ku li jorê hat ravekirin, berhem yan di sala 1748, yan jî di sala 1758an de hatiye nivîsîn.

Berhem cara pêşî ji aliyê M. B. Rûdenko ve di sala 1965an de bi alfabeya Rûsî; cara duyem di sala 1999an de li Stenbolê ji aliyê weşanxaneya Nûbiharê ve bi alfabeya erebî û latînî; di sala 2004an de ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve li Duhokê bi alfabeya erebî îmlaya Başûr hatiye çapkirin. Herî dawî ji aliyê Parviz Jahany ve li Zanîngeha Mardin Artukluyê tezeke lîsansa bilind hatiye amadekirin. (*Leyla û Mecnûna Sewadî-Metin, Lêkolîn, Şîrove*, Mêrdîn 2016) Li gorî metnê vê tezê berhem ji 23 beş û 779 beytan pêk tê.

Herçiqas Qenatê Kurdo behsa berhemeke Sewadî bi navê *Yûsif û Zileyxayê* dike<sup>34</sup> jî, li gorî ku Parviz Jahany dibêje, li ser nisbeta wê berhema bi bal Sewadî

<sup>31</sup> Kurdo, b.n., r. 123; Mizuri, g.n.; Doskî, b.n., 17-18.

<sup>32</sup> Doskî, b.n., r. 7-19; Temo, b.n., II, 1374, Abdulhadi Timurtaş, “Haris el-Bitlîsî ve Leyla û Mecnûn Adhî Manzûmesi” *I. Uluslararası Dünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri*, Beyan Yay., İst. 2008., r. 373.

<sup>33</sup> Ji bo jiyana helbestvan bnr. Perviz Jahany, h.t., r. 21-38; Harisê Bedlîsî, *Leyla û Mecnûn*, Amd. Tehsîn Î. Doskî, Spîrêz, Dihok 2004, r. 7-19.

<sup>34</sup> Kurdo, bn., r. 122.

ve guman hene.<sup>35</sup> Herweha Tehsin Î. Duskî jî du helbestên ku bi bal Sewadî ve nisbet dike weşandine.<sup>36</sup> Lêbelê dîsa li gorî Parviz Jahany jî van helbestan tenê yek a Sewadî ye.<sup>37</sup>

**12. Mela Ebdulkerîmê Tetwanî:** Mela Ebdulkerîm, xelkê Tetwanê ye. Li Bulanixê (Kop) melatî kiriye. Piştê li navenda Xelatê bi cih bûye û bi qasî bîst salan li wir melatî kiriye. Di derdora sala 2000î de li Xelatê wefat kiriye. Gelek helbest û menzûmeyên wî hene, lêbelê heta niha nehatine çapkirin.<sup>38</sup>

**13. Mela Îbrahîmê Tetwanî:** Mela Îbrahîm, di sala 1949an de li gundê Histûsê yê Tetwanê hatiye dinyayê. Li cihên wek Kawaş/Westan û Pirûsê li cem Mela Mehmûd perwerdeya medreseyê dîtîye. Di 20 saliya xwe de jî medreseyê veqetiyaye û çûye leşkeriyê. Piştî leşkeriyê li Tetwanê di saziyeke fermî de dest bi karkeriyê kiriye û jî karê xwe malnişîn bûye. Niha jiyana xwe li Tetwanê didomîne.

Mela Îbrahîm, bi navê “Pirtûka Şîretên Zarokan” berhemeke menzûm nivîsiye. Di berhemê de 1000 şîret hene. Her şîretek jî bendên du, sê, yan çar misrayî pêk tê. Zimanê wan sade û keşa wan jî serbest e. Berhem heta niha nehatiye çapkirin.<sup>39</sup>

**14. Mela Ehmedê Xelatî:** Mela Ehmed di sala 1933yan de li gundê Soktilî (Sogutlu) yê Bulanixa Mûşê hatiye dinyayê. Bavê wî Mela Weysiyê Soktilî (1885-1962) mela û şairekî navdar bû. Ew bi xwe di sala 1885ê de li bajarê Xelatê hatiye dinyayê, lêbelê piştê li gundê Soktilî bi cih bûye. Mela Ehmed pêşî li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye. Piştê li gundên Bulanixê, Malazgirê û li navenda Norşînê bi qasî 13-14 salan perwerdeya medreseyê dîtîye. Wî li Tendureka Malazgirê li cem Mela Zahir, jî gundên Bulanixê li Tirtopê li cem Mela Reşîd, li Mela mustefayê li cem Mela Ni'metullah, li Lekerê li cem Mela Cemîl, li Adgoyê li cem Şêx Tahayê Mala Seyda; li Nûrşînê di dema postnişîniya Şêx Me'sûm de li cem Şêx Nasirê neviyê hezret, Mela Baqiyê Subaşî (xelfeyê Melayê Mezin Şêx M. Emîn û zavayê seyda) û Mela Mehmûd xwendiyê û herî dawî li Nûrşînê li cem Mela Mehmûd îcazet stendiye. Mela Ehmed di zemanê Şêx Me'sûm de li Nûrşînê di şert û mercên zehmet de di binê erdê de perwerde dîtîye û di wî zemanê de bi taybetî jî Mela Baqî gelekî sûd wergirtiye. Piştê li cihên wek Bulanix, Zonguldak û Xelatê 35 salan melatî kiriye. Di sala 1995an de malnişîn bûye.<sup>40</sup>

<sup>35</sup> Parviz Jahany, h.t., r. 39.

<sup>36</sup> Harisê Bedlîsî, b.n., r. 20-29.

<sup>37</sup> Parviz Jahany, h.t., r. 47-48.

<sup>38</sup> Jêder: Mela Nîzamedîn Yakışık, 17.07.2014

<sup>39</sup> Jêder: Mela Îbrahîmê Tetwanî, 06.07.2014; Azad Orak, 06.07.2014.

<sup>40</sup> Jêder: Mela Ehmedê Xelatî, 15.07.2014..



Mela Ehmed di jiyana xwe de ji gelek kesayetan hez kiriye û li ser wan medhiye û mersiye nivîsîne. Helbestên wî bi piranî di vê mijarê de ne. Dîwana wî wek dîwana medhiye û mersiyyan dikare bê hesibandin. Loma jî nivîskar dîwana xwe wek *Bîra Kul û Derda* bi nav kiriye. Di dîwana Mela Ehmed de 148 helbest hene. Kesên ku wî di dîwana xwe de li ser wan helbest nivîsîne du beş in. Beşa yekem şêxên serdema wî ne ku hin ji wan ev in: Ji Nûrşînê Şêx Ebdurehmanê Taxî (Seyda), Şêx Diyaedîn (Hezret) Şêx Mesûm, Şêx Meşûq; Şêx Mihmedê Kufrewî, Seydayê Mela Raşid, Şêx Raşidê Menzilê, Şêx Fewzedînê Menzilî, Şêx Yehyayê Çoxreşî. Beşa duyem jî kurê wî Munîr e. Kurê wî Munîr piştî ku 4 salan li Fransayê li Zanîngeha Sorbonê xwendiyê li Belçîqayê bi keçeke bi navê Neclayê re nişana xwe çêkiriye û lê berî ku bizewicin di sala 2006an de di qezayeke trafikê de digel destgirtiya xwe rihê xwe ji dest daye. Mela Ehmed, di beşeke mezin a dîwana xwe de li ser kurê xwe Munîr û destgirtiya wî Neclayê helbest nivîsîne. Herweha li ser Helepçe û Sînemaya Amûdê jî helbestên wî hene.<sup>41</sup>

**15. Seydayê Xelatî:** Navê wî Mela Seîd e. Mela Seîd ji ber ku xelkê Xelatê ye, wek “Seydayê Xelatî” navdar bûye. Mela Seîd, di sala 1938an de li Xelatê hatiye dinyayê. Di medreseyan de perwede dîtiye. Seydayê Xelatî jiyana xwe li Xelatê didomîne.

Seydayê Xelatî, Ji sala 1958an heta îro helbestan dinivîse. Bi navê “Xelat”, “Civat”, “Dara Azadî”, “Evîn û Axîn” û “Rewşen” 5 pirtûkên wî yê helbestê hene. Herweha bi navê “Evîna Bêtixûb” romaneke wî jî heye. Di helbestên wî de mijarên wek evîna welat, destanên evîndariyê, kurdên ku di riya azadiyê de jiyana xwe ji dest dane cih digirin.

**16. Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî:** Şêx Şemsedîn, xelkê Xelatê ye. Seyîd Ehmedê Xelatîyê ku di rêza dozdehem a silsileyê wî de ye, ji Hemedanê koçî Xelatê kiriye. Ew bi xwe di sala 1588an de li Xelatê hatiye dinyayê. Şêx Şemsedîn, pêşî li Xelatê li cem kesekî bi navê Seyîd Ebdulkerîm xwendiyê. Piştê digel bavê xwe Seyîd Ebdurehman û birayê xwe Mihemed Emîn Xelat terk kirine û ji wir di dema Mîr Îmadedînê Hekkarî de çûne Hekkarî û demekê di nav eşîra Doskiyan de mane. Digel ku ehlên wî li Hekkarî diman, ew bixwe tevî eşîra Ertûşîyan dibû ku di navbera Hekkarî û Behdînan de koçberî dikirin. Şêx Şemsedîn di seferekê de bi Ertûşîyan re çûye Imadiyeya paytexta mîrnişîniya Behdînan û bi mîrê wê demê Seydî Xan re hevdiin kiriye. Mîr, zehf jê hes kiriye û heft gundên eşîra Mizûriyan dane wî. Ew jî ji wan gundan li Birîfkanê bi cih bûye û li wir tekyayeke Xelwetîyan ava kiriye. Ev bûyer di sala 1030/1621ê de qewimiye. Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî, ji wê salê û şûn de bi qasî 53 salan li Birîfkanê di tekyaye xwe de wezîfe kiriye û di sala 1085/1674an de 88 salî wefat kiriye. Şêx Şemsedîn piraniya temenê xwe di sedsala hivdehem de bihurandiyê.

<sup>41</sup> Mela Ehmedê Xelatî, *Dîwan Bîra Kul û Derda*, bê cih û tarîx.



Herçiqas navê Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî wek yên Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran zêde belav nebûbe jî, ew yek ji nûnerên kevin û ewilîn ên edebiyata kurdî ya klasîk e. Ew helbestvanekî xwedî dîwan e, lê ji dîwana wî tenê 16 helbest û du helbestên netemambûyî gihîştine îro. Ev helbestên wî yên ku ji aliyê Şêx Memdûhê Birîfkanî ve hatine parastin cara pêşî di sala 2001ê de li Swêdê ji aliyê weşanxaneya Roja Nû ve bi navê *Dîdarê Yar* hatine çapkirin (Amd. Zahid Birîfkanî). Mihemed Emîn Doskî jî ev helbestên wî bi zimanê erebî bi navê *Lewami' u 'ş-Şehib* şerh kirine. Ev şerh di sala 2007an de li Dihokê ji aliyê weşanxaneya Spîrêzê ve hatiye çapkirin. Herî dawî ji aliyê Serdar Yılmaz ve li Zanîngeha Mardin Artukluyê li ser Şêx Şemsedîn û helbestên wî tezeke masterê jî hat amadekirin.

Bi qasî ku tê zanîn di tarîxa edebiyata kurdî de nûnerê yegane û herî girîng ê Xelwetiyan Şêx Şemsedîn e û ji bilî wî di nav helbestvanên kurdan de yên ku vê ekolê temsîl dikin nînin. Şêx Şemsedîn navê terîqeta xwe wek mexles jî bi kar aniyê û di çarçoveya dustûrê xelwetê de xwe ji insanan dûr xistiye, derketiye sehra û çolan û li wan deran di kavil û şikeftan de jiyaye. Di encamê de di helbestên xwe de behsa gelek heywanan kiriye. Wî di helbestên xwe de bi îfadeyên girtî û bi dirûvê remz û şîfreyan hizra wehdetu'l-wicûdê jî parastiyê.

Piştî wî bi du sedeyan neviyê wî yê xeleka çarem Şêx Nûredînê Birîfkanî (w. 1851) û piştî Şêx Nûredîn bi sedeyekê neviyê wî Şêx Memdûhê Birîfkanî (w. 1976) jî helbestvanên girîng in<sup>42</sup>.

**17. Mela Nîzamedîn (Yakışık):** Mela Nîzamedîn (Yakışık), di sala 1967an de li gundekî Tetwanê bi navê Kurtvanê hatiye dinyayê. Lêbelê wek malbat ji gundekî Hîzanê bi navê Qursincê ne. Bavê wî Mela Mihyedînê Qursincî seydayê medreseyê bû. Mela Nîzamedîn jî li gundên wek Kindiras û Xaxûsê li cem bavê xwe perwerdeya medreseyê dît. Herweha li cem Mela Feqîrullah Erkoç, Mela Burhanedîn Geylanî, Mela Mehmûd Ayaz û Mela Seffetullah AYTE jî perwerde dît. Di sala 1988an de ji bavê xwe îcazet stend. Mela Nîzamedîn digel perwerdeya medreseyê perwerdeya fermî jî dît û di sala 1988an de lîseya Îmam-Xetîbê û di sala 2000î de jî peymangeha Îlahiyatê xilas kir.

Di sala 1989an de li gundê Xaxûsê dest bi melatiya fermî û muderistiyê kir û piştî du salan li navenda Tetwanê li mizgefta Medîneyê hat wezîfedarkirin. Ji wê demê heta niha li heman cihê melatiya fermî û muderistiyê didomîne. Mela Nîzamedîn ji bilî muderistiyê li ser kevneşopî û pirsgerêkên medreseyan, rêbaza perwerdeya wan û mufredata medreseyan gelek lêkolîn jî kirine. Herweha li ser van mijaran di sempozyumên ku li Bîngol, Mûş, Hekkarî, Wan, Mêrdîn û Bedlîsê de gotar pêşkêş kirine. Mela Nîzamedîn sekreteriya “Medrese Alimlerî Vakfî MEDAV” (Weqfa Alimên Medreseyan WAMED) ê jî dike.<sup>43</sup>

<sup>42</sup> Mihemed Emîn Doskî, *Lewami' u 'ş-Şehib*, weş. Spîrêz, Dihok 2007, r. 9-15; Şêx Nûredînê Birîfkanî, *Dîwan Zibanê Kurdî*, Amd. Zahid Birîfkanî weş. Aras, Erbil 2002, 28-35; Serdar Yılmaz, Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn 2013.

<sup>43</sup> Jêder: Mela Nîzamedîn Yakışık.

## II. PROFÎLA HELBESTVANÊN HERÊMA BEDLÎSÊ

Di vê beşê de dê ji aliyê serdem, koç, dever û mehsûlên edebî ve profîla helbestvanên Bedlîsî bê derxistin. Divê ev bê gotin ku şîrove û analîzên ku hatine kirin û encamên ku hatine bidestxistin di çarçoveya 17 helbestvanên ku di vê gotarê de hatine nasandin de ye. Li gor tesbîtkirina helbestvanên nû, dibe ku di van şîrove û encaman de hin guherîn çê bibin.

### A. SERDEM

Helbestvanên klasîk ên herêma Bedlîsê, paralelî serdemên tarîxa edebiyata kurdiya kurmançî, ji aliyê seyra tarîxî û kronolojîk ve li ser du serdemên sereke tîn dabeşkirin: Helbestvanên serdema mîrektiyan (ji destpêkê heta 1850î) û yên serdema piştî mîrektiyan. Helbestvanên serdema piştî mîrektiyan jî di nav xwe de dibin du beş: Yên êwra dawîya Osmaniyan (1850-1923) û yên êwra komara Tirkîyeyê. Ji aliyê vê seyra tarîxî ve profîla helbestvanên herêma Bedlîsê di tabloya jêrîn de dikare bê şopandin.

JMR	SERDEM	HELBESTVAN	SEDSAL
1	SERDEMA MÎREKT.	Şikriyê Bedlîsî	XV-XVI
2		Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî	XVII
3		Selîmiyê Hîzanî	XVIII
4		Harîsê Bedlîsî	
5		Mela Xelîlê Sêrtî	XVIII-XIX
6	SERDEMA PIŞTÎ MÎREKT.	Xelîfe Selîm	XIX
7		Şêx Ebdulêzîzê Bedlîsî	
8		Mela Ebdulkerîmê Tetwanî	XX
9		Mela Ehmedê Xelatî	
10		Mela Îmadedîn Reşpojan	
11		Ebdulahê Qursincî	
12		Mela Nûrulahê Godîşkî	
13		Giyasettin Emre	
14		Mela Îbrahîmê Tetwanî	
15		Mela Nîzamedîn Yakîşîk	BERHEYAT
16		Seydayê Xelatî	
17	Mela Mudrikê Godîşkî		

*Tablo: Li Gorî Seyra Tarîxî Helbestvanên Herêma Bedlîsê.*

Ji vê profîla ku di tabloyê de hatiye nîşandan tê fêmkirin ku di serdema mîrektiyan de 5, di serdema piştî mîrektiyan de jî 12 helbestvanên klasîk ên Bedlîsî hene. Ji yên serdema piştî mîrektiyan 2 heb di êwra dawîya Osmaniyan, 10 heb jî di êwra Komara Tirkîyeyê de ne. Ji yên êwra Komara Tirkîyeyê 6 heb mirî, 4 heb jî li ber qeydê heyatê ne.

Digel ku maweya serdema mîrektiyan ji ya serdema piştî mîrektiyan dirêjtir e jî, helbestvanên Bedlîsî yên serdema mîrektiyan ji aliyê jimara xwe ve ji yên serdema piştî mîrektiyan hindiktir in. Her ku hatiye jimara helbestvanan zêdetir

bûye. Ev jî nîşan dide medreseyên serdema piştî mîrektiyên gelekî xwedî bandor in.

Lêbelê divê ev jî bê gotin ku ji aliyê kevinahî û qidemê ve girîngiya helbestvanên serdema mîrektiyên ji yê serdema piştî mîrektiyên zêdetir e. Lewra destpêkirina edebiyata kurdî, hem li herêma Bedlîsê, hem jî li herêman din bi wan çê bûye. Bi rastî jî edebiyata kurdiya kurmancî, di serdema mîrektiyên de di sedsala XVIem de bi peymanên kurd û Osmanîyan ketiye qonaxeke nû û cara pêşî di vê qonaxê de helbestvanên ku bi kurdiya kurmancî berhem nivîsîne derketine.<sup>44</sup> Ji ber ku lehengê sereke yê vê peymanê Îdrîsê Bedlîsî xelkê Bedlîsê ye, di destpêkirina vê qonaxê de cihekî taybet ê bajarê Bedlîsê heye.

Li bajarê Bedlîsê ji sedsala XVem heta bi dawiya sedsala XIXem desthilatdariya malbata Şerefxaniyan dom kiribû. Di maweya vê desthilatdariyê de bi tevahî û bi taybetî di dawiya sedsala XVem û destpêka sedsala XVIem de ji bajarê Bedlîsê gelek rewşenbîrên kurd derketine. Lê di nav van rewşenbîran de edebiyata kurdî zêde ne di rewacê de bû. Rewşenbîrên kurdan ên wê demê, bi piranî bi zimanên serdest ên dema xwe farisî û tirkî nivîsîne. Wek nimûne Îdrîsê Bedlîsî (w. 926/1520) berhemên xwe yê bi navê *Heşt Behîşt* (Jînenîgariya Heşt Siltanên Osmanîyan) û *Selîmname* (Jînenîgariya Siltan Selîmê Osmanî) bi farisî nivîsîne. Herweha kesayetê din ê Bedlîsî Şikriyê Bedlîsî (w. 1523) jî berhema xwe ya bi navê *Selîmnameyê* bi tirkî nivîsîye. Sebebê vê yekê jî ew e ku di vê serdemê de di qadên fermî de zimanên farisî û tirkî di rewacê de ne. Dîgel vê jî helbestên wî di destê me de tune bin jî, di çarçoveya zanînen berdest de, kevintirîn kesê ku bi kurdiya kurmancî helbest nivîsîye Şikriyê Bedlîsî (w.1523) ye û ew jî xelkê Bedlîsê ye.

Piştî, di sedsala XVII de li herêma Xelatê Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî, di sedsala XVIII de li mîrektiya Hîzanê Selîmiyê Hîzanî û Sewadî û di sedsala XVIII-XIXan de jî Mela Xelîlê Sêrtî xuya dikin. Ev jî nîşan dide ku sedsala XVIII-XIXan ku beramberî qonaxa dawî ya mîrektiyên tê ji qonaxa berî xwe dewlemendtir e.

Piştî ku di nîveka sedsala XIXem de valahiya siyasî û sosyal a ku bi dawîlêhatina mîrektiyên kurdan çê bû, ji aliyê şêxên Neqşebendî-Xalidî ve hat dagirtin û jimara kesên ku ji van medrese/dergahan der çûn zêde bû, paralelî vê di jimara helbestvanên kurdî de jî zêdebûnek çêbû. Loma jî helbestvanên ku di vê serdemê de di maweya sed û pêncî salî de derketine meydanê du-sê caran ji yê ku di serdema mîrektiyên de di maweya sê sedsalan de derketine meydanê zêdetir in. Heri dawî divê ev jî bê gotin ku di roja îroyîn de jî li herêma Bedlîsê helbestvanên berheyat hene (4 heb) û rêjeya wan jî ne hindik e.

<sup>44</sup> Ji bo edebiyata kurdî ya serdema mîrektiyên bnr. Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar (Çap 2), Stenbol 2013, r. 183-359.

## B. KOÇ

Carinan şertên jiyane berê mirov ji deverekê didin devereke din û mirovekî ku li deverekê hatibe dinyayê piştî demekê koçî devereke din dike, li wir bi cih dibe û li wir wefat jî dike. Ev yek jî di nisbetkirina wî mirovî de arîşeyekê jî bi xwe re tîne. Gelo di rewşeke weha de mirov dê bi bal kîjan deverê ve bê nisbetkirin? Di kevneşopiyên ilmî yên mislimanan de ev arîşe bi nisbetkirina mirov bi bal her du deveran ve hatiye çareserkirin. Li gor vê kesê ku li deverekê hatibe dinyayê û li wir mezin bûbe, ji xwe xelkê wê deverê ye. Heman kes eger koçî devereke din bike, li wir bi cih bibe û li wir wefat bike dibe xelkê wê deverê jî. Bi vî awayî ew kes xelkê her du deveran tê hesibandin. Bo nimûne eger kesek li Cizîrê hatibe dinyayê û koçî Mûsilê kiribe, ji bo wî kesî “el-Cezerî summe el-Mûsilî (Cizîrî piştî Mûsilî)” tê gotin.

Li gor vê pîvanê eger mijara mirov komkirina kesayetên deverekê be, hem kesên ku li wê deverê hatine dinyayê (piştî koçî cihekî din jî kiribin), hem jî yên ku koçî wir kirine û li wir bi cih bûne (li cihekî din hatibin dinê jî) divê wek kesayetên wê deverê bîn qebûlkirin. Me jî di vê gotarê de di nisbetkirina helbestvanan bi bal Bedlîsê yan jî qezayên wê ve ev rêbaz şopandin. Dema em di vê çarçoveyê de li helbestvanên herêma Bedlîsê dinêrin encameke weha derdikeve holê. Helbestvanên ku li devera Bedlîsê hatine dinyayê û koçî devereke din kirine du heb in: Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî û Mela Xelîlê Sêrtî. Şêx Şemsedîn li Xelatê hatiye dinê û koçî devera Behdînan kiriye, Mela Xelîl jî li Hîzanê hatiye dinê û koçî bajrê Sêrtê kiriye. Helbestvanên ku ji devereke din koçî devera Bedlîsê kirine jî du heb in: Mela Nûrullahê Godîşkî û Mela Ehmedê Xelatî. Mela Nûrullah li devera Mûşê hatiye dinyayê, lêbelê perwerdeya xwe li devera Bedlîsî kiriye û li wir bi cih bûye. Mela Ehmed jî li gundê Soktilî (Sogutlu) yê Bulanixa Mûşê hatiye dinyayê, lêbelê koçî Xelatê kiriye. Ji bilî van çar helbestvanan hemû helbestvanên din jiyana xwe bi tevahî li herêma Bedlîsê bihurandine.

## C. DEVER

Ji ber ku di vê nivîsê de helbestvanên klasîk ên herêma Bedlîsê li gorî serdema mîrektiyan û serdema piştî mîrektiyan hatin dabeşkirin, paralelî vê dabeşkirinê deverên helbestvanan jî li ser du beşan dê bîn dabeşkirin. Lewra parvekirina îdarî ya serdema mîrektiyan û serdema piştî mîrektiyan ne wek hev in. Çawa ku tê zanîn îro berevajiyê parvekirineke îdarî ya li gorî sistema mîrektiyan, parvekirineke li gorî wîlayet û navçeyan jî heye. Loma jî deverên helbestvanên klasîk ên Bedlîsî divê di çarçoveya mîrektiyan herêma Bedlîsê û navçeyên wîlayeta Bedlîsê de li ser du beşan bîn dabeşkirin.

**1. Li Gorî Mîrektiyan:** Mîrektiyan kurdan bi awayekî giştî ji sedsala XIIIem heta bi nîveka sedsala XIXem li ser piyan mane. Di serdema mîrektiyan de li nav sînoren wîlayeta Bedlîsê, du mîrektî derketine pêş û di van mîrektiyan de nimûneyên edebiyata kurdî hatine dayîn. Ew jî mîrektiyan Bedlîsê û Hîzanê ne.

Eger li gorî van mîrektiyan li dabeşkirina helbestvanên Bedlîsî bê nêrîn encameke weha derdive holê:

**Mîrektiya Bedlîsê:** Şikriyê Bedlîsî (w.1523), Harisê Bedlîsî (1775)

**Mîrektiya Hîzanê:** Selîmiyê Hîzanî (Sedsal XVIII), Mela Xelîlê Sêrtî (1843)

Çawa ku tê dîtin di serdema mîrektiyan de, ji mîrektiya Bedlîsê du helbestvan û ji ya Hîzanê jî du helbestvan derketine. Ev jî nîşan dide ku her du mîrektiyan jî ji bo derketina berhemên edebî yê kurdî şert û mercên gunçaw di xwe de hewandine. Loma jî her du mîrektî di tarîxa edebiyata kurdî de xwedî roleke girîng in. Ji aliyekî din ve dikare bê gotin ku di sînore wîlayeta Bedlîsê ya îroyîn de helbestvanên ku di bin desthilatdariya mîrektiyan de derketine çar heb in. Eger mirov Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî jî hesab bike ev jimar dibe pênc. Ev encam jî ji bo wîlayetekê asteke ne hindik e.

Herçiqas Şêx Şemsedîn ne di bin sîwana van her du mîrektiyan de jî be, ew dîsa helbestvanê wê serdemê ye. Lêbelê ew di du xalan de ji yê din vediqete: 1. Ew xelkê Xelatê ye û li Xelatê mîrektiyeke kurdan ava nebûye. 2. Ew li Xelatê nemaye, di serdema mîrektiya Amêdiyê de koçî wir kiriye.

**2. Li Gorî Navçeyan:** Dema em helbestvanên Bedlîsî li gorî sîstema îroyîn a wîlayet û navçeyan dabeş dikin listeyeke weha derdikeve holê:

**Tetwan:** Mela Ebdulkerîmê Tetwanî, Mela Nûrulahê Godîşkî, Mela Îbrahîmê Tetwanî, Mela Nîzamedîn Yakîşîk, Mela Mudrikê Godîşkî (5 helbestvan).

**Bedlîs:** Şikriyê Bedlîsî, Sewadî, Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî, Mela Îmadedîn Reşpojan (4 helbestvan).

**Hîzan:** Selîmiyê Hîzanî, Mela Xelîlê Sêrtî, Xelîfe Selîm, Ebdulahê Qursincî (3 helbestvan).

**Xelat:** Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî, Mela Ehmedê Xelatî, Seydayê Xelatî (3 helbestvan).

**Mutkî:** Gıyasettin Emre.

Çawa ku tê dîtin ji Tetwanê 5 helbestvan, ji navenda Bedlîsê 4 helbestvan, ji her yek ji Hîzan û Xelatê 3 helbestvan û ji Mutkî jî helbestvanek derketiye. Ji Nûrşîn û Adilcewazê helbestvan derketine. Li vir divê bal bê kişandin ku Tetwan di serdema piştî mîrektiyan de bûye navendeke nû ji wir gelek zanayên medreseyan û nûnerên edebiyata kurdiya kurmancî derketine.

## **D. MEHSÛLÊN EDEBÎ**

Eger em di çarçoveya berheman de li mehsûlên edebî yê ku ji aliyê helbestvanên Bedlîsî ve hatine dayîn binêrin listeyeke weha derdikeve holê:

**Şikriyê Bedlîsî:** Negihîştîye.

**Şêx Şemsedînê Xelatî:** Dîwan.

**Selîmiyê Hîzanî:** Yûsif û Zelîxa.

**Sewadî:** Leyla û Mecnûn, Yûsif û Zelîxa.

**Mela Xelîlê Sêrtî:** Nehcu'l-Enam, Menzûmeya Tecwîdê.

**Xelfe Selîm:** Dîwançe.

**Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî:** Dîwan.

**Mela Ebdulkerîmê Tetwanî:** Dîwan.

**Mela Ehmedê Xelatî:** Dîwan.

**Mela Îmadedîn Reşpojan:** 3 Dîwan.

**Ebdulahê Qursincî:** Dîwan.

**Mela Nûrulahê Godîşkî:** Dîwan, el-Hemail fi'ş-Şemail, el-Cewahiru'r Reşadiye, es-Sebaik fi'l-Menasik, Çenta Yetîman, Kufru'l-Kebair.

**Gıyasettin Emre:** Rênasî.

**Mela Îbrahîmê Tetwanî:** Pirtûka Şîretên Zarokan.

**Mela Nîzamedîn Yakîşîk:** Dîwan.

**Seydayê Xelatî:** Xelat, Civat, Dara Azadî, Evîn û Axîn, Rewşen.

**Mela Mudrikê Godîşkî:** Dîwan.

Çawa ku tê dîtin ji aliyê 16 helbestvanan ve 31 berhemên edebî yên kurdî hatine dayîn. Qewareyên van berheman curbicur in. Hinek çapkîrî, hinek jî ne çapkîrî ne. Herweha helbestên Şikriyê Bedlîsî jî negihîştine roja me.

Bêguman ji bo danasîna van mehsûlên edebî û tesbîtkirina terz, şêwe û meylên edebî yên van helbestvanan pêwîstî bi vekolînên hûr, kûr û ciyawaz heye. Lê dîsa jî bi nêrîneke gelemperî, warên ku ev mehsûlên edebî tê de cih digirin weha dikarin bên rêzkirin: Xezel û qesîde, mesnewiyên evîndariyê, edebiyata tesewîfî, edebiyata neteweyî, edebiyata dînî û şêwêyê sade dikare bê nîsbetkirin. Bi gotîneke din her yek ji van helbestvanan ji bo warek ji van warên edebî dikare bê nisbetkirin. Divê ev jî bê gotin ku aîdiyeta helbestvanekî ji bo çendîn waran jî pêkan e.

Dema em di vê çarçoveyê de lê dinêrin, em dikarin bibêjin ku piraniya helbestvanên Bedlîsî yên wek Şêx Şemsedînê Xelatî, Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî, Mela Ehmedê Xelatî, Mela Îmadedîn Reşpojan, Mela Nûrulahê Godîşkî, Ebdulahê Qursincî, Gıyasettin Emre, Mela Mudrikê Godîşkî, Mela Nîzamedîn Yakîşîk bi nivîsîna dîwan yan dîwançeyan wek nûnerên xezel û qesîdeyan derdikevin pêş.

Selîmiyê Hîzanî bi *Yûsif û Zelîxaya* xwe, Sewadî jî bi *Leyla û Mecnûn* û *Yûsif û Zelîxaya* xwe, Mela Nûrulahê Godîşkî jî bi *el-Hemail fi'ş-Şemail* û *el-Cewahiru'r-Reşadiye* wek nûnerên mesnewiyên dirêj derdikevin pêş.

Şêx Şemsedînê Xelatî, Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî, Mela Nûrulahê Godîşkî û Mela Ehmedê Xelatî di mijarên tesewîfî de helbest nivîsîne. Ji van Şêx Şemsedîn di çarçoveya erkanên terîqeta Xelwetiye û hizra wehdetu'l-wicûdê; yên din jî di

çarçoveya peyrewiya şêxên Neqşebendî/Xalidî yên Xeyda, Nûrşîn û Oxînê û nivîsîna medhiye û mersiyeyan derheqê şêxên van navendan de hizra tesewîfî temsîl dikin.

Selîmiyê Hîzanî, Mela Îmadedîn Reşpojan, Seydayê Xelatî, Mela Mudrikê Godîşkî, Mela Îbrahîmê Tetwanî û Mela Nîzamedîn Yakîşîk wek nûnerên edebiyata neteweyî dikarin bên hesibandin.

Mela Xelîlê Sêrtî û Mela Nûrulahê Godîşkî, wek nûnerên edebiyata dînî derdikevin pêş. Mela Xelîl bi *Nehcu'l-Enama* xwe berhemeke orjînal pexşî edebiyata kurdî ya dînî kiriye. Lewra wî di vê berhemê de cara pêşî bi zimanê kurdî cih daye mijarên eqaid, kelam, tesewuf û exlaqê. Ev berhema Mela Xelîl di piraniya medrseyên Kurdistanê de wek pirtûkeke dersê hatiye xwendin. Heçî Mela Nûrulah e wî jî di mijarên dînî yên wek mî'rac (*el-Hemail fi'ş-Şemail*), siyera cenabê pêxember (*el-Cewahiru'r-Reşadiye*), hec (*es-Sebaik fi'l-Menasik*) û eqîdeyê (*Kufru'l-Kebair*) de berhemên girîng dane. Mela Nûrulah di mijarên spesîfîk ên ku berê nimûneyên wan nehatine dayîn de berhemên serbixwe û mezin pêşkêş kirine.

Ebdulahê Qursincî û Mela Îbrahîmê Tetwanî bi zimanê gel helbest nivîsîne. Qursincî di warê edebiyata mîzahê de, Mela Îbrahîm jî di warê edebiyata hikemî de nimûneyên girîng dane.

Bi taybetî Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî, Mela Îmadedîn Reşpojan û Mela Ehmedê Xelatî ji bilî kurdî bi erebî, farisî û tirkî jî helbest nivîsîne. Berhemên wan jî xebatên edebiyata berawirdî re dikarin bibin mijar.

Di nav helbestvanên Bedlîsî de Şêx Şemsedînê Xelatî, Selîmiyê Hîzanî, Sewadî, Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî, Mela Nûrulahê Godîşkî, Mela Îmadedîn Reşpojan, Mela Ehmedê Xelatî û Mela Mudrikê Godîşkî ji aliyê hêza edebî ve wek helbestvanên herî girîng dikarin bên hesibandin.

## ENCAM

Di vê gotarê de ku ji perspektîfeke herêmi, ji bo helbestvanên klasîk ên herêma Bedlîsê hatiye terxankirin, 17 helbestvan hatine tesbîtkirin ku ew jî ev in: (Bi awayekî alfabetîk) Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî, Şikriyê Bedlîsî, Gıyasettin Emre, Mela Mudrikê Godîşkî, Mela Nûrulahê Godîşkî, Selîmiyê Hîzanî, Mela Xelîlê Sêrtî, Mela Îmadedîn Reşpojan, Ebdulahê Qursincî, Xelîfe Selîm, Sewadî, Mela Ebdulkerîmê Tetwanî, Mela Îbrahîmê Tetwanî, Mela Ehmedê Xelatî, Seydayê Xelatî, Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî, Mela Nîzamedîn (Yakîşîk).

Ji van helbestvanan 5 heb di serdema mîrektiyan de, 12 heb jî di serdema piştî mîrektiyan de jiyane. Ji yên serdema piştî mîrektiyan 2 heb di êwra dawiya Osmaniyan, 10 heb jî di êwra Komara Tirkîyeyê de ne. Ji yên êwra Komara Tirkîyeyê 6 heb mirî, 4 heb jî berheyat in. Xaleke giring e ku di roja îroyîn de jî li herêma Bedlîsî helbestvanên serkeftî hene.



Edebiyata kurdî ya klasîk, di sed sala XVIem de bi peymanan kurd û Osmaniyan ketiye qonaxêke nû û di vê qonaxê de gelekî pêş ketiye. Ji ber ku lehengê sereke yê vê peymanê Îdrîsê Bedlîsê ji Bedlîsê ye, di destpêkirina vê qonaxê de cihekî taybet ê Bedlîsê heye. Herçi qas helbestên wî yê kurdî negihîştine me jî, hê di sed sala XVIem de Şikriyê Bedlîsî bi kurdî helbest nivîsandine. Di sed sala XVII de Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî, di sed sala XVIIIem de Selîmiyê Hîzanî, Sewadî û Mela Xelîlê Sêrtî helbestvanên girîng ên herêma Bedlîsê ne. Piştî ku di nêveka sed sala XIXem de, bi dawîlêhatina mîrektiyên kurdan, valahiya siyasî û sosyal ji aliyê şêxên Neqşebendî-Xalidî ve hat dagirtin, li herêma Bedlîsê jî medrese û dergah zêdetir bûn û di encamê de jimara helbestvanan jî zêdetir bûye.

Ji aliyê deveran ve di serdema mîrektiyên Bedlîsê de ji navenda Bedlîsê du helbestvan (Şikriyê Bedlîsî û Harîsê Bedlîsî) û ji Hîzanê jî du helbestvan (Selîmiyê Hîzanî û Mela Xelîlê Sêrtî) derketine. Eger mirov Şêx Şemsedînê Qutbê Xelatî jî hesab bike ev jimar dibe pênc. Ji destpêkê heta îro bi giştî ji Tetwanê 5, ji navenda Bedlîsê 4, ji Hîzanê 4, Xelatê 3 û ji Mutkî jî helbestvanek derketiye. Tetwan di serdema piştî mîrektiyên de bûye navendeke nû. Herweha Xelat, ku piştî koça Şêx Şemsedîn bêdeng mabû, di roja îroyîn de ji bo helbestvanên klasîk bûye navendek.

Ji aliyê van helbestvanên Bedlîsî ve 31 berhemên edebî yê kurdî ku qewareyên wan curbicur in û hin çapkirî, hin jî destxet in, hatine dayîn. Van helbestvanan di van berhemên de di warên wek xezel û qesîde, mesnewiyên evîndariyê, edebiyata tesewîfî, edebiyata neteweyî, edebiyata dînî û şewwêyê sade de hunerên xwe pêşkêş kirine.

## ÇAVKANÎ

- Adak**, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar (Çap 2), Stenbol 2013.
- Adak**, Abdurrahman, Ali Emîrî Gözüyle Diyarbakırlı Şairler, Kent Yay, İst. 2011.
- Adak**, Abdurrahman, “Şükri-i Bitlîsî”, *Uluslararası Tatvan ve Çevresi Sempozyumu*, weş. Beyan., İst. 2008.
- Adak**, Abdurrahman, “Mela Xelîlê Sêrtî: Helbestvanê bi Mexlesa “Şewqî” û Helbestên wî yê Kurmancî”, Mardin Artuklu Üniv. Mukaddime Dergisi, j. I, s. 2010.
- Adak**, Abdurrahman, “Li Cizîrê Muhîteke Edebî: Dergahê Şêx Seyda û Rola wî di Edebiyata Kurdî de”, *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre*, (Ed. M. Nesim Doru), Mardin Artuklu Üniv. Yay. İst. 2012.
- Âmidî**, Zeynelâbidîn, *Medhiyye û Mersiyye Der Heqê Seydâyê Bedî’uzzemân*, Diyarbakır Söz Yay., Diyarbakır 2004.



- Bedlîsî**, Harisê, *Leyla û Mecnûn*, Amd. Tehsin Î. Doski, Spîrêz, Dihok 2004.
- Bingöl**, Nevzat, Bitlis İsyani ve Şeyh Selim, weş. Do, İstanbul 2013.
- Birîfkanî**, Şêx Nûredînê, *Dîwan Zibanê Kurdî*, Amd. Zahid Birîfkanî weş. Aras, Erbil 2002.
- Cegerxwîn**, “Hozan û Şa’irên Kurd”, *Sewra Azadî*, Avesta, Stenbol 2002.
- Doskî**, Mihemed Emîn, *Lewami’u’ş-Şehib*, weş. Spîrêz, Dihok 2007.
- Doskî**, Tehsîn Î., *Harisê Bedlîsî Leyla û Mecnûn*, weş. Spîrêz, Hewlêr 2004.
- Doskî**, Tehsîn Î., *Yûsif û Zuleyxa-Vehandîna Selîmê Hîzanî*, Spîrêz, Dihok 2004.
- Doskî**, ‘E. N. S., El-Molla Xelîl es-Sêrtî we Menhecuhu fî Îsbati’l-‘Eqaidi’l-Îslamiyye, weş. Spîrêz, Erbil 2007.
- Ergül**, Selim Temo, “Profîla Helbesta Klasîk li Bakur: Nebûna Navendê û EncamênWê”, *Komele Witarî Yekemîn Kory Nêwneteweyî Edebî Kurdî*, Zanistgay Kurdistan, Sine 2011.
- Ergün**, Zülküf, *Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan*, Nûbihar, Stenbol 2014.
- Geverî**, Ayhan, *Yûsif û Zuleyxa-Selîmiyê Hîzanî*, weş. Nûbihar, Stenbol 2013.
- Huşyar**, Cewdet, *Zexaîru’t-Turasi’l-Kurdî fî Xezainî Petersborg*, <http://brob.org/old/bohoth/bohoth/bohoth026.htm>, 29.10.2013.
- İnalçık**, Halil, *Şair ve Patron*, Doğu Batı Yayınları, Çapa Sêyem, Ankara, 2010.
- İsen**, Mustafa, *Künhü’l-Ahbar’ın Tezkire Kısım*, weş. AKM, Ankara 1994.
- İpekten**, Haluk, *Divan Edebiyatında Edebî Muhitler*, MEB Yay., İst. 1996.
- İpekten**, H.(M. İsen, F. Kılıç, İ. H. Aksoyak, A. Eydurani), *Şair Tezkireleri*, Grafiker. Ankara 2002
- Jahany**, Parviz, *Leyla û Mecnûna Sewadî (Metin, Lêkolîn, Şîrove)*, Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên, Mêrdîn 2016.
- Kurdo**, Qanatê, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Öz-ge Ankara 1992.
- Mela Fudayl**, *Tercemetu Hali Ceddina’l-A’lâ Mela Halil es-Si’rdî*, Nusxeya fotokopî ya destnivîsê, Pirtûkxaneyê A. Adak a taybet.
- Mizuri**, Abdulrehman, “Leyla û Mecnûna Harisê Bitlîsî”, wer. Alîxan Aras, <http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-30477610.html>. (15.08.2014)
- Oxîni**, M. Asim, *Birketu’l-Kelîmat*, Nusxeya fotokopî ya destnivîsê, Pirtûkxaneyê A. Adak a taybet.
- Pakiş**, Ömer, “Molla Halil Siirdî”, DIA, İstanbul 2005.
- Pala**, İskender, *Ansiklopedik Dîwan Şiiri Sözlüğü*, L&M,İst. 2003,
- Sağniç**, Feqî Huseyn, *Tarîxa Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2002.

**Selefi**, Hemdî Ebdulmecîd; Doskî, Tehsîn İbrahîm, *Mu'cemu's-Şu'eraî'l-Kurd*, Spirêz, Erbil 2008.

**Tahir**, Bursalı Mehmet, Osmanlı Müellifleri, Matbaa-i Amire, İstanbul 1334.

**Tek**, Ayhan, "Li Dor Behsa Patronajê *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî", *Mukaddime*, j. 3, r. 41-60, Mardin 2010.

**Temo**, Selim, *Kürt Şiiri Antolojisi*, 2 c., weş. Agora, İstanbul 2007.

**Timurtaş**, Abdulhadi, "Haris el-Bitlisî ve Leyla û Mecnûn Adlı Manzûmesi" I. *Uluslar arası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri*, Beyan Yay., İst. 2008.

**Xelatî**, Mela Ehmedê, *Dîwan Bîra Kul û Derda*, (bê cih û tarîx).

**Xeznedar**, Marûf, *Mêjuwî Edebî Kurdî*, (I-VIII), weş. Aras, Hewlêr 2010.

**Yılmaz**, Serdar, Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn 2013.

#### **Hevpeyvîn:**

Mela Wefayê kurê Mela Nûrullahê Godişkî, 07.07.2014, Tetwan.

Mela Mudrikê Godişkî, 05.07.2014, Tetwan.

Azad Orak, 06.07.2014.

Mela Seyîdxan Özdemir, 12.07.2014, Tetwan.

Mela Îmadedîn Reşpojan, 10.07.2014, Hevdîtina bi riya telefonê.

Mela İbrahîmê Tetwanî, 06.07.2014.

Mela Ehmedê Xelatî, 15.07.2014.

Mela Nîzamedîn Yakışık, 17.07.2014 .

Nevzat Bingöl, 11.07.2014, Hevdîtina bi riya telefonê.



## BERAWIRDKIRINA KURMANCÎ Û ZAZAKÎ JI ALIYÊ FELSEFEYA ZIMÊN VE

Îbrahim BÎNGÖL \*

### KURTE

Ev gotar ji aliyê felsefeya zimên ve li ser berawirdkirina kurmancî û zazakî ye. Heta niha pir caran kurmancî û zazakî ji aliyê peyv, hevok, gramer û hwd. ve hatiye berawirdkirin lê di vî warî de ji aliyê felsefeya zimên ve zêde xebat nehatiye kirin. Armanca vê gotarê ew e ku bala xwendevanan bixşîne ser vî alî. Her çiqas carinan em ketin li warê gramerê jî armanca me ya sereke ew nebû. Me xwest ku têkilîya zimên û çand çi ye, kurmanc û zaza çawa difikirin hwd. wana binîn ber çavan. Ji ber vê yekê minakên ku hatine dayîn piranî li ser rewşên gerdûnî ne, yanê yên ku di her zimanî û her çandê de hene.

**Bêjeyên Sereke:** Kurmancî, Zazakî, Felsefeya Zimên

### ABSTRACT

#### *"Comparison of Kurmanci and Zazaki in Terms of Philosophy of Language"*

This article deals with the subject of the comparison of Kurmanci and Zazaki in terms of philosophy of language. So far the comparison of Kurmanci and Zazaki have been performed mostly in terms of words, sentences and grammar etc. however few or no studies on the comparison in respect of philosophy of language have been performed. This article aims that the attention of the reader turn to this area. This article also aims to show how Kurmancs and Zazas think and behave in some universal situations.

**Key Words:** Kurmanci, Zazaki, Philosophy of Language

### DESTPÊK

Di van salên dawî de gelek nîqaş hene li ser mijara "gelo zazakî zimanekî serbixwe ye yan jî lehçeyeke kurdî ye?" Yê ku dixwazin zazakî wek zimanekî serbixwe nîşan bidin hema di navbera zazakî û kurmancî de çiqas cudatî hene, çiqas peyvên ji hevûdu dûr û cuda hene rêz dikin û tînîn ber çavan. Paşê jî dibêjin "zazakî çawa kurdî ye?" Her wiha yê ku dixwazin zazakî wek lehçeyeke kurdî nîşan bidin, ew jî di navbera zazakî û kurmancî de çiqas wekhevî hene, çiqas peyvên nêzîkî hev û hevpar hene rêz dikin û tînîn ber çavan. Paşê jî dibêjin "ma, zazakî ne lehçeyeke kurdî ye?" Bi ya min her du

\* Xwendekarê doktorayê li Şaxa Makezanista Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Xaxoyê.  
ibrahimbingol@hotmail.com

rêbaz jî kê m in û têrê nakin. Yê n ku ji van du rêbazan yekê bi kar tînin di têtîhîştîne de hîlbîjêrî (selective perception) dikin. Ew, keresteyên zimên li gorî armanca xwe berhev dikin û bi kar tînin. Çawa em nikarin sêveke sor û sêveke kesk bigirin û taybetmendiya rengên wan ên cuda esas bigirin û îdîa bikin, bibêjin: “yek sêv e, yek jî firingî ye”. Dîsa çawa ku em nikarin sêveke sor û firingîyeke sor bigirin û taybetmendiya rengên wan ên heman esas bigirin û îdîa bikin, bibêjin: “her du jî sêv in” yan jî “her du jî firingî ne”. Bi vî awayî em nikarin taybetmendiya zimên ên wiha bigirin û biryara xwe bidin û bibêjin: “ew zimanekî serbixwe ye yan jî lehçeyek e”. Jixwe îro di tayînkirina lehçe û zimanan de di nav zimannasan de pîvanekê rêkûpêk tune ye. Mesele gelek caran siyasî ye.

Em dinyayê, derdora xwe û kaînatê yekcar nikarin fehm bikin. Heke wiha bûbûya, dê mejîyê me têtî biçûya. Em pêşî tiştan parçe dikin, kategorîze dikin û nav didin wan û bi vî awayî fehm dikin. Her ziman jî li gorî xwe vê prosesê dişopîne. Ziman rasterast girêdayî jîyanê ye, girêdayî çandê ye. Di jîyanê de, di çandê de çi hebe di zimên de jî heye, çi tune be, di zimên de jî tune ye. Dema ku jîyan û çand guherî, ziman jî diguhere. Mesela di zimanê eskîmoyan de bi qasî çil navê berfê hene lê di cîhê ku qet berf nebare de wek di welatên Ereban de jîyana xelkê de navê berfê yan kê m têtî gotin yan jî qet nayê gotin<sup>1</sup>.

Li gorî felsefenasê tirk Nermi Uygur, “fikirandina mirovan tu carî ji derveyê zimên çê nabe. Fikirandin di zimên de, bi saya zimên pêk têtî. Fikirandin, yanê fikrandina tam, fazîleteke girêdayî zimên e.”<sup>2</sup> Fîlozof û zimannasê alman Wilhelm von Humbolt dibêje: “Di her zimanekî de lînêrîneke taybet heye”<sup>3</sup>. Niha em dikarin bipirsin gelo kurmanc û zaza çawa difikirin û derdora xwe çawa fehm dikin, tiştan çawa parçe dikin, kategorîze dikin û nav didin wan? Gelo di nav kurmanc û zazayan de di fehmkirina dinyayê de, di fikirînê de cudatî û wekhevîti çî ne? Lêker û cinavan yanê keresteyên zimên ên bîngêhîn çawa bi kar tînin? Gelo Kurmanc û zaza çawa biker û bireserê dinirxînin, wan çawa bi kar tînin?

Em ê niha di vî warî de çend nimûneyan bidin.

## PIRSÎNA HAL Û XATIR

Pirsîna hal û xatir hema hema di her zimanê de heye. Diyar e ev yek bi qasî dîroka mirovahîyê kevn e. Di hin zimanan de mesela di zimanê îngîlîzî de ev proses kin e, di hin zimanan de, mesela di kurmancî û zazakî de ev proses dirêj

<sup>1</sup> Nesrin Bayraktar, Dil Bilimi, Paradigma Nobel Yayın Dağıtım, 2. Baskı Ağustos 2006.

<sup>2</sup> Nermi Uygur, Kültür Kuramı, Remzi Kitabevi Yayınları, İstanbul 1984, s. 45

<sup>3</sup> Wilhem von Humbolt, Gesammelte Schriften, VII/I, s. 190, veguhêzer Doğan Aksan, Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim, TDK Yayınları, Ankara, 2009, s. 69.

e. Ewqas dirêj e ku pir caran mirov êdi aciz dibe. Kurmanc û Zaza her tiştî dipirsin. Pir caran dubare jî dikin. Lê mantiq yek e.<sup>4</sup>

**Mînak:**

Kurmanc dibêjin: “tu bi xêr hatî”.

Zaza dibêjin: “ti bi xêr ameyî/a”.

Kurmanc dibêjin: “di **nava** xêrê de bî”.

Zaza dibêjin: “xêr **mîyan** de bî”.

Ev hevokên li jor peyv bi peyv bi tirkî tê manaya “hayırla geldin” û “hayırlar içinde olasin”. “Xêr hatin” gotin, di çanda kurmanc û zazayan de pir fonksiyonel û girîng e. Heke yek ji yekî re nebêje “tu bi xêr hatî” pir caran dibe pirsgerêk. Lê belê di hin çandan de wek di îngîlîzî û fransî, almanî de dema ku mirov bibêje “welcome” yan “bienvenue” yan jî “willkommen” pir caran bersiva wan yan “thank you” û “merci” û “danke” yanê “spas dikim” yan jî tiştek naye gotin.

Kurmanc û Zaza dema ku keyfxweşiya xwe îfade dikin:

Kurmanc dibêjin: “ser serê min, ser çavên min”.

Zaza dibêjin: “ser û çimanê mi ser”.

Kurmanc dibêjin: “ser û çavên te neêşin”.

Zaza dibêjin: “ser û çimê to weş be”.

Ji bersivan jî xuya dike ku Kurmanc û Zaza dema ku dibêjin “ser û çavên te neêşin” an jî “ser û çimê to weş be” tu dibêjî qey bi rastî wan piyê xwe pê ser û çavan kirin û naxwazin ku bila ser û çavên yekî biêşin.

Di hemû ziman û çandan de hişê mirov diçe:

Kurmanc dibêjin: “Hişê min diçe”.

Zaza dibêjin: “Hêşê min şono”.

Tirk dibêjin: “Başım dönüyor”. Yanê peyv bi peyv “Serê min dizivire”,

Îngîlîz dibêjin: “I feel dizzy”. Yanê peyv bi peyv “Ez zivirandinê hîs dikim”.

Fransîz dibêjin: “J'ai le vertige”. Yanê peyv bi peyv “zivirandina serê min heye”.<sup>5</sup>

Wekî ku diyar dibe kurmanc û zaza dema ku hişê wan diçe û tê, ji serê wan eqle wan diçe û tê.

Di hemû ziman û çandan demirov dicemide:

Kurmanc dibêjin: “Ez dicemidim”.

<sup>4</sup> Ji bo gotareke balkêş bnr. Michael Chyet, Xwedîtiya Hevbeş (Shared Ownership) û Zargotina Kurdî, Ramazan Pertew, Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Avesta, 2015, dinav de.

<sup>5</sup> Doğan Aksan, Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim, TDK Yayınları, Ankara, 2009, s. 69.

Zaza dibêjin: “Ez cemidîna”.

Tirk dibêjin: “Üşüyorum”.

Îngîlîz dibêjin: “I am cold” an jî “I feel cold”. Yanê peyv bi peyv “Ez sar im” an jî “Ez sermayê hîs dikim”.

Fransîz dibêjin: “J'ai froid”. Yanê peyv bi peyv “Ez xwediye sermayê me”

Alman dibêjin: “Mir ist es kalt”. Yanê peyv bi peyv “ew ji min re sar e”.

Balkêş e ku di kurmancî û zazakî de lêkera “cemidîn” û “cemidîyayene” hem ji bo “üşümeke” hem jî ji bo “donmak”a tirkî tê bikaranîn. Dema ku em bibêjin “Keçik dicemide/Keyneke cemidîna” bi tirkî tê manaya “Kız üşüyor” an jî bi îngîlîzî tê manaya “the girl is cold”. Lê belê dema ku em bibêjin “av dicemide/awe cemidîna” bi tirkî tê manaya “Su donuyor” an jî bi îngîlîzî tê manaya “the water is freezing”.

## 1. HILDANA CENAZEYÊ

Merasima cenaze rakirinê hema hema di her çandê de bi awayekî heye. Bi qasî dîroka mirovahiyê jî kevn e. Wek tê zanîn di çanda Yewnana kevn de di şerê Truvayê de dema ku Akhillius Hektorî dikûje, cenazeyê wî bi xwe re dibe. Bavê Hektorî Priamos nivê şevê diçe çadîra Akhillius digîrî û cenazeyê kurê xwe dixwaze. Dîsa di “Tragedya Sofoklesî” de Antingone digel mirinê, cenazeyê birayê xwe Polyneikesî vedişêre.

Hin çand cenazeyên xwe dişewitînin, hin çand parçe parçe dikin û didin teyr û turan. Kurmanc û zaza cenazeyên xwe vedişêrin.

Kurmanc cenazeyê xwe vedişêre.

Zaza cenazê xo dano we/wedano.

Her du jî lêkerê “veşartin”ê bi kar tînin.

Kurmanc û Zaza tîkîliya xwe bi mirfyan re nabirin. Tenê wan vedişêrin. Yê ku gora wan tune ye, yan jî kifş nîne, malbata wan êşeke mezin dikşîne. Dibêjin bila qet nebe goreke wan hebe.

## HEZKIRIN

Lêkera “hez kirin”ê di her ziman û çandê de heye û lêkereke bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e. Her netewe, her çand li gorî xwe hez dike. Di gelek zimanan de “hez kirin” di forma “accusative”yê de ye lê belê di kurmancî û zazakî de di forma “ablative”ê de ye.

Wek mînak:

Tirk dibêjin: “**Seni** seviyorum”.

Îngîlîz dibêjin: “I love **you**”.

Alman dibêjin: “Ich liebe **dich**”.

Fransîz dibêjin: “Je **t**’aime”.

Latîn dibêjin: “**Te** amo”.

Lê belê;

Kurmanc dibêjin: “Ez **ji te** hez dikim”.

Zaza dibêjin: “Ez **to ra** hes kena”.

Ji mînakên li jorê jî xuya dike ku di zimanên din de mirov dema ku hez dike berê xwe dide tiştê ku jê hez dike, lê di kurmancî û zazakî de mirov dema ku hez dike ji tiştê ku hez dike, jê tiştêkî distîne.

## **2. RENG**

Di kurmancî û zazakî de rengên bingehîn hema hema yek in. Di nav rengan de bikaranîna rengê “şîn”/“kewe” balkêş e.

Kurmanc dibêjin: “Zevî **şîn** dibe”.

Zaza dibêjin: “Hêga beno **kewe**”. Yanê bi tirkî “tarla yeşeriyor.”

Kurmanc dibêjin: “Zevî **şîn** e”.

Zaza dibêjin: “Hêga **kewe** yo”. Yanê bi tirkî “tarla yeşildir.”

Kurmanc û Zaza dîsa heman rengî yanê “**şîn**” û “**kewe**”yê, di maneya “mavi” ya tirkî bi kar tînin. Wek mînak:

Kurmanc dibêjin: “Asîman **şîn** e”.

Zaza dibêjin: “Asmên **kewe** yo”. Yanê bi tirkî “Gökyüzü mavidir”.

## **3. LÊKERA “MAN/MENDENE”**

Kurmanc dibêjin: “Ez ji trêne mam”.

Zaza dibêjin: “Ez trêne ra mendo”.

Ji bo negehîştina wesaîtan hem di kurmancî de hem di zazakî de lêkera “man”ê tê bikaranîn. Balkêş e, kurmanc û zaza heman lêkerê jî bo şibandinê jî bi kar tînin.

### **Minak:**

Kurmanc dibêjin: “Ev lawik **dimîne** bavê xwe”.

Zaza dibêjin: “No lajek **mend** ro pîye xo”.

Li aliyê din jî bo şibandinê kurmanc û zaza lêkera “çûn/şiyene”yê jî bi kar tînin.

### **Minak:**

Kurmanc dibêjin: “Ev lawik li bavê xwe **çûye**”.

Zaza dibêjin: “No lajek **şîyo** ro pîye xo”.

#### 4. BERKEVTIN/VERKEWTENE

“Berketin/verkewtene” lêkereke hevedudanî ye. Ji daçeka “ber/ver” û lêkera “ketin/kewtene” pêk tê. Hem di kurmancî de hem di zazakî de pêkhatin û fonksiyona vê lêkere wekhev in. Kurmanc û zaza dema ku xemgîn dibin yan jî ji yekî rê heyfa xwe tînin li ber xwe dikevin. Bi gotinek din dema ku xemgîn dibin serê wan dikevin ber wan yan jî berê xwe dinerin.

##### **Minak:**

Kurmanc dibêjin: “Ez pir li ber ketim”.

Zaza dibêjin: “Ez zaf kewto ver”.

Li aliyê din ev heman lêker ji bo fehmkirinê jî tê bikaranîn.

##### **Mînak:**

Kurmanc dibêjin: “Pêşî ez ber neketim”, paşê min fehm kir.

Zaza dibêjin: “Verde ez nêkewto ver” bado, mi fam kerd.

#### 5. LÊKERA “BÛN/BÎYENE”

Lêkera “bûn”ê di her zimanî de heye. Belkê bi qasî diroka mirovahiyê kevn e. Lêkereke bingehîn e. Jixwe Shakespear belasebeb ne gotiye “to be, or not to be, that is question”

Kurmanc û zaza ji bo pênasekirina rewşan, lêkera “bûn”ê bi kar tînin.

Kurmanc dibêjin: “Ez cotkar **bûm**”

Zaza dibêjin: “Ez citker **bîya**”yanê bi tirkî “çiftçiydim” yan jî bi îngilîzî “I was a farmer”.

Li vir lêkera “bûn”ê wek rewş hatiye bikaranîn. Lê belê dema ku lêkera “bûn”ê wek tevger bê bikaranîn wê gavê hevoksazîya hevokê diguhere.

Wek mînak:

Kurmanc dibêjin: “Ez **bûm** cotkar”

Zaza dibêjin: “Ez **bîya** citker”. Yanê bi tirkî; “çiftçi oldum.” yan jî bi îngilîzî; “I became a farmer”.

Tiştê balkêş e ku di hem kurmancî hem jî zazakî de kişandina dema niha ya lêkerên “**bûn**” û “**birin**”ê heman e.



**Mînak:**

BÛN		BIRIN	
Kurmancî	Zazakî	Kurmancî	Zazakî
Ez <b>dibim</b> mamoste	Ez <b>bena</b> mamoste	Ez keça xwe <b>dibim</b> mektebê	Ez keyna xo <b>bena</b> mektebe
Tu <b>dibî</b> mamoste	Ti <b>benî/a</b> mamoste	Tu keça xwe <b>dibî</b> mektebê	Ti keyna xo <b>benî/a</b> mektebe
Ew <b>dibe</b> mamoste	O/A <b>beno/a</b> mamoste	Ew keça xwe <b>dibe</b> mektebê	O/A keyna xo <b>beno/a</b> mektebe
Em <b>dibin</b> mamoste	Ma <b>benîme</b> mamoste	Em keça xwe <b>dibin</b> mektebê	Ma keyna xo <b>benîme</b> mektebe
Hûn <b>dibin</b> mamoste	Şima <b>benê</b> mamoste	Hûn keça xwe <b>dibin</b> dibistanê	Şima keyna xo <b>benê</b> mektebe
Ew <b>dibin</b> mamoste	Ê <b>benê</b> mamoste	Ew keça xwe <b>dibin</b> mektebê	Ê keyna xo <b>benê</b> mektebe

Hem di kurmancî de hem di zazakî de rêza peyvan bi gelemperî di şeklê “biker + bireser + lêker”ê ye. Lê dema ku kurmanc û zaza diçin û tên, ew rêz diguhere dibe: “biker + lêker + bireser”.

**Mînak:**

Kurmanc dibêjin: “Ez diçim zozanê”.

Zaza dibêjin: “Ez şona ware”.

Kurmanc dibêjin: “Ez tîm zozanê”.

Zaza dibêjin: “Ez êna ware”.

**6. LÊKERÊN ZANÎN Û KARINÊ**

Di kurmancî û zazakî de lêkerên zanin û karinê (zanayene û şayene) li ser raweya xwestinê (subjunctive) ava dibe.

**Mînak:**

Ez dikarim **werim**.

Ez şêna **berî**.

Ez dixwazim **bixwînim**.

Ez wazena **biwanî**.

**7. DEMA BÊ**

Kurmanc û zaza di derheqê pêşerojê de ji xwe ne bawer in. Dema bê hem di kurmancî hem di zazakî de li ser raweya xwestinê (subjunctive) ava dibe. Wek tê zanîn di raweya xwestinê de jî du wateyên girîng hene: rawêj û dibetî.

Dema ku kurmanc dibêjin “ez dê bê” û zaza dibêjin “ez do bêrî”, ji hatina xwe re ne ewqas bawer in.

Di pir zimanan de “dema bê” biryardarî, fermanî û hwd. nîşan dide. Mesela dema ku bi tirkî biderbdanî “geleceksin” (tu dê bê) bê gotin, ew wek ferman tê hesibandin. Dîsa di gelek zimanan de di Kitêba Pîrozê de deh fermanên Xwede bi “dema bê”yê hatiye wergerandin:

*(Ji bo fermana heştam)*

Bi tirkî: Çalmayacaksın.

Bi îngîlîzî: You shall not steal.

Bi fransîzî: Tu ne déroberas point.

Bi almanî: Du sollest nicht stehlen.

Ji mînakên li jorê jî diyar e ku di zimanên jorîn de forma dema bê hatiye bikaranîn. Lê belê dema ku em vê fermanê bi forma dema bê wergerînin kurmançî û zazakî tam wateya xwe nade. Divê em bi forma fermanî wergerînin. Yanê divê wiha be:

Bi kurmançî: Nedize, yan jî “diziyê neke”<sup>6</sup>

Bi zazakî: Metire, yan jî “dizdîne meke”.

## 8. BIKER Û BIRESER

Ji destpêka mirovahîyê heta roja me mirov di jiyana xwe de her tim hem biker e hem jî bireser e. Têkîlîya biker û bireserê di her zimanî de cuda ye. Di gelek zimanan de biker û bireser li gorî deman naguherin. Di hemû deman de wekhev in. Di gelek zimanan de du cure cînavên kesan hene: cînavên kesan ji bo biker û cînavên kesane ji bo bireserê. Ew her du koma cînavan sabît in.<sup>7</sup>

<sup>6</sup> Bnr. Kitêba Pîroz, Peymana Kevin û Peymana Nû, wergêr: Said Alpaslan û Resul Yıldırım, Gerçeğe Doğru Kitapları, Temmuz 2008, r. 125.

<sup>7</sup> Bnr. İbrahim Bingöl, Kirmanckî (Zazakî) de Pêveronayîşê Fekê Çewlîgî û Gimgimî, Teza Lîsansa Bilind ya Neçapkirî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardîn 2013, r. 60.

**Mînak:**

	Tirkî	Fransî	Latinî	Almanî	Îngilizî	Yewnaniya kewn
Cînavên kesan ji bo bikerê	Ben	Je	Ego <sup>8</sup>	Ich <sup>9</sup>	I	εγω <sup>10</sup> (ego)
	Sen	Tu	Tu	Du	You	συ (su)
	O	Il /elle	Is/ea/id	Er/sie/es	He/she/it	αὐτός (autos)
	Biz	Nous	Nos	Wir	We	ἡμεῖς (hemeis)
	Siz	Vous	Vos	Ihr	You	ύμεῖς (humeis)
	Onlar	Ils/elles	Ei/eae/ea	Sie	They	αὐτοί (autoi)
	Cînavên kesan ji bo bireserê	Beni	Me	Me	Mich	Me
Seni		Te	Te	Dich	You	σε (se)
Onu		Le/la	Eum/Eam/id	Ihn/sie/es	Him/her/it	αὐτόν (auton)
Bizi		Nous	Nos	Uns	Us	ἡμάς (hemas)
Sizi		Vous	Vos	Euch	You	ύμάς (humas)
Onları		Les/les	Eos/eas/ea	Sie	Them	αὐτούς (autous)

Lê belê di kurmancî û zazakî de ji bo biker û bireserê cînavên sabît tune ne. Du kom cînav hene lê ev her du kom jî li gorî qayde û rêzikan hem dibin biker hem jî dibin bireser.

**Minak:**

KURMANCÎ		ZAZAKÎ	
Casus Rectus (RewşaXwerû)	Casus Obliquus (RewşaTewandî)	Casus Rectus (RewşaXwerû)	Casus Obliquus (RewşaTewandî)
Ez	Mîn	Ez	Mî
Tu	Te	Ti	To
Ew	Wî	O	Ey
Ew	Wê	A	Aye
Em	Me	Ma	Ma
Hûn	We	Şîma	Şîma
Ew	Wan	Ê	Înan

<sup>8</sup> Frederic M. Wheelock, Wheelock's Latin, revised by Richard A. La Fleur, Harper Collins, 2000, r. 67.

<sup>9</sup> Ender Erenel, Almanca Dilbilgisi, Fono Açık Öğretim Kurumları Yayınları, İstanbul, 1993, r. 416-418.

<sup>10</sup> Zafer Taşlıklıköglü, Grekçe Gramer ve Syntaks, İstanbul Edebiyat Fakültesi Yayınları, İstanbul, 1981, r. 52.

Di kurmancî û zazakî de du demên bingehîn hene: dema niha û dema borî. Kurmancî û zaza dema ku lêker gerguhêz be, yan jî bi gotineke din biker û bireser bi hev re bin, nerîna wan li gorî dema niha û dema borî diguhere. Tu dibêjî qey kurmancî û zaza tiştên ku di dema borî de kirine, berpisyariyan wan nagirin ser mile xwe. Bi gotineke din bikera dema niha, dibe biresera dema borî, yan jî biresera dema niha dibe bikera dema borî. Tişteke balkêş e ku di kurmancî û zazakî de lêker her tim li gorî cînavên koma “ez”ê, yanê li gorî koma xwerû diçe.

**Mînak:**

Bi kurmancî:

**Hesen**, Ehmedî dibîne. Ew **wî** dibîne.

**Hesenî** Ehmed dît. **Wî** ew dît

Bi zazakî:

**Hesen** Ehmedî vînenê. O **ey** vînenê.

**Hesenî** Ehmed dî. **Ey** o dî.

Bi tirkî:

Hasan Ahmet’i görüyor. O onu görüyor.

Hasan Ahmet’i gördü. O onu gördü.

Bi îngîlîzî

Hasan sees Ahmet. He sees him.

Hasan saw Ahmet. He saw him.

Di mînakên jorîn de jî xuyaye ku di îngîlîzî û tirkî de hem di dema borî de hem jî di dema niha de biker û bireser tu carî naguherin lê di kurmancî û zazakî de diguherin.

Pir balkêş e ku car caran awarteyên kurmancî û zazakî jî wekhev in. Mesela me got wek qeydeyekê di kurmancî û zazakî de di hemû deman de, dema ku lêkera hevokê ne gerguhêz be, wek cînav biker her tim xwerû ye.

Wek mînak em lêkera “çûn/şîyene”ê binêrin:

<b>DEM</b>	<b>KURMANCÎ</b>	<b>ZAZAKÎ</b>
Dema Niha	<b>Ez</b> diçim	<b>Ez</b> şona
Dema Borî	<b>Ez</b> çûm	<b>Ez</b> şîya
Dema Bê	<b>Ez</b> dê biçim	<b>Ez</b> do şorî

Lê belê gava ku di dema borî de di heman hevokê de hem lêkerekê negerguhêz hem jî lêkerekê gerguhêz bê bikaranîn wê gavê hem di kurmancî hem jî zazakî de bi taybetî di axaftinê de awarteyeke wiha çê dibe:

Bi tirkî hevoka “gidip gördüm”ê di kurmancî û zazakî de dibe:

**Min çû dît**

**Mi şî dî**

Wek tê zanîn lêkera “çûn”ê negerguhêz e lê lêkera “dîtin”ê gerguhêz e. Divê wek qeyde wiha bê nivîsîn:

**Ez çûm min dît**

**Ez şîya mi dî**

Lê ji ber ku bikera hevokê hevbeş e di axaftinê de cînava lêkera gerguhêz bandora xwe dide ser cînava lêkera negerguhêz û wê ji holê radike û şûna wê digire.

## **9. PASÎFKIRINA LÊKERAN**

Farisî jî di nav de gelek ziman wek îngîlîzî, almanî û hwd. ji bo pasîfkirinê lêkera alîkar “bûn”ê bi kar tînin. Lê belê kurmancî û zazakî lêkera alîkar “hatin/ameyene”yê bi kar tînin.

Wek minak:

Bi kurmancî: Xanî **hat** çêkirin

Bi zazakî: Keye **amê** viraştene.

Wek tê zanîn di pasîfkirinê de biker ne aktîf e, pasîf e, ango tiştêk tê serê bikerê, ew bixwe tiştêk nake. Ji ber bikaranîna lêkera alîkar “hatin”ê ew rewş kurmancî û zazakî de pir zelal xuya dike.

## **10. DANÇÊKER**

Hem di kurmancî de hem di zazakî de lêkera dançêkerê yek e: “dan/dayene”

**Mînak:**

Min xanî **da** çêkirin.

Mi keye **da** viraştene.

Di zimanê îngîlîzî de lêkerên dançêker “to have”, “to make” û “to get” in. Di manaya van her du lêkerên pêşî de dema ku mirov tiştêkî didin çêkirin “hinek zor” tê de vêşartî ye. Di manaya lêkera dawî ango lêkera “to get”ê de jî piranî “îqna” heye. Mesela di zimanê farisî de jî rêbazeke dançêkirinê, bikaranîna lêkera “meqbûr kerdin” yan jî “meqbûr sâxten”ê ye.<sup>11</sup> Lê di kurmancî û zazakî de tiştê wiha tune ye. Heke mirov bixwaze bi zorê tiştêkî bidin çêkirin divê mirov hokereke di nav de mana zorê heye bi kar bîne.

<sup>11</sup> Osman Aslanoğlu, *Kolay Farsça, Kent Işıkları*, Ç. 3, İstanbul 2011, r. 233.

**Minak:**

Bi kurmancî: Me **bi zorê** xanî **da** çêkirin.

Bi zazakî: Ma **bi zor** keye **da** viraştene.

**11. ÇÊKIRINA PIRSAN**

Hokerên pirsyarî ne tê de, pirs hem di kurmancî de hem di zazakî de bi kirpandinê tê çêkirin. Ji ber vê yekê kurmanc û zaza yên ku tirkî baş nizanin, dema ku di tirkî de pirsên rasterast bi mantika kurmancî û zazakî çê dikin û bi kirpandinê dibêjin, “geliyorsun?”, “veriyorsun?” hwd. Lê belê wek tê zanîn di tirkî de çêkirina pirsên rasterast bi kirpandinê çê nabe. Divê qertafên pirsê wek “mî”, “mî”, “mu”, “mü” bên bikaranîn. Li gorî wî, minakên ku li jorê hate dayîn rastiya wan divê wiha be: “Geliyor musun?”, “veriyor musun?” hwd.

**ENCAM**

Çawa mirov endamên malbatakê dinêre ku her çiqas DNAYA wan yek be jî dîsa gelek cudahiyên wan ên taybet jî hene. Heman tişt ji bo civatan jî derbas dibe. Em kurmanc û zazayan bidin aliyekî, kurmanc di nav xwe de, zaza jî di nav xwe de xwediyê cudahiyên mezin in. Di nav sebebên van cudahiyan de gelek faktor hene. Ew cudahî xwe di zimên de jî nîşan didin. Mesela di nav zazayan de cudahiyên olê di zimên de jî xwe nîşan didin. Wek tê zanîn sê devokên zazakî yên mezin hene. Mirov dikare wan bi vî awayî jî dabeş bike:

- 1) Yên ku dibêjin “Heq razî bo” yanê devoka bakur, piraniya wan Alewî ne.
- 2) Yên ku dibêjin “Homa razî bo” yanê devoka navendî, piraniya wan Şafî ne.
- 3) Yên ku dibêjin “Ellah razî bo” yanê devoka başûr, piraniya wan Hanefî ne.<sup>12</sup>

Yên ku devoka rêza yekem an jî rêza sêyem diaxifin, ji devoka rêza duyem zor fehm dikin. Disa di nav Kurmancan de jî gelek devok hene û ji van devokan hin devok di fehmkirina hevûdu de dijiwariyê dikişînin.

Hem di nav Kurmancan de hem jî di nav Zazayan de digel van cudatîyên têvel, nêrîna wan a ji bo fehmkirina dinyayê ji aliye zimên ve kêm zêde li ser heman bingehê ava dibin.

<sup>12</sup> Ji bo agahiyên eşîrên Zazayan û olên wan bnr. Ercan Çağlayan, Aşiretler Raporu’na Göre Zaza Aşiretleri, Zazalar, Kültür ve Kimlik, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, Ç. 1, İstanbul, Mart 2016, r. 203, dinav de.

## ÇAVKANÎ

- Aksan, Doğan:** Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2009.
- Aslanoğlu, Osman:** Kolay Farsça, Kent Işıkları, ç. 3, İstanbul 2011.
- Bayraktar, Nesrin:** Dil Bilimi, ç. 2, Paradigma Nobel Yayın Dağıtım, Ağustos 2006.
- Bingöl, İbrahim:** Kirmanckî (Zazakî) de Pêveronayîşê Fekê Çewligî û Gimgimî, Teza Lîsansa Bilind ya Neçapkirî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mardîn 2013.
- Chomsky, Noam:** Dil ve Zihin, wer: Ahmet Kocaman, Ayraç Yayınevi, Ankara 2002.
- Crystal, David:** Dillerin Katli, wer: Gökhan Cansız, Profil Yayıncılık, ç. 2, İstanbul 2010.
- Çağlayan, Ercan:** Zazalar; Tarih, Kültür ve Kimlik, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, Mart 2016.
- Erenel, Ender:** Almanca Dilbilgisi, Fono Açık Öğretim Kurumları Yayınları, İstanbul, 1993.
- Eugene A. Nida:** Dilbilim Üzerine Tartışmalar, wer: Prof. Dr. Özcan Başkan, Multilingual, İstanbul 2003.
- Farqînî, Zana,** Ferheng, Sözlük, Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî, Enstituya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2007.
- Grûba Xebate ya Vateyî:** Ferhengê Kirmanckî (Kirmanckî)-Tirkî, ç. 4, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2011.
- Jacobson, C. M.:** Rastnustena Zonê Ma, Vêjyayîşê Tiji, 2001.
- Kitêba Pîroz,** Peymana Kevin û Peymana Nû, wergêr: Said Alpaslan û Resul Yıldırım, Gerçeğe Doğru Kitapları, Temmuz 2008.
- Kocadağ, Çeko:** Ferheng, Kirmanckî (Zazakî)-Kurmancî, Kurmancî-Kirmanckî (Zazakî), Weşanên KOMKAR, 2010.
- LIDDELL&SCOTT:** Greek-English Lexicon, Oxford, 2003.
- Longman Dictionary** of Contemporary English, New Edition, 1991.
- Martinet, André:** İşlevsel Genel Dilbilim, wer: Berke Vardar, Multilingual, İstanbul 1998.
- Pertew, Ramazan:** Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Avesta, 2015.
- Porzig, Walter:** Dil Denen Mucize, wer: Prof. Dr. Vural Ülkü, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ç. 3, Ankara, 2011.
- Saussure, Ferdinand De:** Genel Dilbilim Dersleri, wer: Berke Vardar, Multilingual, İstanbul 1998.
- Tan, Sami:** Rêzimana Kurmanckî, çapa berfirehkirî, ç. 2, Enstituya Kurdî, 2011.

**Taşlıkoğlu, Zafer:** Grekçe Gramer ve Syntaks, İstanbul Edebiyat Fakültesi Yayınları, İstanbul, 1981.

**Uygur, Nermi:** Kültür Kuramı, Remzi kitabevi, İstanbul, 1984.

**Uygur, Nermi:** Dilin Gücü, Yapı Kredi Yayınları, ç. 6, İstanbul, 2012.

**Wheelock, Frederic M.:** Wheelock's Latin, revised by Richard A. LaFleur, Harper Collins, 2000.





## VEGOTINA HÊMAYÎ Û METAFORÎK DI MAMIKÊN KURDÎ DE\*

Kenan SUBAŞI\*\*

### KURTE

Di nav keresteyên gelêrî de mamik li gor şêwaz û naveroka xwe hêjayî gelek lêkolîn û analîzan e. Wek pênaseya wan, dewlemendiya mamikan û geşedana wan a dîrokî jî efsûnî ye. Her çiqas îro wek keresteyeke kêf û listikê û jî bo fêrkirina ziman amûreke kêrhatî be jî li gorî lêkolîneran di eslê xwe de mamik berê jî bo pêşbaziyên zîrekiyê yên siltanan û jî bo veşartina raz û sembolan gotinên zor û zehmet bûne. Di vê xebatê de me jî hewl da ku di mamikên kurdî de di bin gotinan de çî hêma, metafor û sembol hene bizanin. Di serî de berî ku em analîza hêmayên di mamikan de bikin me xwest em bi giştî bidin zanîn ka mamik çî ne û çawa tên afirandin. Her wiha me du rêbazên afirandina hêmayan ango metafor û metonîmî û têkiliya wan a bi mamikan re da ber çavan. Piştî vê kurtenasîne, me hêmayên di mamikên kurdî de li gorî çawanî û çendaniyê parî kir û bi mînak ew nîşan dan. Herî dawî jî me jî bo şayesandina hin heyberên şênber ên sereke yên ku di mamikên kurdî de cih girtine, tabloyekê hêmayan çê kir.

**Bêjeyên Sereke:** Mamikên Kurdî, Metafor, Metonîmî, Hêma.

### ABSTRACT

#### *"Metaphoric and Imaginary Narration in the Kurdish Riddles"*

Riddles are a type of folkloric sayings on which lots of researches and analyses need to be carried out in terms of form and content. They are legendary in terms of their legendary definition, rich variety and historical process. Though today there are some games that are played with riddles and riddles are used as auxiliary documents for language teaching, according to many sources riddles were in fact used in the mind games of the sultans and they were rhetoric in which symbols and secrets were hidden. In this research I wanted to show how rich Kurdish riddles are in terms of images, metaphors and symbols. At the beginning of the research I wanted to define what the riddle is and give information on how the riddles are formed before analysing images in the riddles. Furthermore, I defined metaphor and metonymy which are the methods for creating images and I showed their relation with the images. After this short introduction I exemplified the images in Kurdish riddles according to quality and quantity by separating them into two

\* Ev gotar bi pareke zêde ji teza min a masterê ya çapnebûyî hatiye girtin. Bnr: Kenan Subaşı, *Ji bo Zarokan di Fêrkirina Kurdî de Rola Mamikan*, Zanîngeha Mardin Artuklu Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Teza Mastîrê ya Çapnebûyî, Mêrdîn 2014.

\*\* Lêkolîner, Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanîsta Çand û Zimanê Kurdî.  
[kenanenado@gmail.com](mailto:kenanenado@gmail.com)

parts. I showed the concepts and words that are used for creating an image in Kurdish riddles at the end of the research and in a table.

**Key Words:** Kurdish Riddles, Metaphor, Metonymy, Image.

## DESTPÊK

Hêma hunereke ziman e û li ser gotinê ava dibe. Di ziman de ji bo ku mirov armanca xwe ne rasterast lê bi awayekî kînayeyî û îstîfayeyî bîne der, mirov hêmayan bi kar tîne. Ev şêwaz piranî di gotinên helbestkî de çê dibe û ji bo bihîstina guhê mirovan xwedî estetîkek e. Mamik jî yek ji wan cureyên gotinan e ku bêhtir bi awayekî helbestkî hatine honandin û hinek ji wan jî bi awayekî pexşankî ne, lê kurt in. Sedema bikaranîna hêmayan di mamikan de ew e ku mamik bixwe cureyekî pirsê ne ango ew gotinên xwedî raz û sembol in û di xwe de tiştêkî vedişêrin. Di ziman de jî karê veşartinê herî baş bi metafor û alegoriyan çê dibe. Ji ber wê ye ku Arîstoteles jî derbarê mamikan de wiha gotiye: “Mamikên serkeftî gelek caran metaforên têr û tije di xwe de dihewînin. Çimkî metafor rêbazeke afirandina hêmayan e. Ji ber wê yekê jî di mamikê de bi rehetî metaforek peyda dibe.”<sup>1</sup> Li gor van esasan me jî di vê xebatê de mamikên kurdî li gorî çawanî û çendaniya hêmayan nixand û di mamikên kurdî de çêbûna metafor û metonîmiyan bi çî hawî dibe, bi mînakên xwe nîşan da. Armanca vê yekê hem nîşandayîna hêmayan di mamikên kurdî de ne û hem jî dîtina wê yekê ye ka mamik li ser kîjan hêmayan û bi çî lewnî ava dibin. Di serî de ji bo nasîna mamikan, me çî li gorî rêbaza klasîk çî jî li gorî rêbaza binyadî be ew pênase kirin. Em dûre hêma çî ne û li ser kîjan cureyan par dibin bi mînakên kurdî lê kûr bûn. Me di dawiyê de jî hêmayên ji bo şayesandina hin heyînen sereke û berçav di nav tabloyekê de vegotin.

**1. Mamij û Pênaseyên Wê:** Pirsên derbarê pênaseyên mamikan de bi dehan salan e hişê lêkolîneran mijûl kirine. Ji ber vê yekê jî gelek lêkolîneran pênaseyên ji hev cuda û curbicur kirine û ji aliyê naverok û teşeyê ve taybetiyên mamikan rêz kirine û pênaseyên xwe li ser wan taybetiyan ava kirine. Lê di hemû pênaseyan de jî gotina hevpar ew e ku mamik berhemên edebiyata gelêfî yên gelekî qedîm in. Ji bo ku bikarin bibînin bê bi giştî mamik çî ye, taybetiyên wê çî ne, em ê çend pênaseyên ku hatine kirin li vir nîşan bidin.

Îlhan Başgöz di xebateke xwe de li ser fonksiyonên mamikan rawestiyaye û çend pênaseyên kurt neqil kirine ku dibêje: “Berî her tiştî mamik xwediyê rengêkî lîstîk û kêfê ne... Mamik ji ber ku bi ziman tîn afirandin, di nav lîstîkên ziman de cî digirin.”<sup>2</sup> An jî ji çibûna mamikan zêdetir derbarê çawaniya vegotin û bikaranîna di nav gel de wiha dibêje: “Mamik amûreke kêfê ye ku bi xisûsî di şevên dirêj ên zivistanê de zêdetir zarok, keç û jin pê dema xwe dibuhurînin.”<sup>3</sup> Di vê pênaseyê de mirov fêhm dike ku ji bo gotina mamikan jî dem, war û kesên

<sup>1</sup> Aristoteles, *Retorik*, Çev. Doğan Mehmet H., Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2001, r. 168-173.

<sup>2</sup> İlhan Başgöz, “Türk Bilmecelerinin Fonksiyonları”, *Folklor Doğu*, j. 37, İstanbul, 1974, r.29.

<sup>3</sup> Başgöz, h.c.

taybet lazim in. Ango li her derê di her şertî de ev yek pêk nayê. Lê herî zêde tiştê ku li ber çavan ev e; mamik wek amûreke ji bo listik, kêf û şahiyê hatiye dîtin.

Ji hêla hin kesan ve jî mamik ji listikê zêdetir wek berhemeke edebî tê dîtin weku Pertev Naili Boratav jî dibêje: “Dema ku mirov cara ewil bala xwe dide mamikan, mirov dibêje qey ‘listikek’ e. Bi rastî listikên ku mamikan di xwe de dihevin hene, lê belê mamikan bi hin xisûsiyetên xwe yên wek ‘pîrs’ û bi vê yekê re ‘qalibên vegotinê’ xwemaliyek bi dest xistiye.”<sup>4</sup>

Birol Azar tesbîta veşarîbûna mamikan dike û di vî warî de dibêje ku mamik ew cure berhem in ku di xwe de tiştê veşartî dihevin û vê yekê bi rêya pîrsê jî xwîner û guhdêr dipirsin û li benda bersivê dimînin.<sup>5</sup> Ev taybetiya mamikan zêdetir ji bo afirandina alemeke fantastîk bi kêr tê. Çimkî tiştên veşartî her gav kelecane zêde dikin û meraqê zinde digirin ku ev yek jî bala zarokan zêdetir dibe ser xwe. Yek ji tiştên herî muhîm ew e ku maneyê di nav gotinê de vedişêre. Ev yek jî ji bo pêşxistin û hînbûna hûrgiliyên ziman rêbazeke girîng e.

Fevzî Karademir jî li ser mamikan rawestiyaye û zêdetir dewlemendiya mamikan ji hêla hunerên vegotinê ve derxistiye pêş û wiha pênase kiriye: “Mamik berhemên anonîm in ku heyîn û bûyerên şênber û razber, hedîse û şexsiyetên tarîxî û hwd. bi rêya vegotinê wek îstîfere, neasayîti, dijayetî, texlîtên dangan, sêwirandinên fantastîk û bi awayekî pîrsîna pîrsên bikêf derçûne.”<sup>6</sup>

Altan Alperen mamikan wek berhemên ku ji mecaz û dijayetiyên pêk hatibin, dinirxîne û ji ansiklopediya Brockhausê<sup>7</sup> pênaseyeke wiha neqil dike: “Mamik wesifandinên bi awayekî nerasterê ne ku têgehên veşartî yên di wan de divê ji hêla xwîner û guhdêr ve bînin dîtin.”<sup>8</sup>

Hin kes dibêjin ku mamik di mirovan de mekanîka fikrê dixwe dewrê. Yek ji wan Salahaddin Bekkî ye û dibêje mamik ji bo ku mirov wextekî xweşik biborîne, zanîna hevûdu biciribîne û li hemberî hev rêz û hurmetê bigire, hunereke pîrsiyarî ye. Ji ber vê yekê jî mamik ew vegotin in ku li ser siruşt, mirov, ajel û amûran û hemû heyînan din bi awayekî razber û veşartî tên gotin da ku mirov bifikire û pê derxîne ka ev heyîn çi ne.<sup>9</sup>

Li ser tîkiliya di navbera mamik û edebiyata zarokan Ayhan Karakaş wiha fikra xwe bi me re parve kiriye: “Em dikarin bibêjin ku mamik di hemû neteweyan de tên gotin ku berhemên anonîm ên qedîm in. Wekî din mamik vegotinên

<sup>4</sup> Pertev Naili Boratav, “100 Soruda Türk Halk Edebiyatı”, Bilgesu Yayınları, Ankara, 2013, r. 125.

<sup>5</sup> Birol Azar, “Çocuk Eğitiminde Folklor/Halkbilimden Yararlanma Üzerine”, *Türk Xalkarı Edebiyatı [III]: Beynelxalq Uşaq Edebiyatı Kongresi*, Qafqaz Üniversitesi, 2008, r. 823.

<sup>6</sup> Fevzi Karademir, “Halk Bilmecelerinin Oluşum ve Biçimlenmesindeki Etkenler Üzerine”, *Akdaemik Bakış*, j. 14, Nisan 2008, r. 2.

<sup>7</sup> Brockhause Enzyklopadî, b. 15. Weisbaden, 1972, r. 380.

<sup>8</sup> Altan Alperen, *Folklor ve Edebiyatın Unutulan Unsuru: Bilmeceler*, r. 120.

<sup>9</sup> Salahaddin Bekkî, *Bilmeceler, Tabu ve Gizli Diller Üzerine*, Muzaffar Akkuş Armağanı, amd. Mücahit Akkuş ve Fatih Dinçer, Kömen Yayınları, Konya, 2013, r. 337.

qalibgirtî yên ku wek lîstikên jîrahî û gotinê ne ku ji bo buhurandina demê di nav kêfxweşiyê de tîn gotin. Di mamikan de gelek caran pîrs li ser daneyan tîn bersivandin. Ji ber wê jî tîkiliyeke xurt di navbera naveroka mamikê û bersiva wê de heye.”<sup>10</sup>

Di fêrkirina ziman de li ser rola mamikan Aysun Önür di xebateke xwe de mamik bi kurtî wiha pênase kirine: “Mamik ew pîrs in ku bi şêwazeke veşartî tîn vegotin û her wiha ji bo ku heyînên veşartî yên di wan de bîn dîtin, mamik wek ew pîrsên ku zêhna mirov dişuxulînin tîn qebûlînin.”<sup>11</sup> Di vê pênaseyê de zêdetir tesîra mamikan a li ser geşedana zêhnî û zimanî ya zarokan rawestayê. Mamik wekî hunereke koordînatî a di navbera hiş û ziman de tê nîrxandin.

Li ser egera heyîna mamikan a ji bo mirovan û zêdetir li ser şiklê pîrsiyarîbûna mamikan Emîne Balta gotiye ku mirovan di jiyânê de her gav ji hev pîrs kirine. Hesta meraqê û xwesteka kifşkirinê ya di mirovan de heya heya dê bidome. Ji ber vê ye ku mamik li gor zêhn û ruhê mirovan berhemên herî hêja yên folklorîk in. Li ser vê yekê Balta tehlîleke Abrahams û Dundes neqil dike ku pîrsiyarên normal û yên ku di mamikan de derdikevin holê ji hev cuda ne. Cudabûna wan ew e ku pîrsiyarên mamikan hişê mirovî zêde tîkilhev dike û dibe sebeb ku hiş zêdetir bixebite. Ev pîrs ji bo ku tiştên nayên zanîn, bîn zanîn û heyînên veşartî, bîn peydakirin, wek pîvana qabiliyeta hazircewabî û bilezfkirinê ye.<sup>12</sup>

**2. Pênaseyêke Binyadî:** Ji çibûna mamikan zêdetir, ew çawa pêk tîn babeta vê sernavê ye. Di gotara R. A. Gorges û Alan Dundes de, li ser vê mijarê hatiye gotin ku heya îro her lêkolîner û zanyar gihiştîye wê qeneetê ku divê li ser mamikan xebat bîn kirin, lê belê heya îro kes ji pênaseyên klasîk wîrdetir neçûye ku ev yek jî ji bo nasîna mamikan kêr dimîne.<sup>13</sup> Di pênaseyên klasîk de zêdetir li ser macazan sekinîne ku Gaston Parîs bixwe jî ev yek aniye ziman: “Ew mecaz û komemecazên ku wateya wan ne eşkere ne û di nav jiyana rojane de zêde nehatine bikaranîn, mamik in.”<sup>14</sup> Ji bilî van pênaseyan hin lêkolîneran jî mamik dabeş kirine û gotine ku mamik li ser çend beşên cuda ava dibin ango mamikek di nav xwe de ji çend parçeyan pêk tê. Gorges û Dundes ji Robert Petsch<sup>15</sup> ev yek wiha neqil kirine: “Petsch li gor gotina xwe cara ewil mamikên rasteqîn wiha dabeş kirine: 1) Hêmana (îskelet) destpêkê 2) Hêmana esil a

<sup>10</sup> Ayhan Karakaş, “Ortak Anonim Türk Halk Edebiyatı Ürünlerinden Bilmecenin Çocuk Edebiyatına Katkıları”, *Türk Xalkarı Edebiyatı [II]: Beynelxalq Uşaq Edebiyatı Kongresi*, Qafqaz Üniversitesi, 2008, r. 813.

<sup>11</sup> Aysun Önür, “Türkçe Öğretiminde Bilmecenin Yeri ve Önemi”, *Gazi Üniversitesi Türkçe Araştırmaları Akademik Öğrenci Dergisi*, j. 2, 2012.

<sup>12</sup> Elif Emine Balta, “Bilmecelerin Dil-Düşünme Bağlamında Eğitimdeki Yeri ve Önemi”, *Turkish Studies- International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume 8/1 Winter*, 2013, r.892.

<sup>13</sup> Robert A. Gorges, Alan Dundes, “Bilmecenin Yapısal Bir Tanımına Doğru”, *Folklorla Doğru*, j. 37, 1974, İstanbul, r.87.

<sup>14</sup> h.c.

<sup>15</sup> Di teza doktorayê ya Robert Petsch de ev yek hatiye kategorîzekirin. Bnr. Robert Petsch. “Neue Beiträge zur Kenntnis des Volksrätsels”, Palaestra, b. IV. Berlin, 1899.

hevpar 3) Hêmana esil a teswîrkirî 4) Hêmana kutle 5) Hêmana (îskelet) keyskirinê. Lê Petsch bixwe jî dibêje ku ev pênc hêman bi hev re piçek zehmet e ku di mamikê de werin dîtin.”<sup>16</sup>

Li beramberî van pênaseyan hin folkloras têgihîştine ku hin mamik bêyî mecaz û beşên curbicur jî çê dibin ango ne şert e di mamikê de mecaz an jî çend beş hebin. Ji ber ku ev pênaseyên klasîk bi giştî qels mane û nekarîne di vê babetê de zelaliyekê çê bikin, hin kesan jî gotine ku divê pênaseyên binyadî bîn kirin.

Gorges û Dundes anîne ziman ku ji bo pênaseyê binyadî hewcedariya diyarkirina herî kêr hêmanekê heye ku Robert Petsch û Archer Taylor<sup>17</sup> jî vê hêmanê re gotine “hêmana teswîrkirî” (descriptive element). Dîsa ev hêman di nav xwe de bûye du beş ku yek jê mijar a din jî şîroveya wê ye.<sup>18</sup>

Gayê sur ê di gelî da girêday.

**[Ezman]**, (Berwarî. M: 45)

Di vir de ‘gayê sur’ mijar e. ‘di gelî da girêday’ jî şîroveya mamikê ye. Bi vî şiklî di vê mamikê de hêmanekê teswîrkirî tenê heye.

Serî şêrîn e, binî tehl e.

**[Şerr]**, (Berwarî. M: 49)

Ev mamik jî ji du hêmanên teswîrkirî pêk tên, yek jê ‘serî şêrîn e’ ya din jî ‘binî tehl e’. Piştî eşkerekirina hêmanekê pênaseyê binyadî wiha danîne: “Mamik ew berhemên devkî ne ku di nav civakê de bi awayekî anonîm li ser hêmanekê an jî çend hêmanên teswîrkirî hatine avakirin û her wiha carinan di nav du hêmanên wê de dijayetiyeke derdikeve holê. Tê xwestin ku li ser van hêmanan texmînek bê kirin.”<sup>19</sup> Ji bilî vê pênaseyê ji bo ku ev babet zêdetir bê zelalkirin, mamik li ser du beşan senifandine û ev senifandin jî li gor hebûn an nebûna rewşa dijayetiyeke ya di nav hêmanên teswîrkirî de çê kirine. Ew hêmanên ku dijayetiyeke nahewînin wek **mamikên bêdijayetî** yên ku di xwe de dihewînin jî wek **mamikên bidijayetî** hatine veqetandin.

Mamikên bêdijayetî dibe ku di nav xwe de mecazê jî bihewînin an jî rasterast wateya yekem jî, lê belê hêmanên li dij hev tê de tune ne.

Pênc bira ne her yekî salekî ser e?

**[Tilî]**, (Güneş. K: 103)

Di vir de mijarên hêmana teswîrkirî an jî mijar bixwe yek in.

Girek di pêş de, du qul tê de?

**[Poz]**, (Güneş. K: 65)

<sup>16</sup> h.b., r.88.

<sup>17</sup> Archer Taylor, “Problems in the Study of Riddles”, Southern Folklore Quarterly, II, 1938, 3.

<sup>18</sup> h.b., r. 91.

<sup>19</sup> h.b., r. 92.

Di vir de mijar û bersiv dibe ku ne wek hev bin û tê de mecaz hebe lê ya muhîm ku tê de dijayetiyeke tune.

Mamikên bidijayeti jî xisûsiyeta wan a sereke ew e ku di nav du hêmanên wê de dijayeti hebe.

Ser textik e, bin textik e, giya dixwe ne karik e.

[Kîsel/Kusî], (Berwarî. M: 36)

Di vê mamikê de jî ‘**giya dixwe ne karik e**’ du hêmanên li dij hev in.

**3. Binavkirinên Mamikan di Zimanê Kurdî de:** Li ser navê mamikan li gor dever û dîyalektên kurdî cudahî çê bûne. Ji ber vê ye ku qest her çiqas mamik be jî nav û nûçikên wê pircure ne. Tabî ev cudatî tenê xisûsiyeteke kurdî nîne, di zimanên din de jî rewş bi heman şiklî ye. Mînak di tirkî de “bilmecce”, “tapmaca”, “mesel”, “matal” û hwd. navên cuda hene. Derbarê navên kurdî de Sedreddîn Nûreddîn Ebûbekr di xebateke xwe de wiha dibêje: “Di zimanê kurdî de gelek zarawe bi maneya metel bi kar tên wek: metel, hetele, meyl, helêne, çewçe, mamik, têderxistinok, tiştanok...”<sup>20</sup> Hacı Xalid Akreyî di pirtûka xwe ya bi navê *Hezar Metelok bo Mirovên Jîr û Kok* de bi kurtî li ser navê vî cureyî tiştêkî wiha dibêje: “...êk li van genc û samanê kurdî **mamik** in an **tiştê** min tişt e yan dişên bibêjin **metelok**,...”<sup>21</sup> Di vir de jî sê navên ku herî zêde tên bikaranîn mamik, tiştanok û metelok in. Îsmail Taha Şahîn jî qala mamikan dike û dibêje: “Digotin van cure gotinan ‘**mamik**’ yan ‘**tiştik**’...”<sup>22</sup> Di berhevoeke zargotina zarokan de Mustafa Gazî jî ji bo navê mamikan, jêrenoteke wiha dibêje: “Ji mamikan re her wiha li hin deveran jî dibêjin; tiştanok, tiştik, têderxistinok, qinik, kelemamik.”<sup>23</sup>

**4. Metafor û Metonîmî di Mamikan de:** Bêguman di navbera folklor û ziman de têkiliyeke dualî heye. Bi taybetî ew keresteyên ku li ser hêma û metaforan ava dibin ji bo pêşxistina ziman an jî di texayul û jiyana rasteqîn a mirovan de ji bo dewlemendiya gotinan pir muhîm e. Metafor û metonîmî du rêbazên afirandina hêmayan e ku ew jî bi temamî gotinê xurt dikin. Ziman ji aliyê geşedana xwe û bikaranîna xwe ve dibe du pişk. Mamik bixwe jî di pişka duyem ango bi gotinê re eleqedar in. Derbarê van her du pişkên ziman de nêrîna yekem li ser lango/ziman e. Nêrîna duyem jî li ser parole/gotinê ye. Wek ku Murat Cankara jî gotî ji bo nêrîna duyem xebatên ekola Pragê û yên Roman

<sup>20</sup> Sedreddîn Nûreddîn Ebûbekr, *Berkotêki Metellî Folklorî Kurdî*, Wezaretê Rewşenbîrî Hikûmetî Herêmi Kurdistan, Hewlêr, 2005, r. 33.

<sup>21</sup> Mamoste Hacı Xalid Akreyî, *Hezar Metelok bo Mirovên Jîr û Kok*, Çapa Dûyê, Çapxaneya Şehab, Hewlêr, 2012, r. 5.

<sup>22</sup> Îsmail Taha Şahîn, *Mamikê Mino Mamanî*, Spîrêz, Duhok, 2011, r. 7.

<sup>23</sup> Mustafa Gazî, *Gurzek Ji Zargotina Zarokan; Dîsko Dîsko Danîno*, Enstîtûya Kelepora Kurdî, Weşanxaneya Aras, Silêmani, 2006, r. 11.

Jakobson wekî mînak tên nîşandayîn. Ew jî li ser geşedena ziman a dîrokî ranaweste, li ser bikaranîna ziman a di heyameke eşkere de radiweste.<sup>24</sup>

Li vir mijara ku me eleqeder dike ev e ku ji aliyê pêşxistin û geşedana ziman ve tesîra mamikan çi ye? Yanî em ê li ser hêla ziman a parole/gotinê bisekinin. Li gorî Cankara, metafor û metonîmî jî di vê beşê de derdikeve pêşberî me:

Tiştê ku di mamikê de tê pirsîn, gelo çawa tê ziman? Tiştê ku di mamikê de hatiye veşartin an jî tê xwestin ku bê dîtin, bi çi şiklî pêşkêşî me dike? Ger mamik ji hêlekê ve tişteki veşêre û ji hêla din ve jî hin delîlan nîşanî me bide û vê yekê bi zimanekî nerasterê pêşkeşî me bike û van her du rêbazan jî yanî (hem veşartin û hem jî bikaranîna şewaza nerasterê) bi saya ziman bike, wê çaxê ev wate jê derdikeve ku mamik û helbest pir zêde dişibin hev. Em ê jî ‘metafor’ û ‘metonîmî’yê wek zimanê avakar ê ‘veşartin’ û ‘şewaza nerasterê’ vekolin.<sup>25</sup>

Di fêrbûna axaftinê ya ziman de du pêkarên ku derdikevin pêş hene. Ev du pêkar di heman demê de bi hunerên metafor û metonîmiyê re jî têkildar in û di zimanzaniya binyadî de Ferdinand de Saussure ev li lîteraturê zêde kirine:

**Pevvekirin:** Her hêma ji hêmayên din diafire û dema ku di nav hêmayên din de cih bigire, hebûna xwe nîşan dide. Ev jî nîşan dide ku her xaleke zimanzaniyê hem di nav xwe de hem jî di nav sêwirandineke kompleks de barê pevgirêdanê hildigire. Di pevvekirinê de têgeh li ser bingeha ku dê bi hev ve bin, li rex hev rêz dibin. Di encama vê yekê de jî di ziman de tewera asoyî [horizontal axis] derdikeve holê. Di vir de peyv li rex hev rêz dibin û her peyv bi peyva beriya xwe ve dibe û zincîr ango hevokekê ava dikin. Metonîmî jî ev tişt bixwe ye.<sup>26</sup>

**Hilbijartin:** Ji nav du alternatîfan hilbijartinek e ku ev hilbijartin alternatîfên hev bin. Yanî ev tê wê maneyê ku yan mirov hêmayeke wek wê be yan jî hêmayeke ku ji wê cuda be, lê hêmaya cuda karibe bikeve şûna wê. Mîna ku ev hilbijartin wek du rûyên cuda yê pelekê bin. Hilbijartin jî aliyê zimanî yê tewera stûnî [vertical axis] ye. Hin têgehên ku ji nav wan hilbijartinek pêk were, heya astekê yan dişibin hev an jî li dij hev in. Ji nav komepeyvekê peyvek tê hilbijartin bi şertê ku ev peyv an bişibe peyva ku di şûnê de tê bikaranîn an jî xwedî maneyek li dij wê peyvê be. Metafor jî ev yek bixwe ye.<sup>27</sup> Di mamikan de jî em herî zêde aliyê ziman ê metaforîk dibînin. Çimkî hem veşartin heye hem jî delîl di nav mamikan de dihevin. Di vir de jî barê herî giran li ser pişt a ziman dimîne. Yanî divê hem nîşan nede hem jî meraq û cezbekê ji bo balkişandinê ava bike û vê yekê jî bi bêje û têgehan bîne der. Em ê niha sê mamikan ji vê hêlê ve binirxînin:

<sup>24</sup> Murat Cankara, “Metafor Yaratma Eylemi Olarak Bilmece”, *Millî Folklor Dergisi*, j. 55, r. 72.

<sup>25</sup> h.b, r. 71.

<sup>26</sup> h.b, r. 72-73.

<sup>27</sup> h.c.



Şiva ter, gilover, ew çi ye?  
(Cefîlê. O, Cefîlê. C: 421)

Mamika yekem ev e û bersiva wê jî **mar** e. Peyvên *ter* û *gilover* ji aliyê qafiyê ve hêzê didine mamikê ku ev yek jî tameke helbestê diafirîne. Di vê mamikê de tiştê ku metaforê diafirîne jî *şiv* û *mar* in. Çimkî di vir de *şiv* di şûna *mar* de hatiye bikaranîn û di navbera wan de teşbîhek hatiye çê kirin. Ji ber ku *şiv* hem dirêj e hem jî wek *mar* zirav e, ji aliyê şibandinê ve di cih de ye. Lê belê ev jî têrê nake û mamik îcar li cureyekî *şivê* yê ku herî zêde dişibe *mar* digere ku ew jî *ter* e. Çimkî *mar* jî bê hestî û nermik in. Hê jî pê de diçe û delîlên xwe zêde dike ku ew jî hem taybetiyeke sereke ya *mar* e hem jî ya tiştên nerm û *ter* in ku ew jî dikare bê tewandin. Ango giloverbûn e. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku di vê mamikê de **şiv** metafora **mar** e ku di şûnê de hatiye bikaranîn.

Tûj e weke şûr, xweş e weke bilûr?  
(Güneş. K: 129)

Di vê mamikê de em mecaz, dijayetî û metaforê bi hev re dibînin. Bersiva vê mamikê jî **ziman** e. Ev mamik jî dîsa ji aliyê muzîkalîteyê ve bi hêz e. Metafora vê mamikê jî di navbera *şûr-bilûr* û *ziman* de ye. Helbet di vir de teşbîheke fîzîkî tune ye lê belê mecazî heye ku ew jî *şûr* di eslê xwe de ji bo parastin û êrîşê tê bikaranîn. Yanî teşbîha di vir de ji ber ku mecazî ye, di eynî demê de fonksiyonel e jî. Çimkî *ziman* jî ji bo parastin û êrîşê tê bikaranîn. *Bilûr* jî dîsa ji bo rahatîya can û ruhê mirov xwedî dengê *zîz* e ku ew jî ji aliyê fonksiyona xwe ya dengî ve şibiyaye *ziman*. Mecaza duyem a di mamikê de jî sifetên *tûj* û *xweş* in ku em jî dema ku qala *ziman* dikin, van her du sifetan pirî caran bi kar tînin. Dijayetiya di mamikê de jî di eslê xwe de bo temamkirina metaforê ye. Çimkî *ziman* ji du rewşên li dij hev pêk tê. Carinan *tûj* e û carinan jî *şirîn* û *xweşik* e. Yanî ji her duyan yek jî kêr bimîne dîsa metafor lawaz dibe. Ji ber wê em dibêjin ku di vir de *şûr* û *bilûr* di vê mamikê de metafora *ziman* e.

Ser e mişarû, pê xeparû.  
(Berwarî. M: 38)

Bersiva wê **dîkil/dîk** e. Di vê mamikê de du metafor hene û ji bo çareserkirina bersivê jî hewcedarî bi van her du metaforan heye. Çimkî ji metaforan yek *mişar* e ku ev serê dîkilê îşaret dike, metafora din jî *xepar* e ku ew jî pêyên dîkilê îşaret dike. Metafora tam a ku dîkilê li ber çavên me zindî dike, ji her du metaforan pêk tê. Ev yek jî bi xwe re metonomiyê çê dike. Çimkî ne *mişar* ne jî *xepar* bi tenê serê xwe nikarin bersivê îzah bikin. Lê dema ku perçe di şûna tevahiyê de tê bikaranîn anga pêşî *mişar* yanî serî piştê jî *xepar* yanî pê derketin holê êdî mirov ji van her duyan metaforê ava dike. Yanî **serekî mişar + pêyên xepar = dîkil**.

**5. Çawaniya Hêmayan di Mamikên Kurdî de:** Di vegotinê de leyistina bi *ziman* afirandina hêmayan e. Vebêjer dema ku meseleyekê vedibêje sembolan bi



kar tîne, di navbera têgehên de şibandinan çê dibe û bi wî şiklî bi nav dibe û her wiha carinan meqsêda xwe rasterast nabêje lê bi awayekî nîvveşartî tîne ziman. Di ziman de ev rewş jî bo afirandina zimanekî hêmayî ye. Carinan ev hêma bi peyvên xweş çê dibin, carinan jî bi peyvên nexweş û nelihevhatî çê dibin. Li gorî van peyvên çawaniya hêmayan jî derdikeve holê. Karademîr derbarê hêmayên îdeal de wiha dibêje: “Hêmayên îdeal, heyînan ne bi awayekî giştî diguherîne û nenas dihêle ne jî di derbê de eşkere dibe.”<sup>28</sup> Di mamikên kurdî de jî ev rewş bi durustî dixuye. Dema ku mamikbêj mamikê dipirse ne bi tamamî bersivê vedişêre ne jî dide dest. Bi awayekî hunerî dihene û li gor estetîka zimanê xwe kinçekî li peyvên dibe û jî muxatabê xwe dipirse.

Dem a ku mirov bala xwe dide mamikên kurdî mirov jî hêla çawaniyê ve bi awayekî giştî dikare qala sê cure hêmayan bike. Ev sê cure, hêmayên *xweşik*, *sik* û *beloq in*. Em ê niha di mamikên kurdî de bala xwe bidin van hêmayan û her yekê jî wan bi mînakên xurt bikin.

**5.1. Hêmayên Xweşik:** Heyînen di mamikan de bi alîkariya hêmayên xweşik dirûveke nazik, estetik, lihevhatî digirin. Şibandînen ku bi rêya van hêmayan çê dibin di çavên mirovan de heyînan xweşik dikin. Carinan dayik wek kaniya jiyanê, rehma dayîkê wek hêlîna kesrewan tê vegotin, carinan jî aqil wek taca zêrîn, çav wek morî û mercan, kew wek xatûnên çav bikil, tîrêj wek nûr û berf jî wek şekir tê pênasekirin:

**Kaniya jiyanê ye.**

**[Dayik]**, (Celîlê. O, Celîlê. C: 414)

Ne li erda ne li esman e, **hêlîna kesrewan e.**

**[Jina bihal]**, (Berwarî. M: 48)

Mamikê mino, ew **tacek zêrîn e**, li ser serê her kesekê nîne. Çi ye?

**[Aqil]**, (Sadinî. M.X: 14)

Wî lay pêjan, vî lay pêjan, di nav da **morî û mercan.**

**[Çav]**, (Berwarî. M: 46)

Ji vêrê heta Mûsil, hemî **xatûnên çav bikil.**

**[Kew]**, (Berwarî. M: 39)

Tiştêkî min heye, quncikê reş û tarî, **nûr** lê dibarî. Ev çi ye?

**[Tîrêj]**, (Alkan. A: 105)

Hewa re difire, perê wê tune, **dimîne/mîna şekir e**, tama wê tune.

**[Berf]**, (Güneş. K: 66)

<sup>28</sup> Fevzi Karademir, “Halk Bilmecelerindeki İmgesel Anlatım Üzerine” *Milli Folklor Dergisi*, sayı 78, 2008.

**5.2. Hêmayên Sik/Nerind:** Çawa ku di mamikan de hêmayên xweşik hebin wisa jî hêmayên sik hene. Di mamikên kurdî de gelek caran hêmayên sik bi peyvên wek qûn, kîr, gû û rêx hatine çêkirin. Mesela hingiv wek gûyê mêşan, lûlika misîn û kevçiyên çay wek kîr, dev wek axûr, mîde wek çala gû, mewîj wek pîreke qirmîçî, keç an jî qîz bi guhan û bekareta xwe ve tê pênasekirin:

Hêj **nehatî beran**, nêv **guhana** wê hinde.

[**Qîzik, keç**], (Gazî. M: 20)

Mamikê mino, **gûyê mêşan**, xwarina axan. Çi ye?

[**Hingivîn**], (Sadinî. M.X: 179)

Deyka te heru **qefteka kîra** dişut.

[**Kefçik**], (Berwarî. M: 66)

Babê mirî **kîrê rep**.

[**Mesîn**], (Berwarî. M: 62)

Mamikê mino, **pîra qirmîçî**, darik di **qûnê** da. Çi ye?

[**Mewîj**], (Sadinî. M. X: 100)

Serê aliman e, navtenga zahidan e, **gunêt bagîran** e.

[**Mêrî**], (Berwarî. M: 41)

Mamê te mam êlek, dest û tilî çerm êlek, daxdane **q.zê çêlek**.

[**Beq**], (Güneş. K: 94)

Parçekî nan da lawikê kumsor, lawikê kumsor da rêza esker, rêza esker avête **çala gû**.

[**Ziman, diran, mîde**], (Güneş. K: 101)

**5.3. Hêmayên Beloq:** Hêma di vegotinê de şêwazeke takekes e. Dibe ku li gorî kesan ji bo heman rewşê çêkirina hêmayan biguhere. Çimkî her kesek xwediyê paşxaneyêke cuda ye. Ji ber vê yekê jî nêrîna wan a li ser meseleyan û heyînan jî cuda ye. Di vegotinên gelêrî de û bi taybetî di mamikan de ev rewş xwe zêde dide der. Ji ber wê gelek caran hêmayên di mamikan de, ne standart in û dibe ku li gor deveran biguherin û carinan jî ji sînorên asayîbûnê dertên û digihêjine xerabatekê. Ev rewşa beloq a mamikan, li gorî Karademir bi sê awayan tê pênasekirin:<sup>29</sup>

- 1- Şibandînên di navbera hin heyberan de nelihevhatî ne û ev yek jî bi xwe re hêmayên çêkirî an jî ecêb diafirînin.
- 2- Ji bo heman heyberan hêmayên gelek cuda û pircûre tèn afirandînin ku ev jî beloqiyê derdixîne holê.

<sup>29</sup> Karademir, h.b.

3- Ji bo gelek heyberan bikaranîna heman hêmayê jî yek ji wan beloqyan e.

Li gorî vê dabeşkirina li jor hêmayên beloq parî sê sernavan dibin ku me li jêr her sernavek bi mînanan vegotiye.

**5.3.1. Hêmayên Çêkirî/Neasayî:** Di mamikan de hêmayên temsîlî pir in û di wan de mamikên ji bo *mirinê* hêmaya *kerê beqala*, ji bo *kêçan* hêmaya *hespê*, ji bo *lempeyê* hêmaya *birkê* tê bikaranîn.

Ez çûme bi rê da, birkeka di rê da, marekê tê da, çûçkeka di devî da, ew mar bi wê avê dijît, ew çûçik bi marî dijît.

**[Lempe/çira-Momik-Fanos-Lox]**, (Berwarî. M, r. 65)

Di navbera “lempe” û “birk”ê de şibandineke sembolîk heye. Lê têkiliya mar û çûçikê û şibandina wan a bi tîfika di nav lempeyê de şibandineke ne asayî ye. Gelek caran ev neasayî wek ku radana ji vir heta Bexdayê bi kulav û doşekê ji bo *berfê* hatibe bikaranîn an jî *bangeran* wek kerê ku kayê dixwe tê pênasekirin:

Tiştêkî min heye, ji vir heta Bexdayê, kulav û doşek radayê.  
Ev çi ye?

**[Erd û berf]**, (Alkan. A: 106)

Mamikê mino, kero kero, kayê dikem bero, hêdî hêdî dibêmê wero. Çi ye?

**[Bangeran]**, (Sadinî. M.X: 21)

Carinan jî hêma çêkirî dixuyên û teşbîhên di nav mamikan de bê eleqe ne. Mesela ji bo mirîşk û çêlikên wê hêmaya xûşk û dergûşê bi kar anîye. Lê di destê xûşkê de çil dergûş çêkirî maye.

Xûşka min a xoristan, çil dergoş di destan, ne ber heye ne bistan.

**[Mirîşk û çêlik]**, (Berwarî. M: 39)

Bîrek heye, tê de du cure av heye.

**[Hêk]**, (Güneş. K: 33) Di bîrekê de hebûna du cure av jî hêmayeke çêkirî ye.

Serî rêx binî rêx, jê dertê xwarina şêx. Ev çi ye?

**[Hingiv]**, (Kan. Ş: 26)

Ji rêxê derxistina xwarina şêx ji bo hingivê hêmayeke çêkirî ye.

**5.3.2. Hêmayên Guhêrbar:** Ji bo heman heyberî hêmayên ku tên afirandin bi awayekî pircure diguherin. Ev yeka jî pêkareke hêmayên beloqbûyî ne. Di vê mînaka jêr de nivîsên ku stûr hatine nîşankirin ji bo “*Jûjî/Jîjo*”yê hatine nivîsîn.

...**mamê mişt** ji wê ve tê ... (Berwarî. M: 36), **Feqîrek** têt ji deştê... (Berwarî. M: 36), **Kalo** tê ji deştê... (Berwarî. M: 36), **Kumê gup**... (Berwarî. M: 36), **Hebanoka bi**

**derzî**...(Berwarî. M: 36), ...min dît **sûfîkê** jû ve tê...(Gazî. M: 18), ...**dapîr** têtin ji deştê...(Sadî. M.X: 165), zehf **kalekî hilhilî**...(Güneş. K: 137).

Carinan jî ji bo hêmayên heman heyberî ji aliyê çawanî û çendaniyê ve jî guherîn pêk tên. Mesela di mînaka jêr de hêmayên ku ji bo “*hêk*”ê hatine afirandin hem ji aliyê çendaniyê ve hem jî ji aliyê reng ve guherîn peyda dibin:

Xalê min Emer e, **sê kurtekên** di ber e, **du sipî** ne **êkê zer** e.  
[**Hêk**], (Berwarî. M: 9)

Emer e Emer e, **sê pêstê sipî** yê li ber e, **êkê zer** e.  
[**Hêk**], (Berwarî. M: 59)

**Bûzê** dişkênim, **zîv** derdikeve, **zîv** dişkênim, **zêr** derdikeve.  
Ew çi ye?  
[**Hêk**], (Celîlê. O, Celîlê. C: 416)

**5.3.3. Hêmayên Pirbersivî:** Di mamikên kurdî de carinan hêmayek ji bo çend tiştên cuda tê vegotin. Di mînakên jêr de hêmayên wek “*kumkê sorik*”, “*morik*”, “*garis*” ji bo “*hêjîr*” û “*hinar*”ê hatine bikaranîn.

Tiştêkî min heye, **kumkê sorik** tije **morik**. Ev çi ye?  
[**Hejîr**], (Alkan. A: 84)

Kumê sorik, tijî morik.  
[**Hinar**], (Berwarî. M: 51)

Oda Haris, tejî **garis**.  
[**Hinar**], (Güneş. K: 101)

Tendûra risrisî, tije nanê **garisî**.  
[**Hêjîr**], (Gazî. M: 31)

Her wiha ji bo “*sivore*”, “*kêvrûşk*” û “*mişk*”ê jî heman hêma hatine bikaranîn:

**Ser gelgel e, bin gelgel e, çav zîqa, simbêl bel e.**  
[**Kêvrûşk**], (Berwarî. M: 35)

Hel helo, bel belo, **simêl belo**, sim simî, dîwar simî. Ew çi ye?  
[**Mişk**], (Celîlê. O, Celîlê. C: 420)

**Ser gelgele, bin gelgele, çav zîq û simbêl bel e.**  
[**Sivûrî, sivore**], (Gazî. M: 27)

Heta li vir ji aliyê çawanî ve mamikên kurdî hatin tehlîlkirin, ji aliyê çendanî ve jî mamikên kurdî dikarin bêt tehlîlkirin ku me li jêr qala wan kiriye.

**6. Çendaniya Hêmayan di Mamikên Kurdî de:** Mamik ji aliyê teşeyê ve dibin du pişk. Yek jê her çiqas kêmbin jî mamikên pexşankî ne ku em di van

mamikan de pîrî caran bi tenê hêmayekê dibînin. Pişka duyem jî mamikên helbestkî ne ku ku em di van cure mamikan de ji yekê pirtir hêma dibînin. Di mamikên helbestkî de yên ku ji du malikan pêk tên herî kêma du hêmayan di xwe de dihewînin. Her wiha mamikên ji sê, çar an jî pênc malikan pêk tên li gorî wê hejmara hêmayên wan jî zêde dibin. Ji ber vê yekê mirov çendaniya hêmayan di mamikên kurdî de dikare bike du pişk: *Mamikên yekhêmayî û mamikên pîrhêmayî*.

**6.1. Mamikên Yekhêmayî:** Ev cure mamik li gorî mamikên pîrhêmayî kêma in. Sedema kêmbûna wan yek jê di şayesandina tiştêkî de zehmet e ku mirov bi yek hêmayî bi ser keve û ya duyem jî dibe ku ji bersivekê zahfir bersivên wê peyda bin ku ev yek ne tenê di mamikên yekhêmayî de di mamikên pîrhêmayî de jî dibe ku bê dîtin.

Dinê da şekir şîrîntir e.

[Xew], (Celîlê. O, Celîlê. C: 411)

Mamikê mino, diçim naçim nagîjimê.

[Sî], (Gazî. M: 25)

Hindî bibirî kata ji xwe didet.

[Mû/pîrç], (Berwarî. M: 47)

Şivtarok li beyarok.

[Mar], (Kan. Ş: 6)

Mamikê mino, hakimê li ber dîwara. Çi ye?

[Dîk], (Sadî. M.X: 43)

Distarokê bi kevlî ve.

[Dûngê pezê sipî/dûv], (Berwarî. M: 43)

Li bin erdî pata dîkit.

[Pîvaz], (Berwarî. M: 52)

Heft ga kapkî ve.

[Kundir], (Gazî. M: 19)

Tenûrka êk kade.

[Bahîv], (Berwarî. M: 54)

**6.2. Mamikên Pîrhêmayî:** Di mamikên kurdî de ev cure mamik zêdetir dixuyên. Hêmayên ku di mamikan de têne der taybetmendiyên bersiva mamikê ango tiştê veşartî sembolîze dikin. Di mamika; *Du rîsê giya, li piştê çiya*. [Kezî], (Güneş. K: 49) de hêmaya “*du rîsê giya*” ji bo keziyên mirovan hatiye sembolîzekirin û ji ber ku keziyên mirovan pîranî li pişt serê mirovan in û hêmayeke alîkar “*li pişt çiya*” hatiye bikaranîn. Mîna vê mînakê çend mînakên

din ên mamikên pirhêmayî wiha ne. Di van mamikan de nivîsên **stûr** hêmayan nîşan dide:

Mamikê mino, **dayik asin bab ber** e, jê diçît **gurya zer** e. Çi ye?  
[Çeqmaq], (Sadinî. M.X: 165)

Tiştêkî min heye, **binî behr** e, **serî agir** e. Çi ye?  
[Lembe], (Sadinî. M.X: 218)

**Sênika mircanan**, li **serê banan**.  
[Sitêr], (Berwarî. M: 77)

Tiştêkî min heye, **teşteq mast**, li **derek rast**. Ev çi ye?  
[Hîv], (Alkan. A: 75)

**Konekî min** heye ser stûnekî, **heştê hezar kitêb bin kon da**. Ew çi ye?  
[Karî], (Celîlê. O, Celîlê. C: 416)

Di kurdî de mamikên ku bi tenê ji hêmayekê pêk tên bi piranî pexşankî ne wek ku di mînakên jor de jî xuya bûn. Mamikên pirhêmayî jî bi piranî li gor qafiye û mûzikekê yanî helbestkî hatine nivîsandin.

## 7. Bikaranîna Hêmayên Sereke di Sêwirandin û Danasîna Heyberan de:

Hêma ji bo zimanekî her tişt nebe jî reng û rewş, xeml û bejna wî zimanî ye. Bi tenê ne qodên gramerê dikarin zimanekî biafirînin ne jî peyv bi serê xwe. Wextê ku ev qodên rêzimanê û peyv tên li cem hev û wê çaxê dirûvek derdikeve holê û bi alîkariya aqil jî ew vediguhere hebûneke ku navê wê jî ziman e. Ji ber vê yekê ye ku hin teorîsyenên ziman lêkolane ka gelo di hişê mirovî de manegirtina têgehane çawa çê dibe? Di vê bareyê de Vygotsky wiha dibêje: “Mirov tenê peyvan ji ber bike û têkiliyekê di navbera wan û heyberan de çê bike, ji bo ku têgehek derkeve holê têrê nake. Ji ber vê, berî ku meriv peyvan ji ber bike divê pirsgerêkek hebe ku mirov ji bo çareserkirina wê, serê xwe biêşîne û li gorî wê kontekstê li çareseriyekê bigere.”<sup>30</sup> Dîsa di heman pirtûkê de Vygotsky ji Paulhan gotinekê neqil dike û wiha dibêje: “Peyvek hesa [duyûm] xwe ji wê hevoka ku tê de derbas dibe, digire. Ew hevok ji paragrafê, paragraf ji pirtûkê, pirtûk ji nivîskar digire.”<sup>31</sup>

Yanî em dikarin bibêjin ku hem bê peyv nabe hem jî tenê bi peyvan çê nabe. Ji ber wê dema ku di mamikên kurdî de qala “keç, kiç, qîz”ê dibe di nav kîjan konseptê de çawa û bi kîjan hêmayan danasîna wê tê kirin, ji bo fahmkirin û

<sup>30</sup> L.S. Vygotsky, *Düşünce ve Dil*, r. 87

<sup>31</sup> h.b, r. 207

bidestxistina wê hêmayê rêbazeke pir muhîm e. Em vê yekê bi têra xwe di mamikên kurdî de dibînin ku ev yek di tabloya li jêr de hatine rêzkirin.<sup>32</sup>

**Hêmayên Sereke yên ji bo Sêwirandin û Şayesandina Heyberan di Mamikên Kurdî de**

<b>NAVÊN HEYBERAN</b>	<b>HÊMAYÊN SEREKE YÊN KU DI SÊWIRANDIN Û DANASINA HEYBERAN DE HATINE BIKARANIN</b>
<b>Keç, keçik, dot, qîzik, kiç</b>	Tirî, bitam, xelk, helal, xwedan, heram, teyr, hêlîna xwe, firîn, hesp, danîn, delala dê, nêrî, gan, guhan, nehatî beran, morîka qul, belendîr, zayîn, çavê herkesî, qismet.
<b>Jina bihemle, kulfeta hemle, jina bihal, hemle, jina bi ducana</b>	Hêlîn, tav, sîya êvarê, qûtîka Silêmanî, Xwedê, zanîn, sindirûka Silêmanî, erd, esman, behr, mirin, vilevil, buxçik, kundir, daliqandî, çav, beliqandî, qûç, neh, mezal, sindoqa Silêman.
<b>Çav</b>	Du gol, reş û hişîn, pencere, bêderî, şev, girtî, roj, vekirî, spî, reş, tîj, têrnebûn, odeyek, cotek qazî, kanî, morî û mercan, dîtin, hêlîn, nîvek, beroj, nizar, stêrik, çirûsîn, derî, birûsk, birû û bisk, xuşkên cînar, bawer, gûlên geş, reqisîn, çilmisîn, kulekêd bêderî, perçîn, kewa gogerçîn, çira, mû, diherike, dihetike, mijang, rondik, nîsk, tarî, çilê Fatma nebiya, fêxistî.
<b>Ziman, ezman</b>	Mal, şirîn, tal, ciwan, kal, şûr, mertal, şirîn, şekir, jehr, bilbilek, rûniştî, hingivîn, gayê sor, gelî, girêdayî, dost, dijmin, topek qumaş, şûrekî şîn, seyekî har, lawikê kumsor, tazî, nayê xwarin, sersork, ga, neyar, heval, serberdayî, qazikê qûnxwar, zilindar, bilûr.
<b>Mêşa hingiv/hingivîn</b>	Gû, derman, nexweş, teyr, totik, pahtin, bizna kal, doşandin, firotin, sed mêr, stran, mirîşk, kepir, zîrç, şekir, nizar, nalîn, deng, dangan, tewş û tirar, behr, bênder, vizeviz.
<b>Morî, gêrik, mûristang, mêrî, mûrî, mêwî</b>	Ker, hêstir, bar, qalib, mezin, navtengbestî, goşt, hestî, qulek, keriyekî pez, gom, sed hezar pez, rêz, fêz, ser, ûr, hêstira qero, gur, xwarin, diz, birin, pezê hemeşîn, keriyekê pez, lez.
<b>Mişk</b>	Bazdayîn, quncik, simbêl tîj, guh belîk, hel hel, bel bel, çindik, du dest, du pê, mal, kun, dûv rût.
<b>Kêvrîşk, kêroşk, kêwrûşk, kêroşk</b>	Lotik, qendêr, şaxê bizina, guhêt kera, pêt gurga, çav, zîq, deşt, ber, hevraz, berjêr, tirs, tajî, razan, devî, terîsork.
<b>Kûsî, kîsel, kusî, şevlatûk, kosî, kêsûle, kûsele, kosele, kîso</b>	Çolî, xwarin, kar, mişk, mar, çulixur, text, kalekî bêbext, xiştanok, giya, çerm û çîqal, mû, dûv, pîr, goştê jar, çêrîn, dizelit, hêk, dep, dar, kun, xişik, çar çemil, sofîk, ferşik, pişt, hûs, qulûz, kevir, hişkin, req, stûqaqîçk, çarçeng, kulav, tûtik.
<b>Mar, mer</b>	Qûn, nîvek, şiv, terr, guher, xar, bin, dîwar, zil, dîn, îman, ber, piştok, gilover, çerm, mû, qesas, bazin, nal, tizbî, asin, sar, devî, teşik, meşîn, bêling, xuyakirin, zûrîn, werîs, beyar.

<sup>32</sup> Ev tablo li gorî mamikên di teza min a mastirê de, hatiye amadekirin. Di nav 2500 mamikên kurdî de heyberên ku herî zêde cih girtine, di tabloyê de ne. Bnr. Kenan Subaşî, h.b. r. 213-218.

<b>Pişîk, kitîk, pisîng, pisîk</b>	Rih, simbêlbel, pişo, kela, taq, doşek, nir nir.
<b>Kûçîk, se</b>	Belek, beyar, av, vexwarin, çelp çelp, çar ling.
<b>Masî, mesî</b>	Sîng, şêr, çav, mar, dirinde, av, pêlewan, bajayî, bêcan, şimşedarî, bêdest, bêling, avjenî, şop, toz, qemçîk, hesp, bask, teyr, reşahî, derya, dûv, çem.
<b>Mirîşk</b>	Dergoş, hundur, mal, xatûn, çilkezî, bezîn, rûto, pûrto, diçîze, şîr, pizdan.
<b>Kew</b>	Lawik, çav, bikil, xatûn, kendal, bezîn, dengbêj, dengzelal, qewm, neyar, stran, pal, dezî, ling, hewar û gazî, nikul, dixwîne, mela, aşîq, gewende, dijmin, xelk û alem, çavkil, çem, fedî.
<b>Beq</b>	Îr, eyar, mû, guvaştin, çerm, çîqal, dûv, çar dest û pê, panzdeh ro, qulîpançî, zirçine, avjen, nameşe, kevil, pirç.
<b>Guhan, çiçîk</b>	Çar, çêlek, heşt, dêlik, çeç, maçeç, fitefelek, xeraş, pêş, paş, tîr, avêtin, av.
<b>Hêstir, qantir</b>	Rez, bêber, dê, hîr hîr, bav, zirr zirr, kur, zir, mezintir, bilindtir.
<b>Hirç</b>	Beroj, tirs, nizar, birs, qewet, nawergere.
<b>Hinar</b>	Dîzik, dindik, riştin, simê ga, birincê qutay, kumê sorik, morik, hezar, lihêf, himban, dan, xwê, savar, quliya darê, sed, tolkirin, rêtin, dikan, hebek, hezar heb, qazan, qesreke bêderî, denû, gilorkirin, nexweş, ta girtin, serê darê, lib lib, sûk, mal, kûpîk, mircan, taliqandî, gulok, sênî, guliya darê, buhar, gîrek, kirîn, kasik, çiqê darê, çil heb, melez, çil tax, çil ortax, çil miştax, gelek, tejî, garis, ode, rûniştin, bînder.
<b>Zebeş, şitî</b>	Kevz, av, zayîn, behr, şîn, masî, reş, sur, zingîr, beş, dindik, reş, hûrkin, beş, tam, xweş, bajêr, dîwar, kilîk, asin, dûv, terr, av, golik, kap, kesk, mifte, qesra şîn, bêderî, gov, mihên qer, kulîlk, kanî, fistaneksk, kirassor, bijkojreş, bazin, newal, ber, pişt, xwîn.
<b>Pîvaz</b>	Spî, şîn, heftê, cilo, heft qat, şaşîk, bin erdî, pat, gok, sor, çerm, spî, gilovero, eyar, zer, tas, sibe, xwarin, nîvro, heval, êvar, neyar, seyîd, mela, sofî, serjêkirin, girîn, çil çîk, çil berçîk, çil ode, çil kilîle, bayê qul, telîs.
<b>Kulind, kundir</b>	Qelaw, kap, zexel, mexel, beyn, kun, Xwedê, avdayîn, çêl, golik, nivistin, veristin, helan, dîngên beranekî, kab, av, sing
<b>Genim, genimok</b>	Dar, şîrîn, gulî, zêrîn, binî, ax, nav, şax, serî, zêr, deşt, kok, erd, ker, por, gîjik, qirşîk, kesk, tîrojîk, spî, reş.
<b>Kîvark, karî, kifkarîk, kidadîk, karûk, feqîroşk, kavkelîk, kalkevîk, kuvarek, karok</b>	Quran, xwendin, xwarin, goşt, hêsk, kitêb, hûr, kon, stûn, ser, spî, pê, pan, gelî, fotir, gom, lingê kewê, perê Quranê, kal, pal, dewsa qûnê, kaxiz.
<b>Gûz, gwîz, goz</b>	Tenûr, nan, genimî, du, kade, qesr, begzade, rûniştî, ode, feqe, kum, dîzik, tije, ard, kêrg, tendûra dadayî, nanê badayî, şûştî, sindoq, daliqandî, çantik, jehr, şekir, şîrîn, tahl, sêv, biçûk, dûvê mihan, birûn, kilor, mizgeft, maliştî, bêderî.



<b>Mewîj, mêwîj</b>	Kurî, jêkirin, şax, bab, şîrîn, kur, nevî, dîn, şîn, şîrîn, har û dîn, pîr, qermeçî, qirş, qûn, darik, boç.
<b>Hêk</b>	Kolav, dersok, sê kurtek, du spî, êk zer, du av, tirar, qesra spî, bêderî, xanî, qube, bêkutek, law, zer, reng, av, şemitîn, gilovir, pencer, pêst, qutik, şilq, avkên bana, rûto, pûrto, pê, panî, cêr, zîv, cirn, aşkî bêderî, bêserî, bêberî, şikestin, kiras, teht, şil û şeht, sor, şil, zuha, ter, hişk, xwê, kelandin, mal, hundur, esmer, kulek, perde, bîr, çavbeloq, şor, bêqul, avis, sor.
<b>Hingiv, hingivîn</b>	Şêrîno, darîno, dermanê nexweşan, gûyê mêşan, xwarina axan, rêx, xwarina şêx.
<b>Tifeng, tiving, tiveng, tifing</b>	Jur, jêhêl, ber, dest, ketin, lingek, şer, orîn, pişkûl, firîn, zirrîn, marê mirî, qûn, dev, dirêj, xwîn, deng, bêrûh, mirî, dû, kûr, dûr, mirî, dar û bist, tir, serdirêj, qûnqelêş, beravêtin, marê mirî, kûrka tarî, agir, barîn, mist, bejna bûkan, hêka çûkan, bizmar, kutan, enirîn, fişqî, tilî, qul.
<b>Lempe, çira, momik, fanos, lox, lemp, lambe</b>	Tilî, tarî, xanî, ron, biçûk, tijî, ode, refik, defik, ser, zêr, behrek av, Mar, teyr, pir, birk, av, zayîn, marê mirî, teyrê zêrî, taca zêrî, av, kap, ro, betilîn, şev, xemilîn, nûr, gul, bîr, werîs, lem, kef, marezerk, steyr, mewîj, bûk, pepûk, ser, minare, nav, cehneme, carîye, xatûn, çalik, sorê qiyametê, elamet, agir, biriqîn, eywan, şuştî.
<b>Kefçik, kevçî, kevçik</b>	Reprepîsk, qefteka kîran, şuştin, bar, çûn, şkeft, hundir, gewde, derve, poçik, aş, dest û gunnê ereban, şemitîn, ketin, girtin, axir, dox, kurrî, qewd, şîşik, qulik, baxek çavik.
<b>Bagurdan, pangor, bangeran, bangur, loq, gindor, lox, banger</b>	Dû, zivistan, bişol, havîn, betal, du qîno, pê, pan, ban, hevsar zero, şilq, kat, çîzevîz, teqereq, guregur, bezîn, du kezî, kudîn, misînîko, sewt, ka, xiştexîşt, ber, pişt, şimîn, darqûn, girovero, xanî, bêpê, tij, didan, mela, du şaşik, atûr, ezab, axa, hawar û gazî.
<b>Cerîfk, sivnik, çitîk, gêzî, carût, melkez, gêzik, milkis</b>	Rih, dirêj, xişt, pişt, venekirin, simsimo, piştê derî, rûniştin, pişt, girêdayî, quncik, girêbest, tijî dest, şev, xatûn, roj, qewraş, qefkî pûş, destmal, bûk, nava malê.
<b>Pêlav, sol, şekal, îkapet, qundire, qeqebik</b>	Kew, gerandin, bar, ker, lat, tevdan, welat, girêdan, çûn, vekirin, sekinîn, hul, dol, ro, êvar, dev, vekirî, goşt, dayîn, meşîn, pê, qul, asin, bezîn, qam, zincîr, barê gamêşê, razan.
<b>Pênûs, qelem</b>	Mele, aqilmend, ruh, bin, çûn, ximav û xar, lastîk, dar, tilî, kaxez, tîp, rêz, bidev, bêziman, bêfîkr, bêraman, zanîn, nikil.
<b>Nivîn, mavling, cihnivîn, kulîn</b>	Şev, bûk, roj, pepûk, danîn, hilanîn, cêrî, xatûn, xemilîn, kemilîn, ûr, pehn.
<b>Quran</b>	Çil taq, çil bertaq, çil ode, sê derge, sê hucre, çil, derp, derpîç, xolam, xecîc, pel, dismal, şîr û şekir, zeviya spî, tovê reş.
<b>Aş</b>	Tijî, têr, dirît, gîskê gorrî, tebeqe, kon, qûn, li ser, av, rûbar, diz, birin, gur, xwarin, sindorîk, kilîl, hespê boz, afîrê quloz, sor, spî, li ber, çem, şev, bûk, roj, pepûk, xwelî, jêhatî, teqoreqo, devê avê, nirrî, maydan, toz, stûn, naşêkire.

<b>Kon, xîvet, kun</b>	Dûr, ga, nêzik, çiya, mûyê karan, dar, nivistin, rabûn, pêçandin, girêdan, werîs, mexilîn, reş, pirçik, xanî, bêdîwar, stûn, karîte, biban, bêax, çar, çepin.
<b>Av</b>	Werz, têr, korî, badan, bûrr bûrr, çûn, şuştin, dijmin, agir, dar, bizmar, ranegirtin, xar, kişîn, nasekine, spî, tazî, bêling, meşîn, şiyar, ranazê, şev û roj, westan, bezîn, gihiştin, zûwa.
<b>Gemî, keştî</b>	Erd, esman, hêlîn, betrewan, hefsar, dest, însan, zincîr, gol, çûn, rê, rêç, toz, bilez.
<b>Bilûr, bilûl</b>	Qevdek mû, keyf, dîwan, qirik, bêziman, bidev, bêdiran, lorandin, dar, hişkê gûz, deng, bandor, zîz.
<b>Def</b>	Serî, çerm, binî, dar, çirtik çilûrî, bizmar, kutan, deng, bêdev, bêdiran, bêkinc, eyar, dawet, ban, lêxistin, gopal, dizire.
<b>Sal</b>	Dozdeh ta, çar bira, çar diyar, germ, hênik, şilî, sar, dergih, 12 kilîl, sêsîd û şêst, reş, belek.
<b>Hîv, heyv, hîva nîvî</b>	Tas, mast, guhar, rast, bazin, şewq, hespê belek, xelek, meh, carek, kal dibe, dimire, dizê, kofî, newal, kerî, stêr, kum, gêrbûn, gol, teşt, totbûn, çiya, kezî, şev, şemal, zer, xwar, firîn, tûfî.
<b>Stêr, stêrk, stêrik, istêrek</b>	Gayên beş, mercan, helal û beybûn, sêvên sorgulî, sênîka mircanan, ban, êvar, çem, spêdê, tendûra zimzimî, roj, bûk, şev, pepûk, xemilîn, temirîn, dîzika daniya, qîzikên çavbikil, kofîya hişîn, hêkên neqşîn, vemirîn, vêketin, xûya, winda, çirîsk, agir, xwelî, hedimandin, ban, xiştan.
<b>Berf, befir</b>	Spî, şekir, difire, bêper, esman, ajotin, gayê kejo, şîr, barîn, deşt û banî, girt û danî, kulav, radan.

## ENCAM

Di vê gotarê de ji aliyê vegotinên hêmayî û metaforan ve em li ser taybetmendiyên mamikên kurdî rawestiyane. Piştî vê lekolinê em gihaştin van encaman:

Mamik ew curegotinên helbestkî ne û di xwe de taybetiyên heyberekî/ê vedîşêrin. Ji ber wê ye ku bi hêma û metaforan hatine sêwirandin.

Di mamikên kurdî de li gorî çawaniya hêmayan sê pişk derketine holê. Ev pişk wek *hêmayên xweşik*, *hêmayên sik* û *hêmayên beloq* dabeş bûne. Di nav van hêmayan de her çiqas şibandinên pir nêzik û serkeftî hebin jî gelek caran hêmayên ji hev dûr û lawaz jî hene.

Li gorî çendaniya hêmayan mamikên kurdî wek mamikên yekhêmayî û pirhêmayî dibin du pişk. Di mamikên hêmayî de gelek caran ew hêma bi tena serê xwe li beramberî bersivekê tenê nayê. Dibe ku di beramberî wê hêmayê de çend bersivên din jî biguncin. Mamikên pir hêmayî di şayesandina heyberên veşartî de zêdetir serkeftî ne. Lewra heybera veşartî mimkûn e ku ji çend aliyên xwe yên cuda ve bê pênasekirin.

Di mamikên kurdî de heyberek bi tena serê xwe di mamikên cuda de ji dehan zahftir bi hêmayên cuda hatine şayesandin. Lê ev heyber zêdetir ew heyber in ku di navenda jiyana mirovan de pir cih digirin.

### ÇAVKANI

- AKBAŞ, Emin: *Tiştonek 1*, Weşanên Yekîtiya Mamosteyên Kurd/YMK, Bremen, 2006.
- AKREYÎ, Mamoste Hacî Xalid: *Hezar Metelok bo Mirovên Jir û Kok: Çapa Dûyê*, Çapxaneya Şehab, Hewlêr, 2012.
- ALKAN, Abbas: *Çîrok û Jiyan*, Komal, Stenbol, 2004.
- ALPEREN, Altan: “Folklor ve Edebiyatın Unutulan Unsuru: Bilmeceler”, *Millî Folklor Dergisi*, j. 31-32.
- ARİSTOTELES, *Retorik*, (çev. Doğan Mehmet H.), Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 2001.
- AZAR, Birol: “Çocuk Eğitiminde Folklor/Halkbilimden Yararlanma Üzerine”, *Türk Xalkarı Edebiyatı (II): Beynelxalq Uşaq Edebiyatı Kongresi*, Qafqaz Üniversitesi, 2008.
- BALTA, Elif Emine: “Bilmecelerin Dil-Düşünme Bağlamında Eğitimdeki Yeri ve Önemi”, *Turkish Studies- International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 8/1 Winter, 2013.
- BAŞGÖZ, İlhan: “Türk Bilmecelerinin Fonksiyonları”, *Folklor Dođru*, j. 37, İstanbul, 1974.
- BEKKİ, Salahaddin: *Bilmeceler, Tabu ve Gizli Diller Üzerine*, Muzaffer Akkuş Armağanı, amd. Mücahit Akkuş ve Fatih Dinçer, Kömen Yayınları, Konya, 2013.
- BERWARÎ, Mahir: *Metelokanê*, Berhevkarî, Elmanya-Dortmund, 2009.
- BORATAV, Pertev Naili: *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Bilgesu Yayınları, Ankara, 2013.
- CANKARA, Murat: “Metafor Yaratma Eylemi Olarak Bilmeceler”, *Millî Folklor Dergisi*, j. 55.
- CELİL, Ordîxanê - CELİL, Celîlê: *Kurdîsky Folklor*, b. II. Moskova, 1978.
- EBUBEKR, Sedreddîn Nûreddîn: *Berkotêkî Metellî Folklorî Kurdî*, Wezaretê Rewşenbîrî Hikûmetî Herêmî Kurdistan, Hewlêr. 2005.
- GAZÎ, Mustafa: *Gurzek Ji Zargotina Zarokan; Dîsko Dîsko Danîno*, Enstîtûya Kelepora Kurdî, Weşanxaneya Aras, Silêmanî, 2006.
- GORGES, Robert A. - Alan Dundes: “Bilmecenin Yapısal Bir Tanımına Dođru”, *Folklor Dođru*, j. 37, İstanbul, 1974.
- GÜNEŞ, Kenan: *Mamikên Me*, Evrensel Basım Yayın, Stembol, 2013.

KAN, Şerif: *Berhevkirin û Tesnîfa Mamikên Kurdî*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez a

Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Mardîn, 2013.

KARADEMİR, Fevzi: “Halk Bilmecelerinin Oluşum ve Biçimlenmesindeki Etkenler

Üzerine”, *Akdaemik Bakış Dergisi*, j. 14, Celabat-Kirgizîstan, Nisan, 2008.

KARADEMİR, Fevzi. “Halk Bilmecelerindeki İmgesel Anlatım Üzerine” *Milli Folklor Dergisi*, sayı 78, 2008.

KARAKAŞ, Ayhan: “Ortak Anonim Türk Halk Edebiyatı Ürünlerinden Bilmecenin Çocuk Edebiyatına Katkıları”, *Türk Xalkarı Edebiyatı (II): Beynelxalq Uşaq Edebiyatı Kongresi*, Qafqaz Üniversitesi, 2008.

SADINÎ, M. Xalid: *Mamikên Kurmancî*, Nûbihar, Stenbol, 2011.

SUBAŞI, Kenan: “Ji Bo Zarokan Di Fêrkirina Kurdî de Rola Mamikan”, Zanîngeha Mardin Artuklu TYDE, Teza Lîsansa Bilind, Mardin. 2014.

ŞAHÎN, İsmâil Taha: *Mamikê Mino Mamanî*, Spîrêz, Duhok, 2011.

ÖNÜR, Aysun: “Türkçe Öğretiminde Bilmecenin Yeri ve Önemi”, *Gazi Üniversitesi Türkçe Araştırmaları Akademik Öğrenci Dergisi*, j.2.

VYGOTSKY, L.S.: *Düşünce ve Dil*, wer. S. Koray, Toplumsal Dönüşüm Yayınları, İstanbul, 1998.

#### **Çavkaniyên înternetê:**

ARTUN, Erman: *Ortak Türk Kültürü Ürünlerinin Çocuk Edebiyatına Katkıları*, [http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/erman\\_artun\\_ortak\\_turk\\_kulturu\\_cocuk\\_edebiyatina\\_katkilari.pdf](http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/erman_artun_ortak_turk_kulturu_cocuk_edebiyatina_katkilari.pdf) (15.09.2014).



## HACÎ QADIRÊ KOYÎ: SERENCEMA DÎWANA WÎ LI STEMBOLÊ Û HEVALTIYA WÎ BI KEYFÎ RE\*

Mesut ARSLAN\*\*

### KURTE

Di helbesta kurdî de pêşengê veguherînê Hacı Qadirê Koyî ye. Ji aliyê ruxsarî ve ferqa helbesta wî û ya helbestên klasîk nîne, lê mijarên wî êdî ne xeyal û metaforên klasîk in. Wî bi helbestên xwe yê nûjen ji nifşekî re mamostetiya kurdîtiyê kir. Di vê gotarê de pêşî em ê behsa fikriyata Koyî û tesîra wî ya li ser rewşenbîrên kurd bikin. Peyre jî em ê li Stembolê bikevine pey şopa dîwana wî: Çima çap nebû, çawa wînda bû? Ji bo fêmkirina jiyana Koyî ya li Stembolê em ê behsa helbestvan Keyfî (Fethulla Ciwanroyî) jî bikin ku rîya wî jî bi Stembolê ketibû û li vir bûbû destebirakê Koyî.

**Peyvên sereke:** Hacı Qadirê Koyî, Keyfî, Helbesta Kurdî, Kurdîti, Stembol.

### ABSTRACT

#### *“Hacı Qadirê Koyî: His Diwan’s Adventure in İstanbul and His Fellowship With Keyfî”*

The pioneer figure of change in Kurdish poetry is Hacı Qadirê Koyî. There are not much difference between his poems and classical poem on the terms of form. He acted out as a teacher of Kurdishness for a generation with his poems. In this article we will firstly mention Koyî’s thoughts and their effects on Kurdish intellectuals. Afterwards we will search for Koyî’s diwan in İstanbul; why not published, how disappeared? We will speak of a poet who lived in İstanbul in order to understand Koyî’s life story. This poet, Keyfî (Fethulla Ciwanroyî) was lived in İstanbul and he was a friend of Koyî.

**Key Words:** Hacı Qadirê Koyî, Keyfî, Kurdish Poem, Kurdism, İstanbul.

---

\* Ev nivîs cara pêşî di 23yê Gulana 2016an de, di çarçoveya konferansa bîranîna 200 saliya Hacı Qadirê Koyî ya “International Conferense The 200th Anniversary of the Birth of Haji Qadri Koyi 1816 – 2016” de, bi sernavê “Hacı Qadirê Koyî û Serencema Dîwana Wî Li Stembolê” li Zanîngeha Koye hat pêşkêşkirin.

\*\* Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Dicleyê, Enstîtuya Zanistên Civakî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî.  
[mesudserfiraz@gmail.com](mailto:mesudserfiraz@gmail.com).

## DESTPÊK

Ji dawîya sedsala 20an ve navê Hacî Qadirê Koyî li Kurdistanê belav bûye û rewşenbîr û aktivîstên kurd qiyemetek mezin dane şexsiyeta wî ya edebî û fikrî. Herekol Azîzan, yanî Celadet ‘Alî Bedirxan, di *Hawarê* de ji bo wî: “Hacî Qadirê Koyî Xaniyê didowan e. Ew jî weke Xanî bi derdê miletê xwe dişewitî. Şîhir û qesîdeyên wî tev de li ser milet û welêt in” (Cewerî, 1998:817) dibêje. Koyî hem pesnê Xanî û *Mem û Zînê* dide hem jî peyamên Xanî -li gor şertên nû yên cîhanê- vedibêje. Bi gotina Celadet, Xanî digot “bixwînin”; Koyî li gorî wextê xwe, bi ser ve zêde dikir û digot “bi awayê nû bixwînin” (Bedir-Khan, 1943:1).

Di hejmara 4an a *Hawarê* de helbesta Koyî ya “Xakî Cizîr û Botan” tê weşandin û yek ji nivîskarên *Hawarê* Hevindê Sorî Hacî Qadir wiha dide nasîn: “Hacî Qadir Koyî şairê qewmî, berz û bi qîmetî kurd e. Le salî 1232 [1816] h. [hicrî=koçî] le gundî Gorqerec nêzîkî Koysinceq hatuwete dinya, le paşan çûwete Estemûl û le wê mêwanî kuranî Bedir-Xan paşa buwe û le salî 1312 [1894] le wê wefatî kirduwe. Hacî Qadir yekemîn şair e ke helbestî qewmî û millî danawe û be we xerîkî wuşyarkirdinewey kurdan buwe û lapeday helbestî xeramî pêwe dawê.” (Cewerî, 1998a:492).

### 1. HACÎ QADIR LI STEMBOLE

Di teşegirtina fikriyata Koyî de cihekî mezin ê Stembolê heye. Vî bajarê paytexta siyasî û navenda çand û rewşenbîriyê Koyî jî guherand û di helbesta wî de rêyeke nû vekir. Koyî ku heta wî çaxî xezelên aşiqane vedigotin, êdî unsurên modernizmê diemilîne. Gava mirov helbestên wî yên pêşîn û yên paşîn dide ber hev ev yek eşkere xuya dike.

Serdema ku Koyî hate Stembolê, li nav Osmanî du ramanên xurt hebûn: Pan-îslamîzm û osmanîtî. Koyî berê xwe nedaye van herdu fikriyatan jî (Kanie, 2016). Li nav rewşenbîrên osmanî fikriyata ewrûpayî jî zêde rewac didît ku Koyî jî nêzî vê fikrê xuya dike. Ew dibêje dev ji tembeliyê, xurafeyan, şêxan berdîn; fenna Ewrûpayê gihaye asta î‘cazê ango mu‘cîzeyê:

Dexîlî şêx û mêx nebin ebeda

Hîç kesê rizqî hîç kesî nada

Ey xerîkî rimûz û naz û niyaz

Ewropa fennî geywete î‘caz

Qulleyî “Eyfel” le eflak e

‘Eksî ew gerdişî lê jêr xak e (Koyî, 2004:104).

Koyî îdareya Dewleta Osmanî, hakim, walî, wezîr, wekîl û memûrên wê rexne dike; behsa zilm û bertîl û diziyên wan dike.

Hakimî rêgirî me'mûre ye, qazîy dizî roj  
Wizera û wikelay gurg e, re'yyet gele ye

Zanî û şarîb û lotî degirin, walî dellê:  
Berî den parey xoy daye, çi 'eybêkî heye  
(Koyî, 2004:45).

Koyî di helbestên xwe de behsa kurdan û Kurdistanê dike. Helbesta wî ya “Xakî Cizîr û Botan” nimûneya vê ya herî xurt e. Ew pesnê hikimdarên Osmanî nade, wesfê hakimên kurdan dide: Wekî Selaheddîn, Azîzan (Bedirxanî) û Baban. Çimkî Koyî “kurdperwer, pêşverû û dewletxwaz” e (Alan, 2013:208). Koyî ji helbestvanê beriya xwe cuda ye. Ew têgehên welat, millet û dewlet bi maneyên nû bi kar tîne; qiymetekî mezin dide ziman û tarîxa kurdî. Ew di xezelên xwe de pesnê qehremanî, camêrî û ‘esîlbûna kurdan dide. Di dîwana wî de peyva kurd û Kurdistanê ji 70 carî zêdetir derbas dibe (Ghaderi, 2014:44-45). Loma em dikarin bibêjin ku ew nasyonalîstekî kurd e, lê ne tenê kulturî, ew nasyonalîstekî siyasî ye jî.

Çaxê ku Hacî Qadirê Koyî sax bû, kovar an rojnameyeke kurdan nebû ku tê de helbestên wî bîn weşandin. Lê wî bi xwe rola çapemeniyê fêhm kiribû û bi helbestên xwe pesnê wê dida.

Sed qa'ime û qesîde kes naykîrrê be pûlê  
Rozname û cerîde û kewtote qîmet û şan (Koyî, 2004:85).

Piştî mirina wî bi salekê yekemîn rojnameya kurdî *Kurdistan* (1898) tê weşandin. Di hejmara 3yan a vê rojnameyê de hem behsa mirina Koyî tê kirin hem jî cara pêşîn helbesteke Koyî tê çapkirin. Ew di vê helbestê de pesnê Ehmedê Xanî û *Mem û Zînê* dide:

Alimek ji Sora hebî. Sala dî wefat kir; rehmeta Xwedê lê be, Xwedê gunehên wî bixefirîne! Navê wî Hacî Ebdulqadir bî. Ev mirov saxîya xwe de gelek xebitî; derheqa elimandina ilm û marîfetê de gelek beyt û eş'arên Kurmancî dinivîsî, rêdikir welatê xwe Sora. Ezmanê wî ezmanê Sora ye. Loma Kurd hemî vî ezmanî nizanin. Piştî kitêba *Mem û Zînê* de bi xetê destê xwe hin beyt nivîsîne. Teberruken min ew ebyat li vê cerîdeyê de nivîsin. Wekî bi diqet bê xwendin, mana wan xweş têt famkirin:

Eman qedrî bizane em kitêbe  
Le dunya êstekey hemtay nemawe

Le eyyamî heyatî Şêxî Xanî  
Le ser nusxey xetî ew nûsirawe

Le lay erbabi xoy bo qedr û qîmet  
Xezîney gewher-w kîse diraw e

Le mecmûî duwel Soran û Botan

Le sayey em kitêbe nasirawe

Le Kurdan xeyrî Hacî-w Şêxî Xanî

Esasî nezmî Kurdî danenawe (Bozarslan, 1991:135-136).

Piştî rojnameya *Kurdistanê* bi gelek salan vê carê di kovara *Hawarê* de Herekol Azîzan vê helbestê diweşîne û vê anekdotê neql dike ku Koyî ev helbesta xwe li ser destxeta *Mem û Zîna* bavê wî (yanî Emîn ‘Alî Bedirxan) nivîsiye (Cewerî, 1998:817). Dîsa di *Hawarê* de di cihekî dî de Celadet vê helbestê diweşîne û li ser têkiliya Koyî ya bi Xanî û *Mem û Zînê* re wiha dibêje: “Rehmetî Hacî Evdilqadirê Koyî der heqê Memozînê digot: ‘Kitêba milletê me ye’ (...) Hacî perestîşkarê Xanî bû û xwe şagirtê wî dihesiband. Hacî di dîwana xwe de gelek çêl li Xanî kiriye. Efsûs ew dîwan ji bo îro windayî ye” (Cewerî, 1998:1025).

Koyî, bi helbestên xwe û fikrên xwe yê netewî di rojname û kovarên wekî *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd*, *Jîn û Têgeyiştinî Rastî* de jî derdikeve pêş û bandorek mezin li nişên wê serdemê dike. Xelîl Xeyalî, ku beriya Şerê Cîhanê yê Yekem yek ji pêşengên fikra kurdîtiyê bû, ji helbestên wî parçeyan di nav nivîsên xwe de diweşîne. Bê çawa Koyî hewariyê Xanî be, Xelîl Xeyalî jî şagirdê Koyî ye. Xeyalî, gava bangî mezinên kurdan dike, ku li Stembolê gihane meqamên mezin lê gelê xwe ji bîr kirine, Hacî Qadir wek numûne nîşanî wan dide û dibêje carekê berhemên wî bixwînin û bibin şopdarên wan, da ku milletê we le’netê li we neke; rehmetê li we bixwîne (Babê Naco, 1913:9). Mehmed Salih Bedirxan jî ji bo helbestên Xanî û Koyî dibêje; hewce ye her kurdek wan hifz bike, ji ber zanibe (*Rojî Kurd 1913*, 2013:192). Baban ‘Ebdulazîz, gava behsa rol û misyona edebiyatvanan dike, Hacî Qadirê Koyî wekî nimûne nîşan dide, ji ber ku ew di helbestên xwe de êş û derdê milletê xwe vedibêje, lê dîsa Baban ‘Ebdulazîz dibêje ku tenê ev xeyreta Koyî ne bes e, hewce ye helbestvanên din jî edebiyata xwe li ser vî esasî saz bikin (*Rojî Kurd 1913*, 2013:213).

## 2. DÎWANA HACÎ QADIR LI STEMBOLE

Berî ku dîwana Hacî Qadir bê weşandin gelek helbestên wî cara pêşîn di çapemeniya kurdî de hatin belavkirin û wan bandorek mezin li ser ciwan û rewşenbîrên kurd kir. Bi qasî ku em dizanin ji 1898an heta 1925an, di rojname û kovarên kurdî yê wekî *Kurdistan*, *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd*, *Jîn*, *Têgeyiştinî Rastî*, *Diyarî Kurdistan* û *Jiyanewe* de 19 helbestên wî hatine weşandin (Balekî, 2016:9-10). Lê em dizanin ku di taliya dewra Osmanî de kurdan dixwest dîwana wî wekî kitêb jî çap bikin. Ji nûçeyê rojnameya *Serbestîyê* em hîn dibin ku Kurd Ta‘mîm-i Ma‘arif ve Neşriyat Cem‘iyyeti [Komeleya Belavkirina Zanîna û Weşanê ya Kurd], li ser mecmûaya helbestan a “Xoce Qadir” ku sê hezar xezelên bibelaxet dihevine lêkolînek daye destpêkirin. Piştî tenzîm û tesnîfa wê, dê berhemê bişînine çapxaneyê. Di dewama nûçeyê de tê ragihandin ku Xoce Qadir ji helbestvanên kurd ên navdar û netewî ye. Ew bi helbestên xwe bûye



berdevkê hissiyata gel û di helbestên xwe de êş û elema kurdan vegotiye.<sup>1</sup> Ji van gotinan tê fêmkirin ku “Xoce Qadir”, Hacı Qadir e. Lê ew dîwana ku di nûçeyê de tê behskirin îro ne li ber dest e. Dibe ku ev xebata muhîm temam nebûbe yan jî di nav atmosfera tevlihev a wê demê de derfeta çapê nedîtibe (Serfiraz, 2015:66).

Herekol Azîzan bi xwe jî destxeta dîwana Koyî dîtiye, ew halo behsa wê dike: “Hacı dîwaneke mezin heye an hebû. Min dîwana wî dîtiye; bi destnîviseke hûr qederê 800 rûpel hebû. Hacı ji dîwana xwe du nisxe nivîsandi bûn; heke nisxeke wê tirkan şewitandiyê heye ko nusxa din rojekê bikeve destên me” (Cewerî, 1998:817).

Mehmed Emîn Zekî Beg (1988:293) û Ebdurrehman Seîd jî behsa destxeta dîwana Koyî dikin. Ew dibêjin ku Koyî, dîwana xwe li Stembolê ji bo çapê daye ‘Ebdurezaq Bedirxan, lê ji ber ku Îttihatçiyên/hikûmeta Ittihad û Tereqqî ew girtine û kuştine ev dîwan jî wînda bûye; heta li gorî Ebdurrehman Seîd dîwan hatiye şewitandin (1925:4-6 vgz. Yıldıırım, 2016:20).

Derbarê destxeta dîwana Koyî de Mûsa Anter jî agahiyek dide: Xelîl Xeyalî yê Modanî berî mirina xwe belgeyên xwe teslîmî Anterî dike. Di nav wan de dîwana Koyî ya destxet jî heye. Lê ev dîwan û hemû belge û kitêbên Anterî di 1972an de, di dewra cuntaya ‘eskerî de têne berhevkirin û paşê jî têne şewitandin (Anter, 2013:65). Ev agahiya ku Anter dide muhîm e, ji ber ku Xelîl Xeyalî, di nivîsên xwe yê *Rojî Kurd* û *Hetawî Kurdê* de gelek helbestên Koyî diweşîne, bi me re ew qenaat çêdibe ku bi wî re nusxeke dîwana Koyî hebû, qet nebe helbestên wî yê ku li Stembolê nivîsînê, ew ên nûjen û li ser fikra kurdîtiyê bi wî re hebûn.

Derbarê jiyana Koyî ya li Stembolê zêde agahiyên me nînin. Tiştê em dizanin ew e ku li Stembolê di mala Bedirxaniyan de maye û ji zarokên wan re mamostetî kiriye. Ev zaf tê dubarekirin lê li ser mirina wî zêde tiştê nayê gotin. Niha em ê ji çavkaniyê cuda zanînek nû bidin: Helbestvanekî tirk ê bi navê Uskudarli Talat di kurtejiyana xwe de behsa Koyî dike; çimkî wî û şîrbirayê wî Safî ji Koyî dersên edebiyata erebî û farsî distandin:

Bu sırada Kürdistan fudalâ ve şuarasından Köy Sancaklı Hacı Abdulkadir [Efendî] ye malik oldum. Mücerreddi, fakirhanede yatar kalkardı. Sinni seksene karib iken fakirhanede vefat etti. Süt biraderim Üsküdarlı Safî ile bana Arabî ve Farsî edebiyat okuturdu. Kürdce divanı vardı (İnal, 1969:1847).

*(Di vê maweyê de min ji zana û helbestvanên Kurdistanê Hacı ‘Ebdulqadirê Koyînas kir. Azîb û bi tenê bû, li feqîrxaneyê dima. Temenê wî nêzî heştê salî bû rehma kir. Ji min û şîrbirayê min Uskudarli Safî re dersên edebiyata erebî û farsî dida. Dîwana wî ya bi kurdî hebû.)*

<sup>1</sup> “Kürdçe Yeni Bir Eser”. 1919. *Serbestî*, No: 485 (4 Mayıs 1919/4ê Gulana 1919an), r. 1.

Em ji vir fêh dikin ku Koyî li Stembolê ne li mala Bedirxaniyan, li feqîrxaneyê dimire. Wî belkî jî ji bo debara xwe bike dersên ‘erebî û farsî dida. Agahiyeke muhîm jî Talat dibêje ku dîwaneke wî ya bi kurdî hebû. Naxwe heta mirinê jî nusxeyeke dîwanê ligel Hacî Qadir hebû û kurdbûna wî li derdorên edebî dihat zanîn. Lê piştî wefata wî çî ji wê dîwanê hat nayê zanîn.\*

Rewşenbîrekî din ê kurd/osmanî Abdullah Cevdet jî di sala 1913an de behsa Hacî Qadir dike. Ew gava behsa helbestvan û kesayetên kurdî dike, cihekî taybet dide Koyî û wî di asta şair Fuzûlî de dibîne:

Bunlardan mâ’adâ değil yalnız Kürdlerin ve fakat bütün müslümânların mâbihi'l-iftihârı olan dîvânı, Leylâ û Mecnûnu, Hadîkatü's-Sü’edâsı, ve ayrıca külliyyât-ı azîmesiyle meşhûr (Fuzûlî) ile vâdî-yi hikmetde serfirâz olub iki bini mütecâviz Kürdce, Arabca, Fârsîce manzûme yazmış ve bir kısmı elân ber-hayât bulunan Osmanlı üdebâsına da Farsî, Arabî okutmuş olan Süleymaniyeli Hacî ‘Ebdulqadir Efendî merhûm vardır; bu fâzıl ve hakîm adam, (Emîr Bedîrxan)ın müşâvir-i hâssı idi (Cevdet, 1913:1211).

*(Ji bilî van Hacî Ebdulqadir Efendiyê ji Silêmanî heye ku wî bi kurdî, erebî û farsî ji du hezarî zêdetir helbest nivîsiye. Dersa farsî û erebî daye edebiyatvanên osmanî ku hin ji wan hêj li heyatê ne. Ev zilamê xwedî fezl û hikmet şêwirmendê xas ê Emîr Bedîrxan bû.)*

Herekol Azîzan jî behsa jiyana wî ya Stembolê dike: Hacî jî weke Nalî û Şêx Riza çûye Stembolê û ketiye civata edîb û helbestvanên Stembolê. Ji helbestvanên wê heyamê pirê wan farisiya xwe li ber destên Hacî xwendine (Cewerî, 1998:817).

Ev hersê çavkaniyên dawî nîşanî me didin ku Hacî Qadir li Stembolê li nav derdorên edebî yê kurdî û osmanî de bi şanazî dihat nasîn; kurdîtiya wî, dîwana wî ya mezin, herwiha ‘ilm û hunera wî dihat zanîn. Lê ew li Stembolê bi tenê bû, taliya ‘emrê xwe di feqîrxaneyê de bi tenêti derbas kir. Ev beyta wî jî nîşaneyê wê ye:

Her min im êsta warisî Îsa  
Bê jin û mall û bê kurr û me‘wa (Koyî, 2004:121).

### 3. LI STEMBOLE DU HEVAL, DU HELBESTVANÊN KURD: KOYÎ Û KEYFÎ

Ji bo ku jiyana Koyî ya li Stembolê em bizanin, hewce ye em Keyfî jî nas bikin. Keyfî, bi navê xwe yê rastîn Fethullayê Ciwanroyî li gorî Marif Xeznedar (2004:31) di sala 1814an de, li gorî lêkolînên dawî yê Mesûd Mihemed (vgz. Şareza, 2009:281) di sala 1839an de ji dayik dibe û ji ber feqîrî û ji bo xwendina feqîtiyê ji gundê xwe bar dike tê Koyê. Ew û Hacî Qadir li vir hevdu nas dikin û

\* Mamoste Tahir Baykuşak, ku li ser jiyana Koyî ya li Stembolê lêkolînên hêja dike, em ji wê çavkaniya muhîm agahdar kirin, em jê re minetdar in.

dibin heval. Ewçax li Koyê adetek hebû ku civatên helbestxwendinê digerlandin. Di civateke wiha de di navbera Keyfî û Şêx Riza Talebanî de mînaqêşe çêdibe û Keyfî di vê nîqaşê de bin dikeve, hew dikare li Koyê bistire; lewre di sala 1869an de ji Koyê derdikeve, bi riya Hewlêr, Mûsil û Helebê berê xwe dide Stembolê. Keyfî li vir bi Balyozxaneyê Frensayê re têkilî datîne û fêrî zimanê frensî dibe.<sup>2</sup> Hacî û Keyfî li xerîbiya Stembolê dîsa digihine hev û ji hev re dibin destbirak. Lê Keyfî berî Koyî, di sala 1883yan de li Stembolê rehmet dike ku îro tirba wî jî nayê zanîn (Xeznedar, 2004: 31-32).

Li gorî ‘Elaedîn Secadî, Koyî û Keyfî bi hev re diçine Stembolê û beşdarî koma Bedirxaniyan dibin. Bedirxanî, Koyî ji zarokên xwe re wekî mamoste digirin, Keyfî jî dişînin Fakulteya Hiqûqê. Koyî li vî bajarî dibîne ku mîletên din pêşketine, lê kurd ji van pêşketinan bêpar mane; loma di helbesta xwe de fikra welatparêziyê derdixe pêş (1952:342-359 vgz. Yıldırım, 2016:62). Bi qasî ku em dizanin Koyî û Keyfî ne bi hev re çûne Stembolê. Koyî di sala 1864an de, Keyfî di sala 1869an de ji Koyê derketiye. Li gorî Cooper (1901:30) Keyfî di 1874an de hatiye Stembolê.

Hacî Qadir, li xerîbiyê bi mirina Keyfî gelekî diêşe, li ser wî mersiyeyek dinivîse. Di vê mersiyê de hem derbarê Keyfî de agahiyan dide hem jî rewşa xwe ya rûhî dide der:

Le qurr binîşe billê: Qewm û qîle hawar e  
Esîr e “Keyfî” le Roma le hebsî zêrî zemîn

Le kurdî bigre heta turk û ‘areb û ‘ecemî  
Le ax û daxî desûtên û şîn deken degirîn

Le “Kiwêredê”yê ke “Keyfî”y tiyabê Fîrdews e  
Cehennem e ke nema “Keyfî” şarî Qustentîn<sup>3</sup> (Koyî,  
2004:91).

Balkêş e, ji ber ku Keyfî bi çar zimanan xweş dizanî Koyî jî di vê helbesta xwe de çar ziman bi kar aniye:

Zubanî kurdî û turkî û farsî û ‘erebî  
Wehay dezanî wekû beytî Xusrew û Şîrîn

Emeş delîle le te’ sîrî mersiyey ke gutim:  
Çiwar zubanî têdaye qesîdeyî rengîn

<sup>2</sup> Di nivîseke xwe ya di rojnameya *Tercuman-i Hakikatê* de Keyfî li ser etîmolojiya peyva fransî “nuance” disekine. Di vê nivîsê de ew beyan dike ku hem bi fransî hem jî bi kurdî dizane û ji bo peyva “nuance” di osmanî de peyva “gûne” pêşniyaz dike. Bnr. *Tercuman-i Hakikat*, No. 1375 (12 Kanûn-î sanî/Kanûna paşîn 1883), r. 2.

<sup>3</sup> Kiwêredê, navê gundê Keyfî ye; şarî Qustentîn jî Stembol e. Şair dibêje ew gundê ku Keyfî lê be bihûsta Firdewsê ye, lê ev bajarê Stembolê ku Keyfî lê nema dojeh e.

Bu gice Keyfî Efendî göründi rü'yâ diye  
Cinânda zümre-i gılman û hûre oldi yaqîn<sup>4</sup>

Ev pratîk nîşanî me dide ku Keyfî jî Koyî jî şairên jîr bûn ku dikarin bi çar zimanan helbest binivîsin.

Navê Keyfî di helbesta Koyî ya “Şehsiwarî Belaxetî Kurdan” de jî derbas dibe. Koyî, ji ber ku li ser Keyfî xusûsî helbestek nivîsiye, li vir hewce nediye ku behsê dirêj bike û tenê bi beytekê ew bi bîr aniye:

Keyfî hacet nîye bikem basî  
Em kitêbey bixûnî deynasî (Koyî, 2004:128).

Hevpariyêke din a Koyî û Keyfî jî ev e ku bi wan re xîreta kurdîtiyê hebû; te'n, şermezarî û zimandirêjîyên li hember kurdan û kurdî li zora wan diçû, tehemmul nedikirin û bi qelesa xwe parêzvaniya milletê xwe dikirin. Nimûneya Keyfî wiha ye: Sal 1881, cih Stembol e. Konsolosê Îngiltereyê yê Kurdistanê Major Henry Trotter (1841-1919, Indian Army Officer) di çarçoveya pîrsa kurd û ermenyan de raporek amade dike û dibêje “edebiyata kurdan nîne”. Ev yek li zora rewşenbîrên kurd diçe. Keyfî, li ser vê gotinê ji bo ku hebûna edebiyata kurdî îsbat bike du helbestên kurdî ligel wergera wan a tirkî di rojnameya *Tercuman-i Hakikatê*<sup>5</sup> de diweşîne. Helbesta pêşîn xezeleke Mistefa Begî Kurdî ye (No. 969, 13 Îlon 1881, r. 2).<sup>6</sup> Helbesta duyem bi kurdiya goranî ye û bi gotina Keyfî çîrokeke menzûm a 1300 salî ye (No. 974, 19 Îlon 1881, r. 3). Ji bilî Keyfî, ‘Ebdurehîm Nacim (No. 982, 28 Îlon 1881, r. 2-3) û Hasan Zuhdî (No. 1014, 8 Teşrîn-i Sanî 1881, r. 3) jî li ser dîrok, ‘alim û zanayên kurdan dinivîsin. Bi vî rengî ew bersiva konsolos didin û dibêjin “kurd hene, ziman û edebiyata kurdî heye!”

Helbesta Koyî ya “Şehsiwarî Belaxetî Kurdan” jî, ku tê de behsa gelek helbestvanên kurd dike, em dikarin di çarçoveya îsbatkirina edebiyata kurdî de bihesibînin. Ev helbest cara pêşîn di *Hetawî Kurdê* de di nav nivîseke M. X yanî Modanî Xelîl Xeyalî de tê weşandin. Xeyalî piştî weşandina helbestê wiha dibêje: “Eva şa‘ir[ê] Baban û Soran ewe ku Hacî Qadir aniye nezmê şa‘ir[ê] kurdî dê jî gelek heye yek bi yek tehqîq bikin û binivîsin ji bo tercemeî hal[ê] wan kitêbek çêkirin lazim e: xîret û mêraniya kurdîti nahlî ku mezin[ê]d me bê nav û nîşan bimîn. Xelq te‘nan li me bide, ji nezaniya me bas bike” (M. X, 1913:26).

Keyfî, berî vê munaqeseyê jî ji rojnameya *Tercuman-i Hakikatê* re gelek caran nivîs şandiye û ev bi îmzeya “Keyfî”, “K-Y”, “K-Y-F-Y” hatine weşandin. Li

<sup>4</sup> Ev beyt bi tirkî ye. Maneya wê ev e: Îşev wekî xewn Keyfî Efendî xuya kir, li bihuştan ew nêzi koma gılman û horiyên bû.

<sup>5</sup> *Tercuman-i Hakikat*, rojnameyêke tirkî-osmanî ye. Ji bo agahiyên derbarê wê û naveroka wê de bnr. Demirci, Neşe. 2012. *Tercüman-i Hakikat Gazetesi (1- 1500. Sayılar) İnceleme ve Seçilmiş Metinler*. Sivas: Cumhuriyet Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü. Teza Lisansa Bilind.

<sup>6</sup> Ji bo vê helbestê bnr. “Kurdî”, (Xeznedar, 2003; 177,178).

gorî xebata Neşe Demirci (2012:310-312), di rojnameyê de kêmanî 15 nivîsên Keyfî hatine weşandin û ew beşdarî munaqeseyên edebî û hiqûqî jî bûye.

Ji bo kurtejiyana Keyfî û dîroka edebiyata kurdî wekî agahiyeke nû, hewce ye em behsa du çavkaniyên îngilîzî yên mîsyoneran jî bikin: Ji van a pêşîn kitêba Isaac G. Bliss e. Ew di vê kitêbê de behsa kurdekî “pagan fire-worshipper” (pagan-agirperest) dike ku rojekê Încîleke bi farsî dikeve destê wî û ew zaf tesîrê li wî dike. Paşê ji çiyayên dûr ên Kurdistanê ciwanek tê mala wî kesê pagan. Ji wê Încîla farsî û ji gotinên mêrikê pagan heyirî dimîne. Ew dikeve pey şopa rastiye û di bîra wî de her ew Încîl heye. Li cem serekê eşîra xwe dibe katib. Bi sofîyên/oldarên mislimaniyê re radipe rûdine; dibîne ku rihê baş ê Încîlê ketiye nav Quranê. Paşê ew tê Mûsilê, li vir xristiyanekî evangelîst nas dike û dibe heyranê wî. Ew dibîne ku çavkaniya jiyana vî zîlamî Încîl e. Paşê ew ciwanê kurd diçe Stembolê, di civata mîsyoneriyê de xettatî/katibî dike, ji ber ku destxeta wî zaf spehî bû. Pîsporiya wî ya di zimanên ‘erebî, farsî û tirkî de bala mîsyoneran dikişîne. Di tercumeya tirkî ya Peymana Nû de tê wezîfedarkirin. Ew di wergera Peymana Nû de, ya ku di sala 1878an de çap bûbû, dixebite, redaktorî dike. Gava ku li ser Încîlê dixebite bersiva pirsên xwe jî dibîne. Bliss dibêje; tevî ku ew hîç wafîz nebûye, di nav xelkê de xristiyanîya xwe beyan nekiriye jî yên ku wî nas kirine hemû hêvî dikin ku di dawiyê de ew bûye ji mirovên bijarte yên Îsa (1883; 18-19). Bliss di vê çîrokê de navê wî ciwanî nade, lê A. A. Cooper dide. Li gorî Cooper ew ciwanê ku Bliss behsê dike Keyfî Efendî ye. Cooper gelek gelek pesnê Keyfî dide û derbarê jiyana wî ya şexsî de wan gotinên Bliss neql dike (1901; 30-31). Lêkolîner Privratsky jî qiymetek mezin dide Keyfî û dibêje kontrola dawî ya rêziman û uslûba vê wergera Încîlê Keyfî kiriye; loma zimanê vê wergerê zimanê Keyfî ye. Jixwe ev werger ji bo hemû wergerên paşê bûye bingeh (2013; 55).<sup>7</sup> Eric M. Nort, ku li ser wergerên Încîlê xebateke berfireh kiriye, di nav wergerên tirkî yên Încîlê yên 1874, 1875, 1876 û 1878an de navê Keyfî jî wekî “Keifi Effendi” dinivîse (1938; 333). Dixuye ku Keyfî li Stembolê redaktoriya wergera Încîlê kiriye û kedeke wî ya hêja di vê wergerê de heye. Çîroka ku Bliss neql dike û jiyana rastîn a Keyfî jî li hev tê. Dibe ku di nav demê de meyla Keyfî li ser mesîhîtiyê çêbûbe an jî ev hemû efsane bin; Keyfî tenê ji bo debara xwe di nav mîsyoneran de xebitîbe, wekî ku Koyî dersên ‘erebî, farsî dida.

## ENCAM

Koyî li Stembolê di nav derdorên edebî yên kurdî û osmanî de wekî ustadek dihat nasîn, gelek kesî jî wî ders wergirtiye û pesnê wî daye. Helbestên wî yên li ser kurdîtiyê tesîreke mezin li ser rewşenbîrên kurd kiriye: Xelîl Xeyalî, M.

<sup>7</sup> Di mijara mesîhîbûna Keyfî de Privratsky teqeztir diaxive, lê hewce ye em jê guman bibin. Çimkî ew hevokê ji Cooper werdigire ku Keyfî di dawîya xebata xwe ya li ser Încîlê de bûyiye xristiyan. Lê ya rast Cooper hevokê wiha negotiye. Ew tenê gotinên Bliss neql dide, wekî me gotî Bliss jî tenê hêvî dike ku Keyfî bûye mesîhî, nabêje sedî sed bûyiye, loma ew wafîz nebûye û bi zimanê xwe ev yek beyan nekiriye.

Salih Bedirxan, Baban ‘Ebdulazîz, Celadet Alî Bedirxan vê yekê beyan dikin. Dîwaneke mezin a Koyî heta sala 1919an jî li Stembolê di destê komeleya kurdan de hebû. Wan hewl da ku wê çap jî bikin; lê ev pêk nehat. Ew dîwana mezin a Koyî hêj jî winda ye.

Stembol, di sedsala 19 û 20an de bûye wargeha gelek kesayetên kurdî. Du şairên kurdî Keyfî û Hacî Qadir jî ji wan in. Ew herdu piştî hevaltîya li Koyê, li Stembolê jî dibin destebirak. Wan herduyan jî li Stembolê kurdîtiya xwe ji bîr nekiriye; berovajî li vî bajarê polîtîk ew jî bi awayekî xurttir kurdîtiya xwe hîs dikin û rengê fikr û hunera wan diguhere.

### ÇAVKANÎ

- Alan**, Remezan. 2013. *Bendname*. (çapa 2yan). Stenbol: Peywend.
- Anter**, Musa. 2013. *Hatıralarım*. (çapa 3yan). İstanbul: Aram.
- Babê** Naco. 1913. Fe‘tebirû Ya Uli’l-Ebsar. *Hetawî Kurd*, j.2 (21 Teşrîn-i Sanî 1329 / 4ê Kanûna Pêşîna 1913an), r. 3-10.
- Balekî**, Yadgar Resûl. 2016. Bandora Helbestên Hacî Qadirê Koyî yên ku di Navbera Salên 1898-1925 de Hatine Weşandin li Ser Nûbûna Helbesta Kurdî. ji soranî: Mêhdî Jafarzadeh, *Zarema*, j.6 (çile, sibat, adar, nîsan 2016), r. 6-19.
- Bedir-Khan**, Celadet Alî. 1943. Merhele. *Roja Nû*, j.1 (3 Gulan 1943), r. 1. Ji nû ve çapkirin: Uppsala: Jîna Nû, 1986.
- Bozarslan**, M. Emîn. (amd.). 1985. *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî \* Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, Cild I, Uppsala: Deng.
- Bozarslan**, M. Emîn. (amd.). 1991. *Kurdistan Rojnameya Kurdî ya Pêşîn (1898-1902)*, I-II Cild, Uppsala: Deng.
- Cevdet**, Abdullah. 1913. Ermeniler ve Kürdler. *İctihâd*, no. 54 (14 Şubat 1328/27 Şubat 1913), r. 1209-1211. Ji bo tîpguhêziya latînî ya vê nivîsê bnr. Akpınar, Alişan. 2003. İttihatçı Bir Kürt Aydını: Dr. Abdullah Cevdet’in Yazıları. *Vesta*, j.1 (güz-payîz), r. 280-293.
- Cewerî**, Firat. (amd.). 1998a. *Hawar Cild 1 Hejmar 1-23 (1932-1933)*, Stocholm: Nûdem.
- Cewerî**, Firat. (amd.). 1998. *Hawar Cild 2 Hejmar 24-57 (1934-1943)*, Stocholm: Nûdem.
- Demirci**, Neşe. 2012. *Tercüman-i Hakikat Gazetesi (1- 1500. Sayılar) İnceleme ve Seçilmiş Metinler*. Sivas: Cumhuriyet Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü. Teza Lîsansa Bilind.
- Ghaderi**, Farangis. 2014. Hacî Qadirê Koyî û Hilatina Neteweperweriya Kurdî. Fexriya Adsay (wer.). *Zarema*, j.2 (îlon, cotmeh, mijdar, kanûn 2014), r. 43-50.

- İnal**, İbnülemin Mahmud Kemal. 1969. *Son Asır Türk Şairleri*. Ankara: Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları.
- Kanie**, Mariwan. 2016. Di Helbestên Hacî Qadirê Koyî de Sirgûnî û Neteweperwerî. (Pêşkêşa Sempozyumê). *Di Sedsala 19emîn de Şairekî Kurd Hacî Qadirê Koyî*. 06.02.2016 Şemî, DEPO/Tütün Deposu, Stenbol.
- Rojî Kurd 1913**. (2013). Koma Xebatên Kurdolojiyê (amd.). Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Mehmet Emin Zeki Bey**. 1998. *Kürd ve Kürdistan Ünlüleri*. M. Baban, M. Yağmur, S. Kutlay (wer.). Spanga / Sweden: Apec.
- M. X.** 1913. Şa'irî Baban û Soran. *Hetawî Kurd*, j.1 (11 Teşrînî Ewwel 1329 / 24 Çiriya Pêşîn 1913), r. 24-26.
- Serfiraz**, Mesûd. 2015. *Kurd, Kitêb, Çapxane: Weşangeriya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmaniyan de (1844-1923)*. Stenbol: Peywend.
- Şareza**, Kerîm. Hewêzî, Nazim. Xoşnav, Usman Mistefa. Asinger, Mecîd. 2009. *Koye Lerewî Şaristaniyetda*. Hewlêr: Çapxaney Roşinbîrî.
- Xeznedar**, Maruf. 2004. *Mêjû Edebî Kurdî*. Bergî Çarem. Hewlêr: Aras.
- Yıldırım**, Kadri. 2016. *Xaniyê Duyem: Hacî Qadirê Koyî*. Stenbol: Avesta.
- Çavkaniyên Înternetê:**
- Bliss**, Isaac G., 1883. *Twenty-Five Years in the Levant*. American Bible Society. Lînk: <http://www.dlir.org/archive/archive/files/6be240832b23d48f7c79c757cb98fa18.pdf>, 07.05.2016.
- Cooper**, A. A. 1901. *The Story of the (Osmanli) Turkish Version, with a Brief Account of Related Versions*. London: The British and Foreign Bible Society. Lînk: <http://www.dlir.org/archive/archive/files/cbcb4c6b3a8301211a475ad8cefc9028.pdf>, 07.05.2016.
- Koyî**, Hacî Qadirî. 2004. *Dîwan*. Arif Zêrevan (ed.). Sweden: Nefel. çapa dijîtal: [http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/haci\\_qadire\\_koyi\\_diwan\\_02.pdf?NR:79](http://www.nefel.com/epirtuk/pdf/haci_qadire_koyi_diwan_02.pdf?NR:79), 08.03.2016.
- Nort**, M. Eric. 1938. *The Book of a Thousand Tongues*. New York: New York; for the American Bible Society [by] Harper & brothers. Lînk: <https://babel.hathitrust.org/cgi/pt?id=mdp.39015003882100;view=1up;seq=12>, 07.05.2016.
- Privratsky**, Bruce G. 2003. A History of Turkish Bible Translations. Lînk: <https://historyofturkishbible.files.wordpress.com/2014/03/turkish-bible-history-version-s-in-preparation.pdf>, 07.05.2016.







## KESÊTIYEKANÎ NÊW ÇÎROKÎ EFSÛNAWÎY KURDÎ

Mezher ÎBRAHÎMÎ\*

### PUXTE

Çîrokî efsûnawî, meydana mîlîmîlanêy nêwan dû hêzî çake û xirape ye. Lem çîrokane da, Pallewan wek rêberî berey çake, be piştîwanîy yarmetîderan, be ser tawankare xeyallî û mirove pîs û çewsenerekan da serdekewêt û cihanêk dûr le zilm û xirape wedî dehênêt. Vladimir Propp, be pêy kirdewe û erkî kesêtîyekan, heft aqarî çalakîy destnîşan kirdûwe. Çîroke efsûnawîyekan, sererray lêkçûnî pêkhatayan, le hendê layenewe ciyawaz in. Kesêtîyekan, layenêkî em ciyawazî û taybetmendiyane pêkdehênin û lêkollîneweyan detwanêt rêga bo berawirdkarîy çîrokî netewekan xoş bikat. Dozrawekanî em twêjîneweye ewman bo rûn dekatewe ke mirov wek pallewanî em aqare, le zorîney çîrokekan da le corî çalak, le zayendî nêr, bira yan xuşkî biçûk yan taqane ye. Le barî pêgey komellayêtîyewe, nîwey pallewanekan le binemalley padişa û nîwekey dîkeş xellkî asayî û hejar in. Herweha taûtwekîrdinî nawî pallewanekan, dûpatbûnewey penca le sedî çend nawêkî zortir Erebi pîşan dedat. Kesêtîye çalakekanî şeş aqarekey tîrî çîrokî efsûnawîy Kurdî bem şeweyen: A. Tawankar: dêw, ejdîha, endamanî xêzanî pallewan, pîrejî, derwêş û padişa; B. Yarmetîder: keristey cadûyî, giyanleberan û be taybet esp, dêw, sîmurx, pîrejî, kiçe paşa û perîzadekan; C. Şazadexan: kiçanî padişa û perîzadekan; D. Bexşinde: dêw, Xidrî Zîndû yan piyawî ridênsîpî, û perîzadekan; E. Berrêker: endamanî xêzanî pallewan, şazadexan û bawkî; F. Pallewanî diroyîn: bira gewre û awellzawakanî pallewan. Be giştî, detwanî kesêtîye amadekanî nêw çîrokî efsûnawîy Kurdî, be gwêrey hellwêstyan le beranber pallewan da, be ser sê destey serekî da dabeş bikeyn: 1. Piştîwananî hemîşeyî, wekû giyanleberan, Xidrî Zîndû, sîmurx û perî; 2. Dujminanî hemîşeyî, wekû ejdîha û derwêş; 3. Ewaney le her dû taqimeke da cê degrin, wekû dêw, pîrejî, şazadexan û padişakan.

**Wişe serekîyekan:** Çîrokî efsûnawî; çîrokî Kurdî; aqarî çalakî; kesêtî; Vladimir Propp.

### ABSTRACT

#### *"The Characters of Kurdish Fairy Tales"*

Fairy tale is the battleground between two opposing forces of good and evil. Human, as the hero and leader of good front army, triumphs over human and superhuman wickedness with the help of magical sources and brings about a world free of oppression and evil. Propp identifies seven categories of functions based on the type of action of the character of those stories. Fairytales, despite structural similarities, have substantial differences and distinct aspects. Characters, the investigation of which creates the opportunity of comparing fairytales of different

\* Xwendekarê mastirê, Zankoya Kurdistan Beşa Ziman û Edebî Farsî.  
mazharebrahimi@gmail.com

nations, is a fundamental point of difference among such narratives. Based on the findings of the present study, human is presented as seeker, male, younger sibling, or the only child of the family, in the majority of sections of this field. In regard with social status and class distinction, half of the heroes are kings and princess, and the other half are people of working classes; also, the analysis of the frequency of the names of heroes shows a fifty percent share of Arabic names. Famous actives in the other six fields are: A. Villain: daeva, dragon, family heroes of the member, old women, darwesh (religious character), and the king; B. Helper: magical stuff, animals especially horse, daeva, simurgh, old woman, princess and the fairy-born; C. Princess: princesses and the fairy-borns; D. Giver: old man and Alive Khidr, princess and the fairy-born; E. Sender: family heroes of the member and princess and her father; F. False heroes: older brothers and in-law brothers. In general, characters present in Kurdish fairytales could be divided into three basic groups. According to their position toward the hero: 1. Permanent companions; as animals, Alive Khidr, simurgh, and fairy-born; 2. Permanent opponents; as dragons and darwesh; 3. Those who fall in the both groups; as daeva, old women, princesses, and the kings.

**Key words:** Fairy tale; Kurdish tale; field of activity; character; Vladimir Propp.

## PÊŞEKÎ

Edebî zerekî derfetêk bûwe bo niwandînî xewn û xulyakanî mirov. Be witey Vladimir Propp, folklor rengdanewey cîhan e bew çeşney le zeynî mirovekan da ye (Propp, 1370: 240). Lem nêwe da, çîrok wek amrazêkî behêz rêgay bo çûne naw cîhanêkî teji le xoşî û kameranî xoş kirdûwe û ew derfete be mirove bêdesellatekan dawe takû bitwanin gile û gazindekanyan le hember desellatdaran da bihênine ziman û xirapekarî û fêll û gizî û çewsandinewe mehkûm biken. Be birrway Cejpek “edebî kilasîk meyl û xwestî çînî desellatdarî wedî dehêna, yan be gwêrey berjewendîyekanî çînî balladest û be mebestî dijayetîy neyaran be kar dehênra; Le beranber da berhemekanî edebî zerekî pêwîstîyekanî çînî hejarî desteber dekird” (Cejpek, 1389: 6).

Le nêw corekanî çîrokî folklorî da çîrokî efsûnawî yan perîyan be şeweyekî zor berçawtir awat û xulya wedînehatûwekanî mirovî kewnaray tomar kirdûwe; awatgelêkî wek: zallbûn be ser siruşt û giyanleberan û bûnewere nenasraw û xeyallîyekan da, çakkirdinî rewşî jîyan, binebirrkirdinî nadadperwerî û çewsandinewe, qerebûkirdinewey hejarî û bêdesellatî, têgeyiştin le nihênîyekanî zewî û asman û htd. Le rastî da mirov, le pênav awatekanî da û bo qerebûkirdinewey lawazî û bêdesellatîy xoy penay birdote dinyay seyrûsemerey efsane û bo wedî hênanî xewnekanî, destewdamênî giyanleberan û bûnewere xeyallîyekan bûwe. Cêy serinc e ke diway têperrînî sedan û bigre hezaran sall be ser em çîrokane da, hêştta beşî zorî ew awatane nehatûnete dî; boye efsane, bo mirovî em serdemeş tam û çêjî taybetyan heye.

Em çîrokane be giştî, gorrepanî berberkanêy dû hêzî çake û xirapen û serkirdayetî em dû bereye dijberes le estoy pallewan û tawankar da ye. Kesêtiyekanî nêw çîrok, çi siruştî bin çi serûsiruştî, nimûneyan le dewrûber da debînre û le her reng û şewe û riwaltetêk da bin, nîşanderî xû û xidey mirove rasteqînekan in.

Çîroke efsûnawîyekan giringîyekî taybetyan heye û lêkollîneweyan detwanêt rûnakî bixate ser beşêk le qujbine tarîkekanî jîyanî mirovî kewnara. “Efsane konekan, ustûrekan û çîrokekan bo ême aşina dêne pêş çaw, bellam têgeyiştin le qûllayî çemke berayîyekanyan zor pêwîst e. ... Be bê nasînî edebî zarekî, têgeyiştin le dîrokî gelan mumkîn niye” (Maxim Gorki, le gêrranewey Cejpek, 1389: 13).

Propp, kesêtiyekanî çalakî nêw çîroke efsûnawîyekan be ser heft aqarî çalakî da dabeş dekat. Le her kam lem aqarane da kesêtiyek dewr degêrêt û erk û kirdewe serekîyekan bo berew pêşçûnî çîrokeke têdeperrênêt. Em heft kesêtiye detwanin le bîçmî şit yan kes û bûnewerî cihêreng da derbikewin. Kesêtiyekan birîtîn le: pallewan, tawankar, yarmetîder, şazadexan yan kesî mebest, beşxinde, berrêker, û pallewanî diroyîn (Propp, 1386: 161-162). Be boçûnî em twêjere, rûdawekanî nêw çîrokî efsûnawî bem heft kesewe girê dirawin.

Egerçî çîrokî efsûnawîy hemû netewekan le pêkhate da wek yek in, yan layenî kem zor lêk nîzik in û hêmane serekîyekan hawbeş in, bellam kesêti û taybetmendî em kesêtiyane le neteweyekewe bo neteweyekî dîke ciyawaz e û emeş degerrêtewe bo ciyawazîy ferhengî û komellayeti û mêjûyî û ayînî em netewane. Mebest le nûsînî em witare diyarîkirdinî kesêtiyekanî nêw çîrokî Kurdî û destnîşankirdinî taybetmendî ew kes û bûnewer û şitaneye ke lem heft aqare da çalakî denwênin. Em hewle detwanêt helêk bo berawirdkirdinî çîrokî efsûnawîy Kurdî legell çîrokî netewekanî dîke da birrexsênêt.

**1. Pêşîne:** Sebaret be kesêtiyekanî nêw çîrokî folklorîy Kurdî çend twêjîneweyek encam dirawe. Lem beşe da be kurtî amaje be hendêkyan dedeyn.

Cewher Heme Xerîb (2013) le pertûkêk da le jêr nawî *Pallewan le Hikayeti Folklori Kurdî Nawçey Kerkûk* da kesêtiyekanî nêw em çîrokane be ser sê liq da dabeş kirdûwe ke birîtîn le: pallewanî mirov, pallewanî giyandar, û pallewanî xurafî. Şiyawî bas e ke mebestî twêjer le pallewan, hemû kesêtiyekan e û tenya kesêti serekî û yekemî çîrok nagrête ber. Lem berheme da bo her kam lem core kesêtiyane çend nimûne hênrawetewe û dewryan le çîrokî folklorî em devere da, xirawete ber bas û lêkollînewe.

Mewlûd Îbrahîm Hesên le pertûkî *Qedexşkênî* da be têrûteselî basî motif û taybetmendîyekanî efsaney Kurdîy kirdûwe û le pall emaneş da nawî gelêk kes û şitî hênawe ke be şeweyekî berçaw le nêw em core çîrokane da amaden. Lem berheme da efsaney Kurdî le zor layenewe taûtwe kirawe û rollgêrranî nêw em çîrokane nasêndirawin (birwane. Îbrahîm Hesên, 2000: beşekanî yekem û sêyem). Twêjer darerrêyekî bo efsaney Kurdî darrîştûwe û liqêkî bo giyanleberan (mebestî twêjerî nawbiraw lem wişeye, kesêtiyekan e) danawe û be ser sê destey mirov, besteziman, û efsaneyî da dabeşî kirdûn. Bo giyanleberanî bestezimanîş em jêrliqaney danawe: ballinde, xişok, çwarpê, awî, terr û wişkî, û zîndewer (heman serçawe, 309). Be serincdan bewey ke amanc lem twêjîneweye nasandinî taybetmendî û motîfekanî efsaney Kurdî bûwe, awirr le aqarekanî

çalakîy kesêtiyekan û erkekanyan lem aqarane da nedirawetewe û be şêweyekî giştî basî kes û bûnewere amadekanî nêw em çîrokane kirawe.

Emanî le namey masterekey da legell kokirdinewe û polênbindîy komellêk çîrokî folklorîy bajarî Sine û dewrûberî, kesêtiyekanî nêw em berhemaney be ser çwar corî birryarî, çeşnî (typical), hêmayîn û temsîlî, û qallibî da dabeş kirdûwe û bo her kameyan çend nimûneyekî hênawetewe (birrwane. Emanî, 1387: 73-101).

Herweha Şukirye Resûll le kitêbî *Remzî Mar* da giyanleberanî nêw çîrokî Kurdî be ser çwar deste da dabeş kirdûwe ke brîtîn le: ajelle dirrindekan û fêllbazekan, ajelle mallîyekan û giyaxorekan, ballindekan, û giyanlebere xişokekan (birrwane. Resûll, 2005: 28-42).

**2. Çîrokî Efsûnawî Yan Perîyan (Fairytale):** Çîroke folklorîyekan be pêy polênbindî cihanîy Aarne- Thompson- Uther (ATU) be ser heft cor da dabeş dekirên:

- A. Çîrokî ajellan
- B. Çîrokî efsûnawî
- C. Çîrokî ayînî
- D. Çîrokî rasteqîne
- E. Çîrokî dêwî gemje
- F. Çîrokî gallte û gep
- G. Çîrokî zincîreyî (Xediş, 1389: 224\_226)

Lem polênbindîye da ke diwayîn pêdaçûnewey le sallî 2004 da û le layen Hans Jorg Utherewe encam dirawe, be giştî 2300 çîrok diyarî kirawe û bo her kameyan kodêk danirawe ke 450 kodî em pêrriste bo çîroke efsûnawîyekan le ber çaw gîrawe (kodekanî 300 ta 749).

Mêjûy çîrokî efsûnawî yan perîyan, bo serdemanî zor kon degerrêtewe. Be boçûnî Tolkein (1388: 55) “mêjûy çîrokî perîyan pêdeçê allostir le mêjûy maddî mirov bêt û be radey mêjûy zimanî mirov alloz e”. Kontirîn nimûney em çîrokane be nawî “dû bira yan “Bata û Anûbîs” le bellgekanî 1250 pêş zayîn le mîsir da dozrawetewe” (Propp, 1371:3).

Be birrway Levi Strauss, ustûre û çîrokî perîyan dekirêt hawkat bin û henûkeş hawkat in. “Lem serdeme da çîrok û ustûre le pall yektir da amaden; kewate natwanîn yekêkyan be paşmawey ewî dîke bizanîn” (le gêrranewey Propp: 1371: 71); bellam Propp, ustûre kontir le çîrokî perîyan dezanêt û denûsêt: katêk ustûre û efsane layenî pîrozêtî xoyan le dest deden, debin be çîrokî perîyan. Herweha dellêt: “Le rewî kamilbûn û pêşewtinî mêjûyî da gellallekan (plots) dekirêt le şêweyekewe (ustûre) bo şêweyekî dîke (efsane) û lewîşewe bo şêwey sêyem (çîrokî perîyan) bigorrdirên” (Propp, 1371: 130). Herweha birayanî Grimm û

şwênkewtûwanyan, çîroke folklorîyekan be paşmawey ustûre konekan dezanin û be birrway ewan twêjeran detwanin be yarmetîy em çîrokane, ustûrey xudayan û pallewananî kewnara bibûjêninewe (le gêrranewey Bedreyî, birrwane. Propp, 1386: dû).

Propp, çîroke efsûnawîyekan be paşmawey rêûresme ayînîye konekan dezanêt û dellêt katê ke rêûresmekan kall bûnewe û pîrozêtî xoyan le dest da, deqekanyan bîçimî çîrokî perîyanyan le xo girt (Bedreyî, birrwane Propp, 1371: 39).

Em twêjere, herweha çîrokî efsûnawî be janr le qellem dedat û dellêt: em çîrokane xawen pêkhateyekî tewaw taybet in ke be asanî hestî pêdekirêt (Propp, 1386: 27). Be pêy em boçûne, hemû çîroke efsûnawîyekan xawen pêkhateyekî awan: em çîrokane be ziyar lê kewtin yan awatî hebûnî şitêkewe dest pêdeken û be derkewtinî pallewan le mall û bînînî bexşinde û wergirtinî yarmetîderêkî cadûyî berdeyam debêt. Încâ rûberûbûn legell tawankar û serkewtin be serî da, yan hellatin le destî rû dedat. Zor car pêkhatey çîrokeke alloztir e; bo nimûne, le rêgay gerranewey pallewan bo mallewe da, birakanî deyxene nêw birêkewe; Paşan rizgarbûn û taqîkirdinewe û xoselmandin dête arawe û le akam da çîrokeke be gerranewey pallewan bo nîştimanî xoy yan willatî kiçî dillxwazî, û be hawsêrgîrî û padişayetî kotayî pê dêt (Propp, 1371: 180-181).

Hellsûkewtî pallewan û kesêtiyekanî tir ke le serewe amaje be hendêkyan kirawe, hêmane serekîyekanî nêw çîrokî efsûnawîn ke Propp be “erk” (function) nawyan dehênêt û awa pênaseyan dekat: erk birîtî ye le “kirdewey yekêk le kesêtiyekanî nêw çîrok, be gwêrey giringêtiyekey le rewî pêşveçûnî çîrokeke da” (Propp, 1386:60).

Propp le twêjînewekey da ke le ser çîroke Rûsîyekan encamî dawê û le pertûkêk da be nawî *Darrištenasiy Çîroke Efsûnawîyekan (Morphology of the Fairy Tales)* billawî kirdotewe, bew encame geyişt ke hemû çîroke efsûnawîyekan le pêkhate da, lanî zor le sî û yek erk pêkhatûn û em erkaneş be ser heft aqarî çalakî da dabeş debin ke le layen heft kesêti serekîyewe cêbecê dekirên.<sup>1</sup>

**3. Heft Aqarî Çalakîy Kesêtiyekanî Nêw Çîrokî Efsûnawî:** Propp le twêjînewekey da hebûnî heft aqarî çalakîy selmandûwe ke heft kesêti serekî têyan da dewr degêrrin. Le çîrokî efsûnawî da lewane ye her heft kesêtiyekey yan hendêkyan amade bin. Her kam le kesêtiyekan sererray ciyawazîy bîçim, temen, zayend, pîşe, nêw û taybetmendîyekanî tir, kirdewegelî hawçeşin be encam degeyenin. Em kirdewane negorr in û lewane ye şit yan kes û bûnewerî corbecor erkî cêbecêkirdinyan bigrine esto.

<sup>1</sup> Bo zanyarîy ziyatir, û baştir têgeyiştin le boçûnekey Vladimir Propp, birrwane witarî “Darrištenasiya (morfolojiya) Çîrokên Efsûnawî” govarî *Zarema*, jimarey 6, laperrekanî 135- 146.

Em nimûnane yarmetî baştir têgeyiştinî baseke deden:

Padişa, Melîk Cemşîd bo rizgarkirdinî kiçekey denêrêt;  
Melîk Cemşîd derrwat.

Bawk, kurrekey be şwên dermanî kwêrî da denêrêt;  
kurrekey derrwat.

Xuşkî pallewan, pallewan be şwên şitêkî seyrûsemere da  
denêrêt; pallewan derrwat.

Dayik, Fatime be diway heft birakey da denêrêt; Fatime  
derrwat.

Lem çwar nimûneye da, nardin û royiştinî pallewan dû erk yan hêmanî serekî û negorr in. Le beranber da, naw, pêgey komellayetî berrêker û pallewanekan, amanc û pallnerekanî rewanekirdin, hêmangelî nacêgîr in û le çîrokêkewe bo çîrokêkî tir ciyawaz in. Em hêmane lawekîyane egerçî karîgerîyan le ser pêkhatey serekîy çîrokekan nîye, bellam debine hoy rengaûrrengî û ciyawazîy riwaltetîyan.

Babetêkî dîke ke pêwîst e serincî pê bidirêt ewe ye ke nabêt kesêtiyekan be gwêrey wîst û amanc û mebestekanyan pênasê bikirên. Le rastî da ewe giring nîye ke em kesêtiyele çîyan dewêt yan çon bîr dekenewe û hestyan çî ye; bellkû giring karîgerîy kirdewe û hellsûkewtekanyan e le pêwendî legell pallewan û rewî çîrokeke da (Propp, 1386: 165). Lêre da aqarekanî çalakîy kesêtiyekan û ew erkaney dekwête estoyan, taûtwe dekirên.

**3. 1. Aqarî Çalakîy Pallewan:** Pallewan ew kesêtiye ye ke yan rastewxo le layen tawankarewe ziyânî pê degat yan hest be kemayesîyek dekat, yanîş birryar dedat giriftî kesêkî dîke çareser bikat û kemayesîyekey qerebû bikatewe (Propp, 1386:106).

Pallewanî çîrokî efsûnawî zor caran yarmetîderêkî cadûyî legell da ye. Propp dû cor pallewanî destnîşan kirdûwe: 1. Pallewanî pişkiner yan çalak ke be mebestî çareserkirdinî kêşe û kemayesîyek, yan be diway kes û şitêk da le mall derdekewêt û gerran û pişkinî xoy dest pêdekat; 2. Pallewanî qûrbani ke xoy gîrodey herreşe û hêrişî tawankar debêtewe û rewî çîrokeke be çarenûsê ewewe bestirawetewe.

Pallewan wek giringtirîn kesêtiy çîrok, no erkî le ser şan e ke birîtîn le: pêşdestî û birryarî çareserkirdin, kewtinerrê, hellsûkewt le beranber beşşinde da, milmilanê legell tawankar da, serkewtin, derkewtin be nenasrawî, encamdanî karî dijar, gerranewe bo nîştiman û le kotayîş da hawsergîrî û padişayetî.

**3. 2. Aqarî Çalakîy Tawankar:** Tawankar kesêti dijberî pallewan e û legell derkewtinî da kêşe û giriftî û allozî çê debêt. Be boçûnî Propp (1386: 69), kirdewey tawankar giringîyekî taybetî heye û be hoyewe cûlley rasteqîney çîrokeke dest pêdekat. Erkekanî tawankar le rewî çîrok da birîtîn le: tawankarî, dijayetîkirdin û rawedûnanî pallewan.

Propp, em kirdewaney wek giringtirînî tawankarîyekan destnîşan kirdûwe: dizî û rifandin, birîndarkirdin, kuştin, derkirdin, xistine nêw derya, telîsimkirdin, fermanî kuştin, hawsergîrî zoremilî, hewlldan bo xwardinî kesêk, bendkirdin û eşkencedan.

**3. 3. Aqarî Çalakîy Yarmetîder:** Yarmetîder ew kesêtiye ye ke pallewan bo geyîştin be amanc, û serkewtin be ser tawankar da kellkî lê debînêt. Propp sê deste yarmetîderî diyarî kirdûwe: Yekem, ewaney twanistî cêbecêkirdinî hemû erkekanî taybet be yarmetîderyan heye; wekû esp; dûwem, ewaney çend erkêkyan pê cêbecê debêt; wekû ew rohaney le engûstîlewe dêne der û fermanekanî pallewan têdeperrênin; sêyem, ewaney ke tenya yek erkyan pê cêbecê debêt; wek gillollebenêk ke debête rênîşanderî pallewan (heman serçawe:167). Erkekanî taybet be yarmetîder birîtin le: ragiwastin û rêniwênîkirdin, çareserkirdinî kemayesî, rizgarkirdin û gorrînî biçim yan rewşî jiyani pallewan.

**3. 4. Aqarî Çalakîy Şazadexan Yan Kesî Mebest:** Em aqare le rastî da tenya taybet be zayendî mê nîye û lew çirokaney ke pallewanekanyan kiç in, kesî mebest le birî şazadexan, kurrepadişa û perî, yan kesêkî dîke ye; bellam Propp le ber ewey le zorbey çîrokekan da kesî çalakî em aqare şazade yan perîzade ye, nawî aqarî çalakîy şazadexanî lê nawe.

Erkekanî em kesêtiye birîtin le: nîşankirdinî pallewan (be mebestî ciyakirdinewey le pallewanî diroyîn), diyarîkirdinî karî dijwar bo pallewan, nasînewey pallewan, rîswakirdinî tawankar û pallewanî diroyîn, sizadanî tawankar, û hawsergîrî. Cêy amaje ye ke hendêk car em erkane dekewête estoy padişay bawkî şazadexan (cige le erkî hawsergîrî).

**3. 5. Aqarî Çalakîy Bexşinde Yan Pêkhêner:** Le paş rûdanî tawan û amadeyîderbirînî pallewan bo çareserkirdin, bexşinde yan pêkhêner dête nêw meydanewe. Pallewan, çi çalak bêt û çi qurbanî, le dirêjey çîrokeke da keriste û yarmetîderêkî efsûnawî werdegrêt ke be hoyewe kêşe û karesateke çareser dekat; bellam pêş ewe, hendê rûdawî be ser da têdeperrêt ke emane debine hoy ewey le encam da yarmetîdere efsûnawîyekey dest bikewêt (Propp, 1386:85-86).

Şayenî bas e ke bexşinde be rêniwênî yan pêşkeşkirdinî keristey cadûyî, yarmetî serkewtinî pallewan dedat; bellam bexşindekan be pêçewaney yarmetîderan, hemîşe be şewey dillxwaz û be wîstî xoyan, pallpiştî le pallewan naken û em kare şewey corbecorî heye; bo nimûne, carî wa heye dêwêk le milmilanêyekî dijwar legell pallewan da deydorrênêt û dawa le pallewan dekat neykujêt û le beranber da xoy yan yarmetîderêkî efsûnawîy pêşkeş dekat. Carî waş heye ke pallewan be fêll û gîzî, şitêkî cadûyî we dest dexat.

**3. 6. Aqarî Çalakîy Berrêker Yan Yarmetîxwaz:** Berrêker yan yarmetîxwaz ew kesêtiye ye ke rêge bo geştekey pallewan xoş dekat; wate, be pêy daxwazî berrêker e ke pallewan bo çareserkirdinî kêşe û karesatêk yan bo



qerebûkirdinewey kemayesîyek le mall derdekewêt. Eme tenya erkî em kesêtiye ye û rûdawekanî dîkey nêw çîrokî efsûnawî be diway xoy da dehênêt. Pêwîst e eweş bigutrêt ke hendê car pallewaneke bê ewey daway lê bikirêt, birryar dedat be hanay kesî lêqewmawewe biçêt.

**3. 7. Aqarî Çalakîy Pallewanî Diroyîn:** Pallewanî diroyîn, ew kesêtiye ye ke êreyî be pallewan debat û hewll dedat xoy be biwêr pişan bidat û serkewtinekan bidate pall xoy. Pallewanî diroyîn hendê car tawankariş e.

Erkekanî pallewanî diroyîn birîtîn le: pêşdestî û birryarî çareserkirdin, kewtinerrê, hellsûkewtî nerênî le beranber bexşinde da, û herweha diro û hûşekirdin. Sê erkî em kesêtiye legell ewaney pallewan da hawbeş e; bellam em be pêçewanewe natwanêt serkewtin we dest bihênê; boye haşe û hûşe dekat o xoy wek pallewan denasênêt.

Le kotayî em beşe da pêwîst e amaje bem xalle giringe bideyn ke kesêti û aqar, hemîşe pêkewe hemaheng nîn; wate, dabeşbûnî kesêtiyekan be ser heft aqareke da bem sê şêwe ye:

1. Aqarî çalakî, be tewawetî legell kesêtiyeke da hember e; bo nimûne, espê ke yarmetî pallewan deda ta be şazadexan bigat, tenya yarmetîder e û tewaw.
2. Kesêtiyek le çend aqar da çalakî denwênêt; bo nimûne, bawkêk ke kûrrekey be diway karêk da denêrêt û goçanêkî efsûnawîşî pê dedat, hawkat hem berrêker e û hem bexşindeş e.
3. Be pêçewanewe, aqarêk le nêwan çend kesêti da dabeş debêt; bo nimûne, katê ejdîhayêk be destî pallewan dekûjrêt, ejdîhayekî dîke cêy degrêtewe. Lêre da dû kesêti le aqarêk da dewr degêrrin (Propp, 1386:165).

**4. Kesêtiyekanî Nêw Çîrokî Efsûnawîy Kurdî:** Be mebestî lêkollînewe le kesêtiyekanî nêw çîrokî efsûnawîy Kurdî, 90 çîrok le nawçe û zarawe corbecorekanî Kurdistan hellbijêrdiran û hewll dira çîrokekan lew nimûnane bin ke resenayetîyan le layen berhevkarane parêzrawe. Lem nêwe da pişkî Başûr û Rojhellat le parçekanî dîke zortir e û nîzik be sê le çwarî çîrokekan le xo degrêt; hoyekeşî bo ewe degerrêtewe ke deqî em dû parçeyem ziyatir le ber dest da bû û pêdeçêt em dû parçeye berhemî çapkirawyan zortir bêt.

Le nêw em 90 çîroke da, 73 daneyan be gwêrey furnûllî “Cochran” û be kellkwegirtin le xiştay be rêkewtî jimarekan (table of random numbers) ciya kiranewe.<sup>2</sup> Lem beşe da heft aqareke û çalakanî em aqarane le çîrokî efsûnawîy Kurdî da taûtwe dekeyn.

<sup>2</sup> Bo agadarbûn le naw û axêzge û jêderî çîrokekan, çaw le xiştay kotayî witareke (beşî perawêz) biken.



Be giştî, rêjey amadebûnî kesêtîyekan le 73 çîrokeke da bem çeşne ye: pallewan 73 çîrok (sercem çîrokekan), tawankar 69 çîrok, şazadexan yan kesî mebest 54 çîrok, bexşinde 49 çîrok, berrêker û yarmetîxwaz 41 çîrok, û pallewanî diroyîn 17 çîrok.

**4. 1. Aqarî Çalakîy Pallewan:** Pallewan wek giringtirîn kesêtî nêw çîrok, le her hemû deqekan da amade ye û hemîşeş be amancekey degat û be ser tawankar da serdekewêt. Çîrokî caduyî Kurdî zorbey kat, be padişayetî û hawsergîrî pallewan, yan bedesthênanî mall û saman kotayî dêt. Le nêw em 73 çîroke da tenya yek daneyan be mergî pallewan diwayî dêt (jimarey 10).

Zorbey çîrokekan yek pallewanyan têda ye, û 60 çîrokî em twêjîneweyêş herwa ye û le 13ekey dîke da ziyatir le pallewanêk amade ye (jimarekanî 3, 17, 55 û htd). Em doxe lew çîrokane da rû dedat ke layenî kem, le dû bizav pêk hatibêtin. Lewanî tirîş da pallewanêk detwanêt le çend bizav da çalakî binwênêt. Bizav birîtî ye le “peresendinî [çîrok] be çeşnê ke le tawankarî yan kemayesîyewe dest pêdekat û le paş têperrbûnî erke nawincîyekan, be hawsergîrî yan erkêkî hawçeşin kotayî dêt” (Propp, 1386:183). Lew çîrokaney ke dû yan çend pallewanyan têda ye, tenya yekêkyan pallewanî serekî ye û çîrokeke be çarenûsî ewewe girê dirawe (jimarekanî 1, 7, 17, 22, 30 û 55). Nimûneş heye ke dû yan tenanet sê çîrok têkell kirawin ke eme legell çîrokî çend bizavî da ciyawaz e (jimarekanî 22 û 27).

Babetêkî giringî dîke ewe ye ke pallewanî çîrokî efsûnawî hemîşe mirov e, û tenya le yek nimûney degmen da bûnewerêkî nîwe dêw û nîwe mirov wek pallewanî çîrok derdekewêt (jimarey 33). Em bûnewere le daykewe mirov û le bawkewe dêw e, û zortir wek yarmetîderî pallewan çalakî denwênêt (jimarekanî 7 û 22) . Le jimarey 41îş da pallewan, kurrî gawanêk e le biçimî kûleke da û diwatir derdekewêt ke le perîyan e. Şiyawî bas e ke le her çwar çîrokî amajepêkiraw da, le pallewanêk ziyatir amade ye û ewanî dîke mirovî asayîn; kewa bû detwanî billêyn le aqarî kesêtî pallewan da bûnî hemîşeyî mirov misoger e.


Yekêk le taybetmendîyekanî çîrokî efsûnawî, şêwey naasayî ledayikbûnî pallewanekan e. Em rûdawe le çîroke Kurdîyekan da zortir be hoy sêwêkewe rû dedat ke derwêşêk be padişay bawkî pallewanî debexşêt (jimarekanî 1, 20, 25, 38 û htd).

Cêy serinc e ke pallewan le dû çîrok da cige le aqarî xoy, le aqarî dîkeş da derdekewêt. Le çîrokî jimare 41 da pallewanî bizavî yekem, diway bizirbûnî, debête kesî mebest û hawserekey (pallewanî bizavî dûwem) hewllî dozînewey dedat; le rastî da em dû kese le bizavî dûwem da cêgorrkêyan kirdûwe. Pallewanî çîrokî jimare 33 tenanet debêt be tawankarîş; bem şêweye ke kiçêk le paş dozînewey birakey, nêwanî legell dêwêk da xoş dekat û pîlanî kuştinî birakey daderrêjêt. Sebaret bem hallete egerî eweş le ara da heye ke çîrokbêj dû çîrokî têkell kirdibêt.

Cige lew xallaney le serewe bas kiran, pallewanekan le pênc rehendewe taûtwe kirawin ke lêre da amajeyan pê dekirêt:

**4. 1. 1. Corî Pallewan:** Le koy pallewananî 73 çîrokeke da ke 90 pallewan in, 79yan le corî çalak û 11yan qurbanîn. Le pênc deqîş da taqe pallewanêk dû car derdekewêt; carêkyan wek pallewanî çalak û carêkîş wekû qurbanî (jimarekanî 5, 23, 30, 34 û 56). Cêy amaje ye ke zorbey pallewane qurbanîyekan le zayendî mên. Le nêw pallewanekanî corî çalak da pênc nimûne hen ke le rastî da hîç çalakîyekyan niye û yarmetîderan hemû erkekanyan we esto degrin û jinyan bo dehênin û kêşekanyan çareser deken (jimarekanî 4, 28, 31, 48 û 54). Detwanîn bo emane nawî pallewanî naçalak be kar bihênîn.


**Corî Pallewanekan**




**4. 1. 2. Pêgey Komellayeti:** Nîwey pallewanekan le binemalley padişa û desellatdaran in (36 çîrok); lewanî dîkeş da, kurr û kiçî pîrejî yan kabirayekî hejar, rawçî, şîwan, kurrekeçell, aşewan, pûşfiroş û be giştî xellkî asayîn (37 çîrok).

**4. 1. 3. Zayend û Endamêti Xêzan:** Zorîney pallewananî nêw çîrokî efsûnawîy Kurdî kurr in û le zorbey zorî çîrokekanîş da yan endamî biçûkî xêzan in yan taqanen. Lem nêwe da pişkî bira yan xuşkî biçûk zor ziyatir e.

**Zayandî Pallewanekan**




**Endamêti xêzan**



**4. 1. 4. Nawî Pallewanekan:** Taûtwekirdinî nawe taybetekan derîdexat ke rengdanewey naw le kesêti pallewan da, zor berçaw e. Le rastî da kesêtiyekanî tir be zorî, yan nawî giştîyan le ser e, yan be pêy rwallet, pêwendîy xêzanî û pîşeyan wesf kirawin; bo nimûne, dêwî heftser, ejdîhay takçaw, çilkezî, kiçî padişa, tîjro, derwêş û htd.

Le nêw em çîrokane da, 75% pallewanekan nawyan heye û ewanî dîke be gwêrey pêgey komellayeti û pîşekanyan naw birawin. Şiyawî bes e ke le koy ew pallewananey amaje be nawyan kirawe, nîweyan nawî Erebiyan heye (32 pallewan) û zorîney nawekanîş emanen: Ehmed (16 car = 50% nawe Erebiyekan), Mehmûd (6 car), mihemed (3 car). Be pêçewaney nawe Erebiyekan, nawe Kurdîyekan (31 naw) dûpatbûneweyan kem e û be tenya nawî Cemşîd (6 car) û Baram (2 car) dûpat botewe. Paşmawey nawe Kurdîyekan, her kemeyan yek car be kar hênrawin.



**4. 2. Aqarî Çalakîy Tawankar:** Giringtirîn tawankaranî nêw çîrokî efsûnawîy Kurdî, dêw, ejdîha, pîrejîn, padişa û xizme nizîkekanî pallewan in. Lêre da be mebestî polênbendîyan, be ser sê destey serekî da dabeşyan dekeyn û radey beşdarbûnyan dexeyne ber bas.

**4. 2. 1. Bûneweranî Xeyallî:** Lem girûpe da, dêw û ejdîha debînîn ke be giştî, nizîkey nîwey tawankarekan pêkdehênin. Lem çîrokane da, dêw çalaktirîn kesêti meydana ye û 37 car dewrî gêrrawe, û ejdîhaş be 12 car, le piley dûwem da ye. Şêwey derkewtinî ejdîha bem core ye ke serçawey awî xwardinewey şarêk dagîr dekar û xellkekeş be naçarî her care û kiçêk be zaryewe deden û bem core tozêk awyan dest dekewêt. Carêkyan ke serey kiçî padişa ye, pallewan rêy dekewête ew şare û ejdîhake dekujêt. Le dû çîrok da neheng cêy ejdîhay girtotewe (jimarekanî 3 û 30).


**4. 2. 2. Mirov:** Mirove tawankarekan dû destey endamanî xêzanî pallewan û xellkanî tir le xo degrêt.

a. Endamanî xêzanî pallewan, ke birîtîn le: bira gewrekanî pallewan (7 car), xuşik (5 car), dayik û zirrdayik (her kameyan 4 car), hawjîn (3 car) û bawk (2 car).

**b.Xellkî dîke:** Tawankare serekîyekanî em taqîme, padişa û wezîr û şazade û pîrejî in, ke her kameyan 12 car tawanyan encam dawê. Padişa û kurrepaşa, zortir be boney hawserî ciwan û rengînî pallewanewe dijayetîy deken û zor car bo geyîştên be amancekeyan destewdamênî pîrejinêk debîn. Hendêk carîş le ciyatî padişa, cûlekeyek em dewre degêrrêt (jimarekanî 28 û 67). Le paş em dû kesêtiye da, şazadexan û bawkî (5 car), jin û kiçanî çawçinok ke êreyî be ciwanîy kiçe pallewan debên (5 car), pîşedaranî wek bazirgan û karwanseradar û hemamçî (3 car), birader (3 car) cûleke (2 car), û mela (1 car) cê degrîn.

**4. 2. 3. Derwêş û Cadûger:** Em dû kesêtiye her kameyan şeş car wek tawankar derkewtûn. Şiyawî amaje ye ke derwêş le çîrokî Kurdî û herweha çîroke Êranîyekan da, bayexêkî taybetî heye. Em kesêtiye, hellsûkewtî wek dêw wa ye û bo geyîştin be mebestekey ke xwardinî pallewan e, riwaltetî xoy degorrêt . Şêwey derkewtinî derwêş, ziyatir bem çeşne ye ke le beranber wedîhênanî awatî padişayekî bêmindall da, mercî legell debestêt ke diwafir yekêk le kurrekanî bibat. Katêk kurrekan gewre debîn, derwêş dêtewe û yekêkyan debat; bellam kurre le nîwey rêga da be hoy Xidirî Zîndû yan kabirayekî ridênsipîyewe têdegat ke em derwêşe le rastî da dêw e û deyewêt bîxwat. Pallewan le akam da be gwêrey amojgarîyekanî Xidir decûllêtewe û derwêşeke dekujêt.

**Aqarîy Çalakî Tawankar**



**4. 3. Aqarî Çalakî Yarmetîder:** Em aqare berbillawtirîn aqarî çalakîy çîrokî efsûnawî ye û gelêk giyanleber û bûnewerî xeyallî û şitûmekî cadûyî le xo degrêt. Be mebestî baştir nasandinî yarmetîderanî nêw çîrokî Kurdî û herweha bo ewey tûşî serlêşêwawî nebîn, be şêwey jêrewe polênbendîyan dekeyn.

**4. 3. 1. Giyanleberan:** Le nêw em desteye da esp yan mayîn le hemûyan çalaktir in û 13 car wek yarmetîder derkewtûn. Giyanleberanî tir birêtîn le: tull û tajî (4 car), şêr, rêwî, pişîle û mêrûle (her kameyan 3 car), mişk û mar (her kameyan 2 car), çoleke û paşay mel (her kameyan 1 car).

Hemû giyanleberanî nêw çîrokî efsûnawî, xawen twanistî seyrûsemeren; bellam esp leçaw ewanî dîke zor ciyawaz e û baştirîn yarmetîderî pallewan e; bo

nimûne, espî behrî be naw derya da derrwat, espî balldar be asman da defirrêt û htd.

**4. 3. 2. Bûneweranî Xeyallî:** Em bûnewerane birîtîn le: dêw (15car), sîmurx (8 car), qullerreş yan xullamî Zengî yan Erebî nêw qutû (4 car), cindoke (2 car), xûl (1 car) û gozesiwaran (1 car). Herweha 4 mirov-dêwiş hen ke le bawkewe dêw û le daykewe mirov in. Em bûnewere berhemî xeyanetî dayik yan xûşkî pallewan e; bellam hemîşe piştîwanî le bira yan xallokey (pallewan) dekat û le beranber herreşey bawk û daykî da deyparêzêt (jimarekanî 7, 22, 33 û 62). Em kesêtiye tenanet le yek çîrok da, cige le yarmetî, dewrî pallewanîşî gêrrawe (jimarey 33). Herwa ke debînîn, cindoke û qullerreş û xûl, zor kem derkewtûn û be serinndan bewey ke emane pêwendîyan be ferhengî Erebewe heye, detwanîn billêyn karîgerêtî ferhengî nawbiraw le ser em layeney çîrokî efsûnawîy Kurdî zor kem e (be pêçewaney nawî pallewanekan ke nizîkey 50% Erebîn).

**4. 3. 3. Şitûmekî Cadûyî:** Rêjey keriste û şitûmeke cadûyîyekan le çîrokî efsûnawî da zor e; bellam detwanîn be gwêrey karkirdekanyan dabeşyan bikeyn. Pallewanan le şitûmeke efsûnawîyekan bo em mebestane kellk werdegrin:

- a. Bo bedesthênanî bijîw, xorak û pare: hembane borîne yan xwanî efsûnawî (4 car), mencell (3 car), hembaney pare, fanosî paresaz, paç, ser û cergî pelewer, hêlkey pelewer û kilkî şay maran (her kameyan 1 car);
- b. Bo şerr û bergirîkirdin: gurz û goçan (5 car), şimşêr (3 car), û tîr û kewan (1 car);
- c. Bo xo le çaw winkirdin: killawî sexredêw yan sexrecin yan cinde diroîyne (5 car);
- d. Bo firrîn: bermall yan qallîçe (4 car);
- e. Bo lempêr çêkirdin le katî hellatin da: şane (3 car), sabûn (2 car), lifke û teşfî aw û xwê (her kemeyan 1 car);
- f. Bo telîsm û cadû yan betallkirdineweyan: şûll (4 car), ellqe û engustîley şazadexan (3 car), cergî dêw (2 car), aw (1 car), gwêz û tirê û hencîr (her kameyan 1 car);
- g. Bo dermanî kwêrî û zîndûkirdinewe: perrî kotir û awî kanî (2 car), rîqney kotir û gellay dar (2 car);
- h. Keristey dîke: topî cîhannima û berdêkî wek çaw ke derga dekatewe (her kameyan 1 car).

Nimûney dîkey şite efsûnawîyekan qutû, engustîle, zurrna, perr û mûy bexşindekan e, ke be pallewan dedirêt ta be hoyanewe bitwanêt le katî pêwîst da yarmetî le xawenekanyan bixwazêt. Egerçî emane taybetmendîy efsûnawîyan

heye, bellam çunke pallewan be şêwey rastewxo erkêkyan pê cebecê nakat, nemanxistine rîzî keriste cadûyîyekan.

Şiyawî bas e ke hendêk car keristekan be nawî Silêmanî pêxemberewen; lewane, şûlk, qallîçe, tîr û kewan, hembane, û engustîle.


**4. 3. 4. Şazadexan Yan Perîzade:** Rêjey derkewtinî em yarmetîdere 15 car e. Em kesêtiye ke zorbey car perîzade ye, cige le erkî xoy le aqarî şazadexan da, yarmetîy pallewanîş dedat. Herweha erkî bexşindeş le esto deგრêt ke diwator basî dekeyn.

**4. 3. 5. Hawrrêyanî Naasayî:** Em hawrrêyane twanistakanyan sertir le mirovî asayî ye; bo nimûne, heyane detwanêt be ser aw da birrwat, yan her çend dexwat têrbûnî bo nîye, yan nasûtêt û htd. Hawrrêyanî naasayî le sê çîrok da, no coryan dewrî yarmetîderyan gêrrawe ke birîtîn le: kemendhawêj, tîrhawêj û pagewre (jimarey 42), deryabirr û estêrejimêr (jimarey 68), têrnexore, serbeberd (ke serî denête ser berdêk dezanêt le ser zewî û bin zewî da çî heye), ewey nasûtêt û sûkrrew (jimarey 31).

**4. 3. 6. Twanist û Taybetmendîy Seyrûsemere:** Le çend çîrokêk da bexşinde lebatî keristey cadûyî, twanist yan ciwanîyekî sersurrhêner be pallewan debexşêt ke birîtîn le: cadûgerî (4 car), têgeyîştin le zimanî ajellan be hoy tif yan jarî şay maranewe (2 car), ciwanî û bedewî be hoy aw yan baranewe (2 car), zor û hêz be hoy Xidirewe (1 car).

Yine de biz, **Şetar** bir **Takkana** değilken, Tannaitik edebiyattan **Ketuba**'nın **Takkana** (תקנה) (=reform<sup>5</sup>, ıslah) gibi/olarak kurumsal hale geldiğini biliyoruz. Üstelik **Şetar Kidduşin** 'gelinin babası tarafından' yazılmış olması icap ederken, **Ketuba** damat tarafından yazılmış olmalıdır. **Şetar Kidduşin**'un ilk zamanlarda, damat tarafından değil de, gelinin babası tarafından yazılması aynı fasılda ikinci Mişna'da "עבד עברי נקנה בכסף ובשטר" [eved 'ivri nikneh b<sup>e</sup>kesef uviştar]\* (=Yahudi bir köle şu iki yoldan biriyle satın alınabilir: Ya müşteri (alıcı) onu para vermek suretiyle karşılığını ödemek, ya da satıcı satışa ait bir sened imzalar)<sup>6</sup> şeklindeki ibare tarafından destekleniyor olabilir. Bu yüzden, biz, rahatlıkla ilk Mişna'da bahsedilen **Şetar**'ın, bir kadının üç şekilden biriyle elde edilebileceğinden söz eden yerde, -ki bu yollardan biri **Şetardır**-, kızın babası tarafından yazılması zaruri olan satışa aid bir sened olduğunu varsayabiliriz. İlk dönem Yahudilerinin bu uygulaması, Raguel'in Kızı Sarah'ı Tobit'e verdiği söylenen *Tobit Kitabı* (ספר טוביה)'nda kayıtlı edilen anlatının izlerini taşıyor görünmektedir. Ve Raguel "annesini çağırdı ve ondan bir kitap getirmesini istedi ve o bir arada yaşama yani evlilik akdini yazdı, hatta o Musa'nın şeriatına ve kavline uygun olarak onu (kızını) ona (damadına) eş olarak verdi"<sup>7</sup>.

Nihayet, biz Mişna'nın **Şetar**'dan kastettiği şeyin tamamen **Ketuba**'yla aynı şey olmadığını söyleyebiliriz, çünkü, içinde bir kadının eş olarak alınabileceğinin olduğu bu üç yoldan biri evliliği hukukî kılmak için yeterli idi<sup>8</sup>. Bir **Ketuba** tek başına evlilik bağı kurmak için yeterli değilken, **Şetar Kidduşin** tek başına yasal ve geçerli bir evlilik kurmak için yeterli idi<sup>9</sup>.

Peki **Şetar** ve **Ketuba**, tek/bir ve aynı şey değilse, o zaman **Ketuba** neydi? Mişna, **Kidduşin**'da "Bir kadının eş olarak satın alınmak sûretiyle alınabileceğini" söyler. Bu durum ilk Yahudiler arasında bir adetti. Yakup, Laban'a kızlarıyla evlenmek için hizmeti ve emeği karşılığında bu bedeli ödedi. Benzer şekilde, Davud da, Mikal'ın (מיכל) babası Kral Saul'e kızı karşılığında

<sup>5</sup> שמעון בן שטח תיקן כתובה לאשה, Tal. Şab. 14b. Krş. Ket. 82b; Tos. Ket. XII, 1; Yer. Ket. 32b.

\* Kidduşin I, 2 (Çev.)

<sup>6</sup> Kidduşin I, 16a. Ayrıca bunu, aynı fasılın, "עבד כנעני נקנה בכסף ובחוקה" şeklinde okuduğumuz üçüncü Mişnasıyla karşılaştır. Kenanlı bir köle bu üç yoldan biriyle eş olabilir: Ya alıcı para ödemek için, ya satıcı bir alışveriş senedi imzalamak için, ya da kazanılmış hak ve hukukî yolla בחוקה.

<sup>7</sup> Tobit VII, 11-14. **σὺγγραφήν** kelimesi İbranca שטר קידושין [**Şetar Kidduşin**] veya שטר נישואין [**Şetar Nisu'in**] kullanımları karşılar. Ayrıca krş. Introduction to the Book of Tobit, ed. Charles, s. 184; ve yine Rosenman, Studien z. B. Tobit, Berlin 1894.

<sup>8</sup> Kid. 8b, ve bunun dışında pek çok yerde.

<sup>9</sup> אסור לו לאדם שישהא את אשתו אפילו שעה אחת בלי כתובה, B. K. 89a. Rabbiler, bir adamın eşiyle bir saat dahi **Ketuba**'sız yaşayamayacağı görüşüne sahiplerdi, fakat **Ketuba**'sız evliliğin geçersiz olduğunu da hiç düşünmemişlerdi.

100 yüz Filistî'nin sünnet derilerini (ğulfe) başlık parası olarak ödedi<sup>10</sup>. Damadın kayınpederine kızı için ödediği para Kutsal Kitap'ta **Mohar (מוהר)** olarak isimlendirilmektedir. Şekem (שֶׁכֶם), Dinah için miktarı belirsiz **Mohar** teklif etti<sup>10</sup>. Tevrat şeriatına göre, bir kızı iğfal eden kişinin kızın babasına bakireler için ödenen Mohara eşit miktarda yüksek miktarda ödeme yapması gerekir<sup>11</sup>. Kısmen okunan (M.Ö. yaklaşık 441'le tarihlendirilen) Elephantine [ελεφαντινη] El yazması papirüste ( Miktavey Yav= **מכתבי יב**, Te'ûdot Yav= **תעודות יב**, HaPapyrusim şel Yav= **הפפירוסים של יב**) şöyle geçer: “Bugünden sonsuza değin, o, benim eşimdir ve ben de onun kocasıyım. Ben, kızınız Miftahiya (=מפטחיה) için size toplam 5 şekel verdim”<sup>12</sup>.

**Kesef** kelimesi Mişna'da, Şammai ve Hillel ekolleri tarafından ifadenin antikitesini yansıtacak şekilde tefsir edildi. Yahudi şeriatını literal yorumlayan Şammai ekolü, **Kesef** kelimesinin Mişna'da kendisine işâret edilen gümüşü temsil ettiği fikrini sürdürdüler, bundan dolayı, onlara göre, bir kadını, o zamanın en küçük gümüş birimi olan 1 dinarla ya da bir dinar değeriyle satın almak mümkündü. Yahudi şeriatını ruhuna/espirisine uygun olarak yorumlayan Hillel ekolü, Mişna'daki **Kesef** kelimesinin genelde para anlamına geldiği şeklindeki fikirlerini devam ettirdiler ve böylece, onlara göre de, bir adam, para kıymetine hâiz herhangi bir şeyle bir kadını satın alabilir<sup>13</sup>.

Aynı zamanda bir kadın, sözkonusu kızın babası tarafından yazılan **Şetar**'la, yani bir satış akdi ya da hibe senedi ile eş olarak (satın) alınabilirdi. Tobit hikayesinde, Raguel'in kızı Sarah'ı Tobit'e bir eş olarak verdiği zaman, onun bir kontrat **συγγραφήν** yazdığından ve bunun tek başına yeterli ve bağlayıcı addedildiğinden söz etmiştik. Bir kızın, bir eş olarak alınabilmesinin üçüncü şekli **ביאה** yani ‘usus’ idi. Aynı şekilde, eski Roma hukuku, bir kadının **coemptio, confarreatio**, ya da **usus** olmak üzere bu üç yoldan biriyle alınabileceğini şart koşar.

Kadınların toplumdaki statülerinin yükselişine/yükselmesine ilgi duyan Hellenistik dönemdeki ilk Tanna'lar (Tannaim), kendilerini evlilik akdinde bir reform yapmaya girişmekten (bilerek) uzak tutmuşlardır. Önceden, Halaka, boşanma ya da kocasının ölümü halinde zevcenin ekonomik refahını sağlayacak herhangi bir kural koymamıştı. O (kadın), kocasının kapisine ve şımarıklığına

<sup>10</sup> Bkz. 1 Samuel 18: 25.: “Saul şöyle dedi: Davud'a söyleyin ki, Kral düşmanlarından öç almak için başlık parası olarak yüz Filistinin sünnet derisinden başka bir şey istemiyor. Davud'un Filistilerin eline düşüp öleceğini tasarlıyordu.”

וְאִמְרָה שְׂאֵל כְּדֵר־הַתַּמְרֵי לְדָוִד אֲיִן־חָפֵץ לְמַלְךְ בְּמִתְרָא כִּי בְמֵאֵל עָרְלוֹת פְּלִשְׁתִּים לְהַנְקֵם בְּאֵבֵי הַמַּלְךְ וְשְׂאֵל הַשֵּׁב לְהַפִּיל אֶת־דָּוִד בְּיַד־פְּלִשְׁתִּים:

<sup>10</sup> Tekvin 34: 12.

<sup>11</sup> Çıkış 22: 15-16.

<sup>12</sup> Bkz. Cowley, *Aramaic Papyri of the Fifth Century B.C.*, 1923, s.44 vd.: s.44 vnd. ועד: מן יומא ונה ועד: [Mkoma şel halaka be-hokmat Yisrael- Yeruşalayim] Doğru olan yorumun kaydedildiği yer.

<sup>13</sup> מקומה של הלכה בחכמת Křš. L. Ginzberg, בית שמאי אומרים בדינר ובשוה דינר בית הלל אומרים בפרוטה ובשוה פרוטה. [Mkoma şel halaka be-hokmat Yisrael- Yeruşalayim] Doğru olan yorumun kaydedildiği yer.

maruz kaldı. Hatta erkek öfkelenildiğinde, normalde o (koca) bunu yapmaması gerektiği üzerinde düşüneneğine, kendinden yana en ufak bir tereddüd etmeksizin karısını boşayabilirdi. Bu kötülük ve haksızlığın önüne geçmek için, **Takkana**'yı evlilik kurumuna vazetmiş olan ilk dönem Yahudi din adamları Tanna'lar (Tannaim), **Ketuba** olarak bilenen ve damadın kızın babasına vermek zorunda olduğu 200 zuzimi, boşanma ya da eşinin ölümü halinde kadına geri verilmesi/teslim edilmesi hükmünü getirmişlerdir<sup>14</sup>. Bu **Takkana** sadece kısmen durumu ve şartları iyileştirdi, zira kadın, kocasının ölümü yahut ondan boşanması esnasında aldığı 200 zuzimle sadece ekonomik açıdan korundu. Ancak boşanma, koca için hâlâ çok basit mevzu olarak kalmaya devam etti. Filistin Talmudu bu durumu: "והיתה קלה בעיניו לגרשה"<sup>15</sup> [Onun (koca) için, onu (karıyı) boşamak kolaydı] diyerek izah eder.

Kadının statüsünü iyileştirmeyi hedefleyen **Ketuba**'ya ait bu **Takkana**, 200 zuzimi kazanırken/temin ederken karşılaşılan zorluk yüzünden, fakir olanların üzerine balyoz indirilmişçesine yıkım getirdi. Ve bu nedenle, evlilik akdi süresi belli olmayan bir zamana kadar ertelendirdi. Bu durum Talmud'da açıkça ifade edilir<sup>16</sup>. Damadın ekonomik yükünü kaldırmak ve aynı zamanda kadının da ekonomik açıdan korunmasını sarsmamak için, Yahudî din adamları Tanna'lar bir adım daha ileri giderek **Takkana**'yı (hükmü)–"damadın kıza (geline) 200 zuzim ödemek zorunda olmadığına, ancak bu parayı işinde kullanmak için elinde tutmasına, ve bunun yerine de, onun (damadın) sahip olduğu bütün servetini, 200 zuzimin teminatı / rehni olarak verdiğini beyan eden bir **Ketuba** belgesi yazması gerektiği"- şeklinde değiştirerek hafiflettiler<sup>17</sup>. **Ketuba**'nın bu son haliyle, Yahudi din adamları Tanna'lar kendi zamanlarının koşullarının gerektirdiklerini karşılamışlardı; kadın (zevce) boşanma ya da kocasının ölümü durumunda ekonomik olarak güvenli bir konuma geldi; malî yük damadın omuzlarından kaldırıldı, zira böylece o (damat) da evlilik esnasında 200 zuzim vermekten kurtuldu. Yine de, aynı zamanda boşanma, koca için şimdiki kadar olanlardan daha çok zorlaştırılmıştı. O (koca), bundan dolayı, sadece boşanma zamanında, doğal olarak hızlı bir şekilde kendisine bir boşanmayı temin edecek parayı peşin vermek zorundaydı.

Biz, şimdi Rabbi Meir ve Rabbi Judah arasındaki ihtilafı anlamak için daha iyi bir konumdayız<sup>18</sup>. Rabbi Meir'e göre, eş (karı, zevce) ve câriye (nikahsız köle

<sup>14</sup> Yer. Ket. 32b. בראשונה היתה מונחת כתובתה אצל אבותיה.

<sup>15</sup> Aynı yer.

<sup>16</sup> Ket. 82b. "לבתולה מאתים ולאמנה מנה יהיו מוקנין ולא היו נושאין נשים {נותנין} תניא נמי הכי בראשונה היו כותבין."

<sup>17</sup> Talmud'un bu Takkana'sı (hükmü), Šimon ben Šetaḥ'a atfedilir: "עד שבא שמעון בן שטח ותיקן שיהא כותב" Yer. Ket. 32c, B. Aynı eser, 82b. "בראשונה שהיתה כתובה אצל אחיה והיתה קלה." Yer. Ket. 32c, B. Aynı eser, 82b. "לה" כל נכסי אחרין לכתובתה". בעיניו להוציאה התקין שמעון בן שטח שתהא כתובתה אצל בעלה והיה כותב לה כל נכסי ראית לי אחרין וערבאין לכסף "כתובתיך" Tos. Ket. XII, 1.

<sup>18</sup> איזו היא אשה ואיזו היא פלגש? רי מאיר אומר: אשה יש לה כתובתה ופלגש אין לה כתובה. רי יודה אומר: אחת זו ואחת זו יש. Yer. Ket. 29d. לה כתובה אשה יש לה כתובה ותנאי כתובה פלגש יש לה כתובה ואין לה תנאי כתובה.

kadın) arasındaki fark, eş'in **Ketuba**'ya sahip olması, câriyenin **Ketuba**'sının olmaması. Rabbi Judah'a göre ise câriye de bir Ketuba'ya sahipti. Yani, kocanın ölmesi durumunda, karı (eş) para alırdı. Bununla beraber, eş (karı), **Ketuba**'ya kocanın bütün servetinin (Mohar bedeli) 200 zuzimi teminat altına almak için rehin kaydını şart olarak koymasındır. Bu kısım, câriyenin Ketuba'sına yazılmaz. Cariye, eğer sabit bir mülk ya da 'ikâr olursa para alabilir ve bud a tamamen mirasçılarını iyi niyetine bağlıdır.

**Takkana** [תקנה] başlangıçta boşanma ya da kocalarının ölümü halinde çaresiz ve perişan kalacak kadınları korumak amacıyla konuldu. Yahudi din adamları Tanna'lar, servet sahibi kadınlara, bu **Takkana**'nın bir yararı dokunmayacağını ve bir Ketuba olmaksızın evlenebileceklerini ve bu durumun da **Takkana**'nın evrenselliğini geçersiz kılacağını anladılar. Bu **Takkana**'ya bir süreklilik-devamlılık ve genel uygulanabilirlik<sup>19</sup> gücü vermek için, yahudî din adamları (Tannaim), -zevce **Ketuba**'ya dair rüchan hakkından feragat etse de-, kocaya eşiyile (karısıyla) bir **Ketuba**<sup>20</sup> olmaksızın yaşamasını yasakladı.

Bir Takkana hem Yahudî Kutsal Kitap yazınında hem de geleneksel hukukunu oluşturan Halakalarda kimi destekler bulduğundan, **Ketuba** reformu bu yüzden erken bir Halaka'ya<sup>21</sup> (kararlaştırılmış hukukî bir kural, uygulama) istidlal yoluyla vazedilmiştir. Bir kadının eş olarak (zevce) elde edilebilmesinin üç yolundan biri **Şetar**'dır. Önceden **Şetar**, kızın babası tarafından yazılırdı ve sonuçta Tobit'in hikayesinde de yukarıda gördüğümüz gibi dînî törenin (tekes) önemli bir parçası haline geldi. Bu **Şetar**, Roma hukukundaki *confarreatio*'ya benzer. Yahudi din adamları (Tannaim), **Şetar**'ın damat<sup>22</sup> tarafından yazılmış olması ve bunun biri Kidduşin ve diğeri 200 zuzim ile ilgili taahhütü içeren iki kısımdan oluşması gerektiği şeklinde **Ketuba** reformunu yorumladı. Bu sebeple, **Ketuba**, o zamanların ekonomik şartları tarafından zaruretten dolayı yapılmış bir reformdur.

<sup>19</sup> Bir Takkana (hüküm) kendi gerçek doğası itibarıyla aslında evrenseldir, kalıcıdır ve bütün durumlara uygulanabilir. Takkana'nın hedefi, din ve hayatın ahenk ve dengesini sağlamak (için) amacıyla, ya bir kıssa, ya Tevratî şeriatın yorum veyahut ilk dönemdeki bir Halaka (hadisteki bir sünnet ve uygulama gibi) vasıtasıyla Şeriat'ın modifikasyonu (kısmî değişiklik, tadilat) ve iyileştirilmesini temin etmektir. Bkz. S. Zeitlin, "The Halaka in the Gospels", *H. U. C. Annual*, Cilt I, 365; a.g.mü., "Takkanot Ezra", *JQR*, 1917.

<sup>20</sup> B.K. 89a.

<sup>21</sup> Talmudî ifadeye göre (Ket. 10. Krş. Yer. Ket. 36b), Ketuba'ya dair Takkana (hüküm), Tanakh'ın "ישקול כסף כמהר הבתולות, מכאן סמכו חכמים לכתובה אשה מן התורה" ayetinden çıkarılmıştır. Bu ifade, Ketuba'da yazılacak olan 200 zuzim cümlesindeki bente işaret eder. Krş. Mek. 17. "ואין מהר אלה כתובה". Bununla beraber, Şetar Ketuba, ilk dönemdeki bir Halaka'dan çıkarıldı.

<sup>22</sup> Tos. Kid. I, 2'de bulunan "אפילו כתב לה על החרס ונתן לה על שטר פסול" şeklindeki ifade Ketuba'nın henüz ortaya çıktığı bir döneme işaret eder gözükmektedir.





Kitap Tanıtımı | Book Review







## DANASÎNA PIRTÛKAN

**Mîkaîl Bilbil, *Helbesta Cegerxwîn û Îqtîdar*, Weşanên Lîs, Diyarbekir, 2016. (115 rûpel)**



Di dîroka akademiya Tirkiyeyê de sala 2009an jî bo ziman, çand û edebiyata kurdî (kurmançî û zazakî) saleke girîng e; lewre wê salê pêngaveke nû hate avêtin û ewil li Zanîngeha Mardîn Artukluyê bi navê Enstîtûya Zimanên Zindî saziyeke akademîk hate damezrandin û tê de beşên Ziman û Çanda Kurdî, Ziman û Çanda Erebi û Ziman û Çanda Sûryanî hatin vekirin. Dûv re li Zanîngeha Bîngolê, Zanîngeha Mûş Alpaslanê, Zanîngeha Dîcleyê û Zanîngeha Wan Yuzuncu Yilê yan di bin banên enstîtûyên serbixwe, yan jî di bin banên enstîtûyên zanistên civakî de beşên Ziman û Çanda Kurdî û beşên Ziman û Edebiyata Kurdî hatin avakirin. Ev beşên navborî saziyên akademîk bûn û ewil berê xwe dan perwerdeya xwendekarên lîsansa bilind û heta niha bi hezaran kesan jî van enstîtûyan bawernameya lîsansa bilind a bêtez û lîsansa bilind a bitez wergirtine. Di warên wekî edebiyata klasîk a kurdî, edebiyata gelêrî ya kurdî, edebiyata modern a kurdî, ziman û çanda kurdî, perwerdehiya zimanê kurdî hwd. bi sedan projeyên masterên bêtez û bi dehan tezên mastirê hatine pêşkeşkirin. Bê gûman van xebatên akademîk di warê kurdolojiyê de heyecanek pêk aniye, lê ew xebat bi qada akademîk ve sînordar nemane, lewre piraniya wan tezên lîsansa bilind wekî pirtûk jî hatine çapkirin û gehîştine ber destê raya giştî.

Yek ji wan tezên ku wekî pirtûk hatiye çapkirin, xebata Mîkaîl Bilbil a bi navê *Helbesta Cegerxwîn û Îqtîdar* e. Mîkaîl Bilbil lîsansa xwe li Zanîngeha Çûkûrovayê, di beşa Mamostetiya Grûpa Felsefeyê de qedandiye. Lîsansa Bilind li Zanîngeha Mardîn Artukluyê kiriye û ev xebata xwe jî weke teza lîsansa bilind di sala 2013an bi şewirmendiya Doç. Alk. Dr. Abdurrahman Adak nivîsiye. Niha li Zanîngeha Mardîn Artukluyê wekî wanebêj dixebite û di asta lîsans û lîsansa bilind de dersên rêzimana kurdî, vegêrana devkî û nivîskî dide xwendin. Bilbil sala 2008an digel Bahoz Baran pirtûkeke bi navê *Rêzimana Kurmancî* nivîsiye, ev pirtûk jî aliyê Enstîtûya Kurdî ya Amedê ve hatiye çapkirin. Dîsa sala 2009an digel Îsrafil Bilbil ji bo Odeya Tabîban a Amedê pirtûkeke bi navê *Anamneza Kurmancî* amade kiriye. Her wiha sala 2015an digel Çetîn Taş û Ramazan Pertev ji bo kesên tirkîaxêv bi navê *30 Günde Kolay Kürtçe* amade kiriye. Ev pirtûka ku wekî rêbera axaftinê hatiye amadekirin, jî aliyê weşanên Fonoyê ve hatiye çapkirin. Mîkaîl Bilbil wek pisporê rêzimana kurdî (kurmancî) tête nasîn û ew xebatên xwe yên di vî warî de berdewam dike.

Ev xebata Mîkaîl Bilbil a bi navê *Helbesta Cegerxwîn û Îqtîdar*, jî bilî kurte û pêşgotinê ji du beşên serekê û encamê pêk tê. Di kurteyê de, ku di eslê xwe de kurteya teze jî ye, Bilbil motîvasyona amadekirina vê berhemê tîne ser ziman. Di pêşgotinê de jî armanca pirtûkê tîne ser ziman: “Di vê xebatê de rengvedana têgeha îqtîdarê ya di helbestên Cegerxwîn de hatiye şîrovekirin ku ew ji aliyê Kurdan ve weke yek ji helbestvanên herî mezin ê edebiyata Kurdî yê sedsala bîstan tê zanîn.”

Beşa ewil xwedî sê binbeşan e. Binbeşa ewil li ser jiyana û berhemên Cegerxwîn e. Mîkaîl Bilbil ev binbeşa bi sernavê “Bi Kurtî Jînenîgarî û Berhemên Cegerxwîn” gelek kurt vebiriye, jî ber ku pirtûk ne bi giştî li ser jiyana Cegerxwîn, lê li ser helbestên wî û tîkiliyên îqtîdarî ye. Binbeşa duyem a beşa ewil bi sernavê “Xebatên Sereke yên di Derbarê Cegerxwîn de” ye. Em jî vê binbeşê hîn dibin ku jî bilî jiyannameya Cegerxwîn, li ser jiyana û berhemên wî hem li başûrê Kurdistanê, hem li Rojavayê hem li nav Kurdên Qafqasyayê hem li Dîyasporayê hem jî li bakurê Kurdistanê heta niha gelek tezên akademîk, xebatên monografîk û pirtûkên edîtoriyal hatine amadekirin. Mîkaîl Bilbil di pirtûka xwe de van xebatên navborî bi bîr dixê, wan dide nasîn û bi kurtî behsa naveroka wan diket. Lê belê nayîne ser ziman ka çi wekhevî û cudahî hene di navbera xebata wî û xebatên beriya wî de, çi taybetmendî, vê xebata wî dikin yekta. Binbeşa sêyan bi sernavê “Rêbaza Xebatê, Têgeh û Keresteyên Ku di Xebatê de Hatine Bikaranîn” e. Bilbil di vê binbeşê de tîne ser ziman ku ew ê bi rêbazeke xwîner-navendî, bi gotineke din bi şîroveyên psîkolojîk û sosyolojîk ve li ser helbestên Cegerxwîn bisekine û jî bo piştrastkirina van ramanên xwe jî referansa xwe ji Tzvetan Todorov û Terry Eagleton digire û jî van her du zanyaran jêgirtinan dike. Gava mirov li temamê pirtûkê dinêre, tê dît ku Bilbil bi rastî jî daye ser vê rêbazê û jî vê rêyê cuda nebûye, lewre wî hinek risteyên Cegerxwînî bi temamî jî nêrîneke sûbjektîf şîrove kirine.

Di beşa duyan de ku ji şeş binbeşên cuda pêk tê, Bilbil êdî dikeve nav mijara sereke ya pirtûkê. Li şûna ku li ser îqtîdar û têkiliyên îqtîdarî çarçoveyeke teorîk a serbixwe pêşkeş bike, Bilbil di destpêka her binbeşê de, derbarê têkiliyên îqtîdarî yên bi wê binbeşê ve eleqedar yek an jî du rûpel agahiyên teorîk pêşkeş diket. Binbeşên beşa duyan bi rêzê ve xwedî van sernavan in; *edebiyata neteweyî û îqtîdar, rediyeya îqtîdarê, zanîn û îqtîdar, mîmarî û îqtîdar, dînitî û îqtîdar, raveya fermanî û îqtîdar di helbestên Cegerxwîn de.*

Mirov dikare bibêje Bilbil hem bi referans û çavkaniyên xwe, hem jî bi şîroveyên xwe heqê van binbeşan daye, lewre ji zanyar û feylesofên wekî M. Foucoult, B. Anderson, G. Jusdanîs, L. Althusser, D. Erasmus hwd. derbarê mijara têkildar de jêgirtinên di cih de dike û hewl dide ku şîrove û ramanên xwe yên li ser helbestên Cegerxwînî piştrast bike. Ev yeke nîrxê akademîk ê pirtûka Bilbil zêde diket, lê belê divêt bête gotin ku ev jêgirtinên hanê li hin cihan dibin dezavantaj û astengî ji bo herikbariya metnê pirtûka Bilbil, ji ber ku Bilbil ev pirtûkên hanê ne bi zimanê wan ê resen, lê belê piraniya wan jî wergerên bi tirkî xwendine û gava jêgirtinê jî vêca ew wergera tirkî wergerandiye ser kurdî. Mirov dikare bibêje ku ev rewşa hanê ne taybetmendiyeke tezê, anku pirtûka Bilbil tenê ye, di piraniya tezên akademîk yên ku bi kurdî (kurmançî/zazakî) hatine amadekirin de kêma zêde heman pîrsgirêk derdikeve, bi ya min divê ev cîhana weşangeriya kurdî de bê nîqaşkirin û hemû nebin jî qet nebe pirtûkên sereke yên zanyarên cîhanê ji bo kurdî bîn wergerandin da ku rêyeke hêsantir vebe li ber lêkolîn û xebatên akademîk ên bi zimanê kurdî.

Bi ya min aliyekî din ê ku nîrxê xebata Bilbil zêde diket: Çavkaniyên wê yên bi zaravayên cuda yên bi kurdî ne. Bilbil hewl daye xwe bigehîne xebatên akademîk ên li ser Cegerxwîn û berhemên wî li her çar parçeyên Kurdistanê bi zaravayên kurmançî û soranî hatine nivîsîn. Hêvî dikim ev yek ji bo hemû lêkolîner û akademîsyenên kurd ên li Bakur bibe mînak da ku ew jî xwe bigehînin xebatên bi hemû zaravayên kurdî.

Wek encam dikarim bibêjim ku ev xebata Mîkaîl Bilbil bi dîtin û tesbîtên balkêş û di cih de, bi çavkaniyên xwe yên dewlemend û pîrzarava xwedî nîrxekî bilind ê akademîk e; û ji ber ku li Bakur yek ji ewiltirîn tezên akademîk e, herwiha ewiltirîn xebata serbixwe ye li ser helbestên Cegerxwînî, xwedî cihêkî taybet e di xebatên akademîk û cîhana weşangeriya kurdî de.

### Şehmuz KURT

Lêkolîner, Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

**Edebiyata Kurdî ya Gelêrî I (Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî), ed. Ramazan Pertev, Weşanên Avesta, Stenbol, 2015.  
(344 rûpel)**



Xebatên edebiyata gelêrî, di nav xebatên kurdî de beşa ku herî zêde di pêş de ne. Lê mixabin hema hema ev xebat hemû li ser berhevkarîyê ne. Kêm xebat hene ku ji aliyê teorîk ve edebiyata gelêrî ya kurdî nirxandine. Ev ji bo xebatên zanistî kêmasiyek mezin e û pêdiviya xebatên teorîk roj bi roj zêde dibe. Bi taybetî piştî ku li bakurê Kurdistanê enstîtuyên ziman, çand û edebiyata kurdî vebûn, pêdiviya pirtûkên teorîk bêhtir xwe daye xuyakirin. Xebata ku Ramazan Pertev edîtorîya wê kiriye, Edebiyata Kurdî ya Gelêrî I (Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî), yek ji xebatên ewil e ku ji aliyê teorîk ve edebiyata kurdî nirxandiye.

Edebiyata Kurdî ya Gelêrî di sala 2015an de ji aliyê weşanxaneya Avestayê ve hatiye weşandin. Ev xebat ji duwazdeh gotarên derbarê beşên curbicur ên folklorê pêk tê. Edîtorê vê berhemê Ramazan Pertev li Zanîngeha Mardîn Artuklu di beşa Ziman û

Çanda Kurdî de waneyên Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Folklorê Berawirdî, Edebiyata Zarokan dide. Herwiha ji bilî vê xebatê jî çend berhemên wî din jî wekî “Zarok û Çîrok”, “Folklorê Kurdî”, hene ku ew jî derbarê folklorê de ne. Lewma em dikarin bibêjin edîtorê vê pirtûkê di qada xwe de wekî pêşengek û otorîte jî tê dîtin.

Ji bilî edîtor, herçi hemû ne akademîsyên bin jî, hemû nivîskarên gotarên di vê pirtûkê de li ser folklorê ji aliyê curbicur xebitîne. Lewra em dikarin bibêjin çî edîtor çî jî nivîskarên din ê vê berhemê xwedî tecrûbe ne û di vê qadê de xwedî gotin in.

Wekî ku me li jor jî gotibû di edebiyata kurdî de valahiya berhemên teorîk heye û ev jî ji bo xebatên kurdî kêmasiyek mezin e. Jixwe wekî ku edîtor bi xwe jî dibêje armanca amadekirina vê berheme ew e ku qismek jî bê vê valahiya dabigire. Bi vê mebestê wî hewl daye ku çend mijarên folklorê bi awayek zanistî û rêkûpêk werin vekolîn û hêvî dike ku bi nêrîneke zanistî asta xebatên vî warî bilindtir bike.

Berhem ji du beşên sereke pêk tê. Beşa yekem ji gotarên li ser teorî, dîrok, rêbaz û lîteratura folklorê kurdî pêk tê. A duyem jî ji gotarên folklorê berawirdî pêk tê.

Di beşa yekem de heft gotar hene. Gotara yekem ji aliyê edîtor Ramazan Pertev ve bi navê *Danasîn û Rewşa Giştî ya Xebatên li ser Folklor û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî* hatiye amadekirin. Wî di vê gotara xwe de bi giştî li ser girîngiya folklorê, dîroka berhevkarîyê, pirsgirêkên berhevkarîyê, dîroka berhevkarîya kurdî, kesên ku berhevkarî û xebatên folklorê kurdî kirine, rewşa xebatên folklorê kurdî ya halîhazir lêkolîn kirine.

Di gotarên din ên vê beşê de Bedran Hikmet, têgehên “folklor” û “gel” hûr û kûr vekolîye. Ji bilî wan jî çend teoriyên folklorê wekî “Teoriyên Metin Navendî”, “Teoriyên Avahîsaz/Strukturel” û “Teoriyên Kontektî” dide nasîn û folklorê kurdî li gor van teoriyan dinirxîne. Azad Aslan di gotara xwe bi navê *Folklor û Netewîtiya Kurd a Ewil/Guherînên Girîng ji Osmanîtiyê ber bi Netewîtiya Kurd ve* de li pey bersiva du pirsan digere: “Gelo netew û netewperwerî çî ye?” û “Têkiliya wan bi folklorê re çî ye?” û pêvajoya netewîbûna tevgera kurdî rave dike. Bünyamin Demir, li gor rêbaza Stith Thompson *Destana Siyabend û Xecê* ji aliyê motîfan ve nirxandiye û her yek motîf bi awayekî berfireh rave dike. Di gotara *Tradîsyon û Duajoyên Evdalê Zeynikê* de Sedat Ulugana Evdalê Zeynikê wekî avakarê tradîsyonekê dinirxîne û duajoyên wî jî dide nasîn. Reşo Zilan ligel metna *Destana Kela Dimdimê*, hemû xebatên derbarê wê de jî vedikole û nivîsekê têt û tijî li ser vê destanê amade dike. Gotara dawî ya di vê beşê de bîblîyografyayêke destanên kurdî ye ku ji aliyê Ruken Çaliştiran ve hatiye amadekirin. Çaliştiran, di bîblîyografyaya xwe de çavkanî ne tenê wekî nav dane lê ew çavkanî rave jî kirine.

Beşa duyem a vê xebatê ji pênc gotarên pêk tê ku her yek ji wan li ser mijarên cûrbicûr ên folklorê bi awayekî berawirdî disekine. Gotareke Pertev, di vir de jî heye ku ew li ser bandora modernîzmê di xebatên ewil ên folklorê kurdî û tirkî de disekine. Wekî ku Pertev jî bal dikşîne ser, bi hev re jiyîna kurd û tirkên a di Dewlata Osmanî de dibe sedema tesîrgirtineke hevşib ji aliyê modernîzmê ve.

Di sa di vê beşê de Shahab Vali, xebatek berfireh li ser Şahname kiriye û Şahnameya Firdewsî û Şahnameya kurdî ji gelek aliyan ve berawird kiriye. Kadri Yıldırım, ne berhem lê du helbestvanên gelêrî (Yunus Emre û Feqiyê Teyran) ji çend aliyan ve berawird kirine ku yek ji wan kurd e yê din jî tirk e. Michael L. Cheyt di gotara xwe ya bi navê *Xwedîtiya Hevbeş (Shared Ownership) û Zargotina Kurdî* de dixwaze teoriya “xwedîtiya hevbeş” li ser çend mînakên kurdî bisêpîne û bide nîşandan ku ev teorî pir rehet dikare li ser zargotina kurdî û zargotinên cîranên wê jî were sêpandin. Gotara dawî ya vê beşê ji aliyê Ariya Toprak ve hatiye nivîsîn. Toprak, li gorî teoriyên postkolonyal nîşanî me dide ku werger çawa ji bo asîmîlasyonê hatine bikaranîn.

Li gorî me tevî hemû serkeftiyên xwe xebat ji du aliyan ve dikare were rexnekirin. Hin nivîs hene ku pir dirêj in û ji ber vê jî agahiyên ku bi babetê ve

ne eleqedar cî girtine. Li gorî me ew nivîsa Kadri Yıldırım ku li ser Feqiyê Teyran û Yunus Emre ye li ser tixûbê edebiyata klasîk û gelêrî hatiye nivîsîn û heta bêhtîr dikeve nav tixûbê edebiyata klasîk.

Di encamê de em dikarin bibêjin ku ev xebata ku ji gotarên derbarê mijar û rêbazên curbicur ên folklorê pêk tê. Lewma ev xebata ku li ser dîrok, destan, çîrok, efsane, dengbêj, helbestvan, teoriyên folklorê û hwd. disekine û dê valahiyeke edebiyata kurdî ya gelêrî dabigire. Herwiha ji aliyê hûnandin û naveroka xwe ve jî her nivîs bi serê xwe pir dewlemend e ku her yek dikare ji bo xebatên siberojê jî bibe mînak. Bi taybetî jî ji bo lêkolîner û xwendevanên beşên kurdî yên di akademiyan de, ev xebat dê pir bikêrhatî be. Lêkolîner di bin paşxaneyê de xebatê de, dê bikaribin mînakên nû derbixin holê.

### **Bünyamin DEMİR**

Lêkolîner, Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê



**Remezan Alan, *Destpêkek Ji Bo Zanista Edebiyata Modern*,  
Weşanên Peywend, Stenbol, 2015. (222 rûpel)**



Di navbera rexne û lêkolînên derbarê beşên edebiyatê de, ji aliyê hilberîn û serfkariyê ve rewşeke balkêş a edebiyata modern heye. Ji beşên din cuda herî zêde rexne û lêkolînên edebiyata modern tên xwendin. Ev xwendin bi qasî ku xwendineke karî be ji bo hinek xwendekarên zanîngehan, ewqas jî xwendineke dildayî û şexsî ye ji bo meraqdarên edebiyatê. Axirî ev xwendina li ser metnên edebiyata modern, weke mijûliyeke entelektuel û zewqeke pêzanîne îro di rewacê de ye. Lê belê li aliyê din, di fakulte û enstîtuyên edebiyatê de ji tercîh û xebatên xwendekarên mastir û doktorayê em seh dikin ku lêkolîn û xebatên edebiyata modern, li gor xebatên edebiyata gelêrî, edebiyata klasîk, zimannasî û beşên din piçekî kêmtir in. Em sebeba vê rewşê di vê yekê de dibînin ku kêmtir zêde teşe, qaîde û sînorên dîsîplînen din çêbûne, lê edebiyata modern weke qadeke bêsinor li benda analîz, lêkolîn û şîrovevên

lêkoleran maye. Ji ber ku ev war, bi awayekî siruştî her tim di nava geşedanekê de ye. Xebatên derbarê wê de jî ne ku li gor sîstem û qalibekî hazir dimeşin, her hewildana serketî ya edebiyata modern, weke berhemeke afirîner dikare bê dîtin. Lewra gotin û îdîayeke wê ya nû heye.

Di warê edebiyata kurdî ya modern de Remezan Alan an bi navê xwe yê fermî Ramazan Çeçen, yek ji wan kesan e ku serê xwe bi vê beşa aloz û çetîn diêşîne. Alan, ji beşa Ziman û Edebiyata Tirkî ya Zanîngeha Dicleyê mezûn bûye. Ev heta sala 2012an di lîseyên curbicur de wek mamosteyê edebiyata tirkî xebitiye. Ji 2012an û vir ve ew li Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê di beşa Ziman û Çanda Kurdî de wek mamoste dixebite. Ew li vê enstîtuyê û li beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, di polên lîsans û lîsansa bilind de, dersên edebiyata kurdî ya modern, rexneya edebî, vegêrannasî û zanista edebiyata modern dide. Di gelek kovarên bi kurdî û tirkî de li ser folklor, teoriya edebiyatê û bi taybetî li ser edebiyata kurdî ceribîn û gotarên wî yên rexneyî, lêkolînî weşiyane. Heta niha pênc berhemen wî hatine weşandin. Yekem pirtûka wî romana *Saturn* di 2002an de; *Bendnameya* ku ji gotar û ceribînên curbicur ên derbarê edebiyatê de pêk tê di 2009an de; *Folklor û Roman* ku teza wî ya mastirê ye, di 2013an de; *Tîr û Armanca* ku ligel Ergin Öpengin edîtorê wê ye di

2014an de û herî dawîn jî xebata wî ya *Destpêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern* di 2015an de hate weşandin. Bi qasî ku em dizanin niha bi Farangîz Qaderî re li ser destpêka helbesta nû ya kurdî xebateke hevbeş didomîne.

Dikare bê gotin ku pirtûka *Destpêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern* (ji vir pê de bi tenê em ê weke *Zanista Edebiyata Modern* bi nav bikin), di warê xwe de mîna ke ewilîn e. Lewra pêşiya vê xebatê li sehaya Bakur, derbarê teoriya edebiyatê de bi şêwazeke akademîk pirtûkeke wiha nehatiye nivîsîn. Ev pirtûk jî pêşgotinek, sê beşên sereke û ji encamê pêk tê. Pirtûk, wekî ku xwediye wê jî di "Pêşgotin"ê de aniye ziman, li ser sê xalên sereke ava bûye ku ev xalên ha di heman demê de armancên sereke yê pirtûkê ne: Diyardeyên ku modernbûnê derxistine meydanê çî ne û van rengê çawa anîne edebiyata nû; bi modernîteyê re naveroka têgehên edebiyatê guherîneke çawa derbas kirin û bi mîrasa modern re di nav rexne û şîroveyê de disîplînen çawa çêbûn, ji duh heta îro yelpazeyê çawa heyê li ber destan.

Lewma di beşa yekem de ku navê wê "Têkiliya Modernîteyê û Edebiyata Modern" e, pirtûk armanc dîke ku peywenda modernîte û edebiyata modern ronî bike; bi modernîteyê re di nav edebiyatê de fêhm, parametre û guherînên çawa çêbûn destnîşan bike. Ji bo vê yekê Alan dikeve nav têgehên sereke yê modernîteya ewrûpî û modernîzasyonên der-ewrûpî û şopa wan li ser naveroka nû ya roman, helbest û pexşanê digerîne. Beşa duyem a ku navê wê "Edebiyat, Metin û Cure" ye, binbeşa pêşîn jî bo têgehên sereke yê edebiyatê û teoriya edebiyatê hatine veqetandin. Di vê beşê de pirtûk destnîşan dîke ka têgehên weke edebiyat, edebîtî, erk, metin, metna edebî, navmetnî, cure, şîrove bi nîqaşên modern re tekamûleke çawa derbas kirine û ev têgeh çawa bûne rîknê teoriya edebiyatê. Gotara duyem a vê beşê jî hewl dide bi perspektîfeke vegêrî (naratolojîk) taybetiyên cureyên edebî (helbest, vegêran û drama) destnîşan bike. Beşa sêyem a ku navê wê "Teorî, Teoriya Edebiyatê û Ekolên Wê" ye jî ji du gotaran pêk tê. Nivîskar bi ya yekem armanc dîke ku bi xwendevan bide fêhmkirin teoriyên edebiyatê û rêbazên rexneyê kategoriyên modern in û ew bi saya feraseta modern û muphemiyên modernîteyê ewqas dînamîk û rengareng in. Di ber van de behsa du pîvanên tesnîfa teoriyên edebiyatê tê kirin û li hember van Alan hem şerha xwe datîne û hem ya xwe pêşkêş dîke. Gotara duyem a vê beşê jî ji bo taybetiyên sereke yê teoriyên edebiyatê (derbirînî, psîkanalîz, formalîstên rûsî, rexneya nû, binyadgerî, postbinyadgerî, hilweşangerî, semiyotîk, teoriya wergirtinê, teoriya marksîst, teoriya femînîst, teoriya postkolonyal, teoriya postmodern) hatiye veqetandin û wekî du warên cotik ên ku hev dermale dikin têkiliya teorî û rexneyên edebî bi zimanekî rihet û rewa hatine ravekirin.

Di encamê de Alan, bi awayekî kurt û sade vedibêje ka bi modernîteyê re çî guherî, çî bi ser ket, van guherîn û serketinan bandoreke çawa li ser çêbûna edebiyata modern çêkiriye. Li gor wî tiştên ku bi rêya modernîteyê li ser rûyê edebiyatê zêde bûne, kategoriyên wek derûnîtî, kesayetî û çêbûna teswîrkirineke



realîst a objeyan e. Modernîte hem bû dîroka reddiyeyan û hem jî bû ya afirandinên curbicur. Sînorên qetî yê cureyan rabûn, muphemî bû taybetiyeke sereke. Her wiha çarçoveya êkolên teoriya edebiyat û rexneyê li ser hişkî dîrokî, şexsî, navdisîplînî, daxwaza bikeriyê, reddiyeya rabirdûyê û dewlemendiya dirûvên dîtinê hatine rûniştandin.

Weke gotineke dawîn em dikarin bibêjin ku *Zanista Edebiyata Modern* xwestiye bi kurdî û bi rêbazeke teswîrker, dîroka modernîte û edebiyata modern pêşkêş bike. Xebatên bi vî rengî di zimanên din de gelek in. Lewma mijarên hevbeş heta astekê "teqlîd"ek derdixin pêşiya xebatên vî rengî. Lê belê ev xebat bi saya mêzekirineke nû, şerhên balkêş, zimanekî carbicar teorîk, carbicar mîzahî, mînakên balkêş ên ji edebiyata cîhanê û xasma ji edebiyata kurdî û referansên dewlemend û pêşeng ên vî warî, ji heqê vê astengiyê hatiye der. Jixwe îdfiya xebatê bi têra xwe balkêş e, agahiyên her sê beşan, di ber vê nezerê de tî destnîşankirin: Tiştê ku em îro li ser navê teoriya edebiyatê minaqeşe dikin, bi wehm û fêhmeke modern tije ne, ew malê tesewireke modern in. Xebat ji vî aliyê ve jî xwediyê îdfiayeke nû ye. Belkî bi tenê ev aliyê giştî sebebekî rexneyê ye: Ji ber qedexeyên salan, xambûna kurmancî ji bo xebatên akademîk û pîrsgirêkên termînolojiyê. Lê belê, ev yek rewşeke giştî ye ji bo hemû xebatên akademîk û teorîk ên îroyîn e. Kar ew e ku ev pîrsgirêk bi avabûna beşên kurdî re hêdî hêdî ji holê rabe. Xwediyê xebatê jî ji vê yekê hayedar tevgeriyaye, di ber agahiyên referansên sereke de dema serê xwe bi mijarên dijwar û çetîn êşandiye, forma derbirînê jî li ber çavan girtiye. Lewma wateya epîgrafa ku nivîskar ji Îbn Mukaffa wergirtiye pêk hatiye: Pirtûkê, "ji bo belaxetê dev ji fesahetê bernedaye".

### Güneş KAN

Lêkolîner, Zanîngeha Mardîn Artukluyê  
Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

## Yayım İlkeleri

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü tarafından çıkarılan JMS (The Journal of Mesopotamian Studies), Kürt, Arap ve Süryani dili kültürü ve edebiyatları alanlarındaki bilimsel nitelikli çalışmalara yer veren hakemli bir dergidir. Bahar ve Yaz sayıları olmak üzere yılda iki defa yayımlanır. Yayımlanacak yazılarda bilimsel araştırma ölçütlerine uygunluk, alana bir yenilik getirme ve başka yerde yayımlanmamış olma şartı aranır. Bilimsel bir toplantıda sunulmuş bildiriler, yayımlanmamış olmak şartıyla kabul edilebilir.

### Yazıların Değerlendirilmesi

- Dergimize gönderilen yazılar, öncelikli olarak yayın kurulunca dergi ilkelerine uygunluk açısından incelenir. İlkeler uygun bulunanlar, iki hakeme gönderilir. Yazarlar, hakemlerin önerilerini dikkate alıp gerekli düzeltmeleri yaparlar; fakat katılmadıkları noktalara itiraz etme hakkına sahiptirler.
- Gönderilen telif makaleler, Editör Kurulu tarafından incelendikten sonra değerlendirilmek üzere “kör hakem” yöntemiyle konunun uzmanı iki hakeme gönderilir. İki hakemin görüşü ayrılığı durumunda, üçüncü bir hakemin görüşüne başvurulur. Makale, en az iki hakemden olumlu rapor gelmesi halinde yayımlanır. Hakem raporları yazara gönderilerek karar bildirilir.
- Hakemlerden biri veya her ikisi, “düzeltmelerden sonra yayımlanabilir” görüşü belirtirse, gerekli düzeltmelerin yapılması için makale yazara gönderilir. Düzeltme yapıldıktan sonra hakemlerin uyarılarının dikkate alınıp alınmadığı hakem veya Editör Kurulu tarafından değerlendirilir. Ayrıca yazarların, hakemler tarafından belirtilen görüşlere itiraz etme hakkı bulunmaktadır. Yapılan itirazlar editör kurulu tarafından görüşülüp uygun bir karar alınır.
- Yayımlanmasına karar verilen yazılar, sayfa düzenlemesi yapıldıktan sonra pdf formatında yazarlara gönderilir. Yazar son okumayı yapar ve gerekli düzeltmeleri metin üzerinde işaretleyerek dergiye geri gönderir.
- Yayımlanmayan yazılar iade edilmez ve yazılardaki görüşlerin yasal sorumluluğu yazarlarına aittir.
- Yayımlanan yazılar için yazardan dergiye veya dergiden yazara herhangi bir ücret ödenmez.
- Yayın aşamasında yazılar üzerinde esasa yönelik olmayan küçük düzeltmeler Editör Kurulu tarafından yapılabilir.
- Yayımlanan yazıların yayım hakları MAÜ Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü’ne devredilmiş sayılır. Bu devir, sanal ortamı da kapsar.

### Yayım Dili

- JMS’nin yayım dili Türkçe, Kürtçe, Arapça, İngilizce ve Süryanicidir. Ancak her sayıda, dergide yer alan çalışmaların en az yarısının Kürtçe ve onun çeşitli lehçelerinde yazılmış olması ilke olarak benimsenmiştir. Dergiye gönderilecek yazıların akademik dil kullanımıyla ilgili her türlü kusurdan arınmış olması gerekir.

### Yazım Kuralları ve Sayfa Düzeni

- Yazılar A4 boyutunda kâğıda, MS Word veya uyumlu

programlarla yazılmalıdır. Yazı karakteri olarak Times New Roman kullanılmalıdır. Yazılar 12 punto ve 1.5 satır aralığıyla yazılmalı, sayfalar numaralandırılmalıdır. Makalelerin uzunluğu 5.0008.000- sözcük arasında olmalıdır. Özel yazı karakterleri kullanılmamalı, transkripsiyon işaretleri varsa bununla ilgili dokümanlar ulaştırılmalıdır.

- Yazarın adı, soyadı, unvanı, görev yaptığı kurum ve e-posta adresi mutlaka belirtilmelidir.
- Makalenin başlığı içerikle uyumlu olup koyu harflerle yazılmalı ve 15 sözcüğü geçmemelidir.
- Makalenin başında, en fazla 200 ila 250 sözcükten oluşan bir özet yer almalıdır. Özet, hem makalenin orijinal dilinde hem de İngilizce olarak yazılmalıdır. İngilizce özet kısmında makalenin ismine de yer verilmelidir. Özetlerin altında genelden özele doğru sıralanmış 5 ila 8 sözcükten oluşan anahtar sözcükler bulunmalıdır.
- Başlıklar koyu harflerle yazılmalıdır. Uzun yazılarda ara başlıkların kullanılması okuyucu açısından yararlıdır. Ana başlıkların, 1., 2., ara başlıklarınsa, 1.1., 1.2., 2.1., 2.2 şeklinde numaralandırılması tavsiye edilir. Ana ve ara başlıkların tümü (ana bölümler, kaynaklar ve ekler) koyu harflerle yazılmalıdır.
- Metin içindeki vurgulanması gereken ifadeler, “tırnak içinde” gösterilir, eğik veya koyu karakter kullanılmaz. Hem “tırnak içinde” hem eğik veya hem koyu hem eğik yazmak gibi çifte vurgulama yapılmaz.
- Bölüm ve paragraf başlarında girinti uygulanmaz.
- Yazılarda kullanılan çizim, grafik, resim ve benzeri malzemeler JPEG ya da GIF formatında olmalıdır. Görsel malzeme ve ekler gerektiğinde e-posta yoluyla ayrıca ulaştırılmalıdır.

### Kaynak Gösterimi

- Dipnot ve kaynakların yazımı konusunda, yöntem bakımından kendi içinde tutarlılık şarttır. Uzun yapıt (kitap, dergi, gazete vb.) adları eğik, kısa yapıt (makale, öykü, şiir vb.) adları ise “tırnak içinde” yazılır. Ayrıca dipnotların yalnızca metne alınamayan ek bilgiler için kullanılması önerilir.
- Bir yapıtın derleyeni, çevireni, yayıma hazırlayanı, editörü varsa künyede mutlaka gösterilmelidir.
- Elektronik ortamdaki metinlerin kaynak olarak gösterilmesinde, yazarı, başlığı ve yayım tarihi belirtilmiş olanlar kullanılır. Ayrıca künye bilgilerinde parantez içinde erişim tarihi belirtilmelidir.
- Ulaşılabilir kaynaklarda ikincil kaynak kullanımından kaçınılmalıdır.
- Atıf yapılmayan çalışmalara Kaynaklar kısmında kesinlikle yer verilmemelidir.
- Kaynaklar metnin sonunda, yazarların soyadına göre alfabetik olarak yazılmalıdır. Eserlerin yayınevleri açık şekilde ve makalelerin bulunduğu sayfa aralıkları belirtilmelidir.
- Alıntı yapma ve kaynak göstermede Apa ve Klasik Dipnot yöntemlerinin ikisi de kabul edilmektedir.

## Publication Principles

The Journal of Mesopotamia Studies (JMS) is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. The JMS is a peer-reviewed journal which gives places to scientific researches on Kurdish, Arabic and Syriac culture, language and literature. It is published semi-annually (Spring and Summer Issues). The articles to be published should bear criteria of scientific researches, be innovative, and also should not be published anywhere else before. If an article has been presented in a scientific meeting, it will be accepted on the condition that it has not been published anywhere before.

### The Evaluation of Articles

- Articles submitted for publication are firstly examined by editorial board in accordance with the publication principles of the journal. The endorsed ones are sent to two reviewers. The authors corrected the article according to the notes by reviewers; however they have right to object to the points where they do not agree with.
- Articles submitted for publication are sent to two experts of the field via method of “blind review” after they examined by Editorial Board. In the case of split in opinion of these two reviewers, the article is sent to another reviewer. The article is published if at least two reviewers express positive opinion. The reports by reviewers are sent to the authors to pronounce the evaluation result.
- If one or both reviewers express “it could be published after certain revisions”, the article is sent to the author for the required revisions. After revisions are done, they are checked by reviewers or the Editorial Board to evaluate whether they are done in accordance with the remarks. Besides, the authors have right to object to the reviewers opinions. The objections are evaluated and resulted by the editorial board.
- The articles that decided to be published are sent to the author in PDF formatted after page adjustment. The author makes the last reading and shows necessary revisions on the text and sent it back.
- The unpublished articles are not return back to the rightful owner, furthermore the authors are responsible for the opinions of the articles.
- The journal does not demand any fees to publish their articles, and likewise does not pay any fees for publishing articles.
- The Editorial Board may make small adjustments those are not on the main stage.
- It is accepted that the copyright of the published articles are transferred to The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. This transfer includes virtual platforms.

### Language(s) of Publication

- The JMS gives places to articles in Turkish, Kurdish, Arabic, English and Syriac. However, it accepted as a principle that at least half of the studies in the journal should be in Kurdish and its various dialects. The articles sent to the journal must be free from all kinds of defects related to the use of academic language.

### Writing Rules and Page Layout

- The articles must be written on MS Word or compatible

programs. Times New Roman should be used as typeface. The articles should be written in 12 font size in 1.5 ink line spacing and the pages should bear numbers. The articles should be as long as 5.000.000-words. The custom typefaces should not be used and if there are transcription signs, their documents should be sent with the article.

- The name, surname, title, place of work and e-mail address must be stated.
- The title of the article must be in accordance with the content and written in bold face, and also must not be longer than 15 words.
- There must be a summary of 200 or 250 word at the start of the article. The summary must be written both in the original language of the article and in English. The title of the article must be stated before the summary as well. There must be key words that ranked from general to specific at the bottom of the summary.
- The title must be written in bold face. There should be intermediate titles in the long articles. It is recommended that the main titles numbered as 1., 2., and intermediate titles as 1.1, 1.2., 2.1., 2.2. All the main and intermediate titles (main sections, sources and appendices) should be written in bold face.
- Expressions that should be highlighted in the text, must be «in quotes», bold or italic faces must not be used. There must not be double highlighting as «in quotes» and bold or italic.
- There must not be intents at the start of section and paragraphs.
- Illustrations, graphics, images and other materials those used in text must be in JPEG or GIF format. Visual material and attachments must be delivered also via e-mail if required.

### References

- Methodically consistency is essential for writing the footnotes and sources. Names of long works (books, magazines, newspapers etc.) should be written in italic face, names of short works (articles, stories, poems and so on) «in quotes». Also, it recommended that to use footnotes only for the additional information that cannot be given in the text.
- The compiler, translator, preparer for publication, editor must be shown in the tag if exist.
- In case of the citation of the text of electronic media, the name of author, title and date of publication which are specified are used. The date of access should also be noted in parentheses in catalog information.
- The secondary sources should be avoided if the primary resources are available.
- The works those have not been cited must not be shown in the sources.
- The sources should be given at the end of the text in alphabetical order. The publishing houses should be given clearly and the pages ranges of the articles should be stated.
- Both APA and Classic Footnote Citation are accepted for citation and referrences.